





# Naverok

Sal 3 • Hejmar 11 • Payiz 1997

---

Dost û xêrxezê cim'eta Kurda yê mezin-II 3  
Wezîrê Eşo

Kurd di kitêba Îbn el-Esîr de 16

Bangê ji M. Emîn Bozarşan 21

Berî ku em hevpeyvînan bixwînin 23  
Laleş Qaso

Li ser hin pirsên gramera kurdî hevpeyvîn bi 27

Kemal Burkay, Reşo Zîlan,  
Mehdi Zana, Malmîsanij,  
Remzî Kerîm, Celadet Çeliker,  
Hesenê Metê, Mûrad Ciwan,  
Lokman Polat, Xelîl Duhokî,  
Zeynelabidîn Zinar, Zinarê Xamo,  
Ahmet Cantekin, Aram Gernas,  
Ibrahim Güçlü, Süleyman Demir,  
Emîn Narozi, Ali Çiftçi

Sal 3  
Hejmar 11  
Payiz 1997

Xwedî	Komeleya Nivîskarên Kurd li Swêdê
Redaksiyon	Osman Aytar Mahmûd Lewendî Laleş Qaso Zinar Soran
Şertên abonetiye	Salek: 200 SEK Nîv sal: 100 SEK Hejmarek: 50 SEK <i>Ji bo welatên din mesrefa posteyê lê zêde dibe.</i>
Îlan	Rûpelek: 1 000 SEK Nîv rûpel: 500 SEK Çarîk rûpel: 200 SEK
Pergala rûpelan	Osman Aytar
Rismê bergê pêşî	Adîle Xanim, 1919 (foto ji: "Susan Meiselas, Kurdistan in the Shadow of History", 1997, r.75)
Postgiro	46 32 31-1
ISSN	1400-528X
Çap	Apec-Tryck

*Berpirsiyariya her nivîsê, ya nivîskarê/nivîskara wê ye.*

Navnîşan • Adres • Adress:  
Box 2015, 176 02 Järfälla/SWEDEN

# Dost û xêrxezê cim'eta kurda yî mezin-II

## Wezîrê Eşo

**T**abya Abovyanê dêmokrat, merivhiz, û ewledê cim'eta ermenîaye zêrîaye bindest tam ji ya wan wekîlê kolonîzatorîê cuda dibe. Me çawa serhatîa 'emirê wî da da kivşê, Abovyan bona hemû cim'etê mîna cim'eta wî bindest ber xwe ketîye, dilê wî eşîaye. Ew tefekûrya binelîê Amêrîkaê cî da jî bûye ê ku heylo nîveka topa dinîaêye Roavaê mane. Abovyan kolonîzatorê Avropaê berk gunekar kirine, ê ku me'na rikinkirina medenyetê, şaristanîê hindê Amêrîkaê xeza kirine. Abovyan lo hela ji rêwîê Ûrisêtê jî cuda bûye, ê ku angor bî xêrxazî nêzîkî cim'eta kurda bûye. Rohilatzanê 'eyan V. Mînorskî, ê ku gele xebat derheqa kurda da nivîsîne hema ji wan xêrxaza bûye. Ew destpêbûna qurna 20-î, çawa wekîlê dewleta Ûrisêtê, çawa dîplomat gele sala li Tûrkîaê û Îranê, li Kurdistana bindest gerrîaye. Ewî kurd rind nas kirine û hal û xwestina wan fe'm kiriye. Ruhê kolonîzatorîê nava xebatê wîda, bawarkî, kivş nave. Ewî qedirê cim'eta kurda girtîye, lê belê, angorî yekî mîna wî jî Abovyan gele bilin de. Mînorskî kitêba xweye "Kurd"-da, ku sala 1915-a li Pêtrogradê çap bûye, kîjanê rohilatzan, kurdzan çawa xebateke ulmîyêye kûr qîmet dikin, nûrdarê ermenîayî mezin, xebatê wîye kurdzanîê bîr tîne. Wexta gilî tê ser wî qîmetê bilind, kîjanî Abovyan dide kurda, çawa cim'eteke mêrxas, azayîhiz, helal, comerd, Mînorskî dide kivşê, wekî qîmetkirina wî teherî ji çapê der ya xêrxazî ye. Ew diha kûr dive û dinivîse: "Hine parê wê xebatê (ya Abovyan-W.E.) gelekî ê pesindarî ne û minê qursax nekira, mesele, bin aminayî û helalya kurdada qolê xwe danya, lê ev hemûşk mexsûs tişteki kivş e, çawa nişana tunebûna dijminayê hindava kurda da ji alîê "Bavê edebyeta ermenîaye nuh da" (rûê 40-î). Belê, yekî mîna Mînorskî jî qîmetê

Abovyanî qenc çawa tişteki ji çapê der hesav dike. Ew xebera "tunebûna dijminayê" dide xebatê. Vira Mînskî dixweze wê yekê bide fe'mkirinê, wekî axa û beg, cerdbaşî û qaçaxê kurdcim'eta ermenya dizêrînin. Lê gelo, Abovyanê mezin derheqa vê yekê da nizanibû? Hilbet baş zanibû. Aha ş'edetya wê yekê. Ew oçêrka xweye "Kurd" da dinivîse: "Xaçparêz, xazma cim'eta ermenîaye bextreş û mexîn, qûlê wan in (Kur dane-W.E.), bi fikira vê xeberê ya tam. Çaxê ewana ji çya û banîê gîhapir dadigerine jêrê, kerî-sûrîê pezê xwe, garranê dewarê xwe ye bêhesav mehê zivistana sar û dirêj bal ermenya sitar dikir, bê hed û hesav... Her berxwedayîneke sivik bi zulmkarîke here beyanî tê cezakirinê" (Abovyan, 'Efrandin, cilda 8-a, rûê 248-a). Belê, Abovyan derheqa wê zulmkarya axa û begê kurdê koçer da hindava cim'eta xwe da zanibû, hndava wê cim'etê da, ji kîjanê ewî ji 'emrê xwe z'eftir hiz dikir. Lê evayeka nikare merivhizê 'eyan, Abovyanê xweyê dilê fire û zanebûnê kûr şaş bike û ew ser hîmê vê yekê fikira neqenc derheqa kurda da 'elam ke. Pêyî vê gotinê ra dîsa ew Abovyan, van kirêd kurda 'afû dike. Ew derheqa cerdetya Celalya da bîr tîne, derheqa wê yekê da, ku bi çi teherî bona birina talan gele tucarê fariz ser rê kuştine û peyî ra dinivîse: "Tenê ew kêmasîa tek-tene ye (cerdbaşîtî - W.E.), ku em dîsa dikarin tenê bal hine qebîla bivînin, ew jî, paê pirê, bal nevsê cuda-cuda, lê ne ku temamyaya cim'etê... Kirinê wane sawkêş hindava cim'etê ermenî û mexîn da gotî hesav bikin ne ku çawa dijminaya ayîna dîn, yanê jî tişteki 'eynatbazarîê, lê gotî hesav bikin, çawa esera hesîna wane azayê, hukumê wan î bê hed û hesav, çawa extîarya kulma sedsalîê navîn, kîjan ewana wexta lazim bûye dane û didine xebatê ne ku tenê hindava tirka, fariza û tatara da, dîne kîjana û wana (kurda) yek e, lê hila hindava kurdê ji milletê wan da jî, bê varveşya dereca meriva û ayîna dîn. Tu cara neqewimîye, wekî kurd xaçparêz mecbûr bike, ku ew terka hebandina xwe bide, yanê jî bona wê hebandinê wî bizêrîne" (Dîsa ew, rûê 249-a). Rast e, vira Abovyan zelal nake û qeyî wê hênê, berî pêşdahatina marksîzm-lenînîzmê nikaribû jî ewyek bikira, wekî halê sosyalîê kurdê kesîv mecbûr kirîye ku ew bibe rêgir, cerdbaşî, rêwya talanke.

Me jorê da kivşê, wekî Abovyan wexta nivîsara oçêrkê xweye kurdzanîê çawa 'eynî ulmdar şuxul kirîye û ce'dandîye, wekî wan da sifate cim'eta kurda rast bê nişandayîne. Çaxê oçêrka wîye derheqa kurda da hezir bûye, ew dîsa diçe cem kurê Silêman Axaê Sîpkî-Îbrahîm û Şemdîn Axa û ew ê nişanî wan bide. "Ez bona wê yekê şêkirdarê wan im-ew dinivîse-çimkî ewana bi zanyarî tiştê nerast, şaş dîtin, bi destê xwe rast kirin" ('Efrandin, rûê 393).

X. Abovyan, me çawa da kivşê, qinyat bona nivîsara oçêrkê xweye kurdzanîê hîmlî wexta gerra xweye nava kurda da, ji zarê wekîlê cim'eta kurda berev kirine. Li vira lazim e bêjin, wekî ew ne ku tenê bi tabya xweye demokratîê-hûmanîstîê, bi hereketê xweyî rast qîmetkirina tarîqa milletê zêrîayî û bindest ji wekîlê Avropaê cuda dibû, talaşa kîjana nîbû ka kur d çî

halî danin, çawa têne zêrandinê, lê usa jî bi esil û ‘esasê xwe va, bi nifûsa xwe va, çawa ewledê cim’eteke usa, bi kîjanê ra dostê bi sedsalya bû cim’eta hizkirî, kal û bavê wî. Abovyan bi helalî, çawa dost û xêrxaz, bi nêta qenc diçû nav kurda û ewana (kurda) nikaribûn eva yeka derc nekirana. Kurda tê derdixist, wekî ew maqûl û qulixçê dewletê ku bi wergirtina Avropaê tê bal wan-ji hemû mêvanê ji welatê derekeye mayîn cuda dîve, û berê ‘ewlin, bi wê yekê, wekî îtbarê bi kurda tîne û pê ra jî wana hiz dike. Abovyan wexta gerra xwe nedîçû dîwanxana û mêvanxana, lê rast dajot ber derê kurda, li mala wan dibû mêvanî, ‘eynî bi ‘edetê rohilatê. Ewî nimûnê zargotinê berev dikirin, guhdarya dengbêjê kurda dikir û bi zargotin, bi stiranê cim’etê heyr û hijmetkar dima. Ewî kurda ra bi zimanê wanî zikmakî xeber dida, bê tercimeçî û evê derecê ew dikir merivekî nêzîk, xûn qinêtî bona kurda. Bi saya xeysetê xweyî merivhizîê, terbe-torê xweyî torinî Abovyan dest xwe da, çawa divên, xwe dikir dilê kurda, ê ku him qedirê wî digirtin û ya sereke him jî jê hiz dikirin. Ş’edetya vêyekê ye geş ewyek hesav dibê ku ewî gele dost û xêrxaz ji nava kurda qazanc kirin û nava wan da kurdê gele kivş, ser ek’êşîr, Axa û beg. Ji wana yek Temir Axaê serek’êşîrê kur dê Ūrisêtêye ezdî bû. ”Min bal wî -Abovyan dinivîse-, qebûl kirina layî qî mîr û hakima dît. Bal wî gele şêx û gele merivê êla wî berev bûbûn, ê ku qeyî hatibûn, wekî hatina wîye ji Tivlîsê pîroz bikin û bona wan xelatê kaw, kîjana mîrê navbilind Voronsov dabûne wî” (Abovyan, Efrandin, c. 8-a, rûê 267-a).

Çawa tê kivşê, Abovyan sala 1846-a li mala Temir Axa qesidîye<sup>(\*)</sup>.

Abovyan oçêrka xweye ”Kurd” da gelekî derheqa mala axê êla Sîpka - Silêman Axa da, dereqa mêrxasî, helalî, comerdîya wî da dinivîse. Nûrdarê mezin li wê malê jî qesidîye û çawa ji nivîsara wî tê kivşê, ew çawa mêvanekî e’zîz qebûl kirine, jê ra ‘ezet-qulixeke pir kirine. Hêna Abovyan da serkarê êla

(\*) Temir Axa kurê Hesên Axa bûye, deheqa kîjanî da A. S. Pûşkîn nivîsîe. Wekilê wê malê ber dîwana padişê Ūrisêtê da bi helalî qulix kirine, timê xwe bi dawleta ūris girtine. Ewana bi syarê xwe va tevî hemû şerê ūris-tirkaêye sedsalya 19-a bûne, bona kîjanê ordên-mêdalê dewletê pêsîra wan xistine, lê usa jî navê sereskerîê dane wan. Ewana kivş kirine çawa serkarê hemû ezdiê Kavkazê û ev qulixa bilind heta kutasîê jî destê vê malê da bûye. Êla Hesên Axa û Temir Axa li çyaê Sînekê bûye, wê ra gotine ela Hesinya. Ew nava goveka qeza Surmeliê da bûye. Pêyî Temir Axa ra serkarî ketiye destê Hesên Axa (navê kalikê lê kirine), kîjan axê êlêyî herî hizkirî bûye bi saya xeyset, terbê xweyî maqûlî, bi saya fikirê xweye progresîv. Ewî gelekî xwestîye, wekî kurdê ezdî hînbîn, kîjan wî zemanî fikrêke bi cul’et bû, miqabilî trêqê ezdya, ê ku xwendin bona ezdîxanê tişteki gune hesav dikirin. Pêyî Hesên Axa ra serkarîya êlê û temamya kurdê Kavkazêye ezdî dikeve destê kurê wî-Ūsiv Begê.

Hesên Axa ewî dide ber xwendinê çamarana (xwendinxana) dêra Ecmîasinê da. Hevûymîşbûneke gele hewaskar: du fikirdarê ermenîaye here mezin - X. Abovyan û Komîtas-hevalî bi ewledê vê malê ra kirine, bûne dost: Abovyan dostê Temir-axa bûye, lê Komîtas-hevalê Ūsiv begê yî çemaranê. Wexta Şerê Hemdîniâê yî Pêşin êla Ūsiv Begê xwe li ermenîê bira girt û welgerya hat deşta Araratê, li kîderê heta roja îroyîn dimîne bi birê xweye kurde mayîn ra bûye xweyê ‘emirê aza û bextewar welatê Sovêtîê da.

Sîpka Îbrahîm Axa bûye. Aha ew çawa dinivîse: "Îdî pêş da zanibûn, wekî ez ê li wana biqesidim. Hema çawa ez ber derê wî kiviş bûm, kurdekî qitîdalin gewet pêşya min da hat, bawer kî ser desta ez ji hespê peya kirim... Min li wira komeke giran dît. Gişk rabûn pya û pêşya min da hatin, bile ew bi xwe-Îbrahîm Axa jî ji wana şûn da nema. Yekî solê min exist, dudu jî ketin bin milê min, min nizanibû çawa bikira. Gişka hal û kêfê min dipirsîn, hatina min ya xêrê hesav dikirin, lê usa bi dil, ku çetin min evyek cîkî mayîn texmîn kiribe" (Dîsa ew, rûê 232-257-a).

Ş'edetya wêyekê, ka Abovyan qedirekî çîqa bilind li wira qazanc kirîye, usa jî ewyek hesav dibe, ku axê kurd hespa xwe ber wî digre. Vî qedirî bilindtir îdî em tu tiştî nikarin bivînin, eger wê yekê hildin ser hesav, ku kurd nava hebûn-dewleta xwe da hespa bin xwe ser hemû tiştî ra digre.

X. Abovyan merivekî gele texmîn bûye û bi saya zên û sirafet, wê texmîna xweye mezin niqoyî nava ruhê kurda bûye, ji kûrya wî ruhî ji bin qatê bengz û bala wîye mirûz û sawkêş hesinê here nazike merivatîê dîhar kirine. Em dikarin bêminet bêjin, wekî tu kesî usa tam, heralî, kûr, gele rast xeyset, ruh, sêwra dilê kurd fe'm nekirîye, çawa Abovyan. Û merivê kurd jî carna ecêvmayê wî û texmîne dimîne, zendegirtîê wê yekê, ku bi çî teherî ewî derecêd rû va nedîhar ji nava ruhê wî 'eyan kirine. Bi vê yekê ew ji gele fikirdarê hêna xwe û ji ê paşwextîê cuda dibe. Îdî kê karibûye usa rast, bi cî û war, bi sifetê wa geş va xeysetê kurdaye merivtaêye bilind banîna ber 'çe'va: "...Cara pêşîn ez ji wana hîn bûm, wekî nava dereca here giran da jî meriv dikare kubar bimîne" (Dîsa ew, rûê 259-a); "Mêvanhizya wê cim'etê (kurda-W.E.) li temamya rohilatê bûye lêgênd" (Dîsa ew, rûê 257-a); "Her kurdek, lo hela her jîneke kurd jî bi ruh-nifûsa xwe va şayîr e" (Dîsa ew, rûê 377-a); "Em karin kurda hesav kin syar, aspête rohilatê bi fikira wê xeberêye tam..." (Dîsa ew, rûê 381-e).

X. Abovyan guhdarî daye ser heleqetîê ermenya û kurda, ê ku hîmlî ê dostîê, xêrxazîê bûne. Derecê mayîn ra girêdayî me tabya wîye hindava heleqetîê wan herdu cim'etê cînarê kal û bava, ê derê wan derê hev da kiviş kirîye. Li vira lazim e mexsûs wêyekê bidin kivişê, wekî ew heleqetîê dostîê bi dilê wî bûne, çawa ê du cim'etê xweyê yazîke tomerî, halê hev da. Rast e, Abovyan bi cûrê belu, gele kiviş vê derecê da nêta xwe 'elam nake, lê çaxê dûr û kûr difikirin, em dikarin bêne ser wê fikirê, wekî ewî ew heleqetî hesav dikirin çawa hîmê qenc bona tifaqdarya herdu cim'etaye sîlihdarîêye paşwextîê miqabilî zordar, zeftçîê dereke, xazma dewleta Osmanîêye zulmkarîê. Badilhewa nîne, wekî ew şerê kurdê ezdî û ermenîaye tevayî bi serkarîa Şêx Mîrzaê û Keşîş Polo bîr tîne miqabilî ordîa sereskerê tirk Reşîd Paşa û ne ku tenê bîr tîne, lê usa jî kilama cim'etêye derheqa wî şerê giran da ji zarê zarbêja dinivîse. Abovyan bi şabûn dide kivişê: "Ji cim'etê cînarê xwe tu kesî ra ewana



haqa kîp nêzîk nînin, usa bi tevayî şuxul nakin, çawa ermenîya ra û wana birê xwe hesav dikin” (Dîsa ew, rûê 260-î). Cîkî din ew dinivîse: ” ...bona wana (kurdê ezdî-W.E.) ew hemû tişt tiberk û zyaratî ne, çî ku hebûna cim’eta ermenîan e. Ewana wê diha zû hebûna xwe bidin ermenya, ne ku wê ji wana tiştêkî bistînin û wê ‘emirê xwe bidin rihîna parastina hebûna wî” (Dîsa ew, rûê 161-î). Aha qîmetkirineke mayîn: ”Kurd tu cara bal teter qulix nake, yanê jî lingê xwe navêje dikana wî. Miletêkî tek-tenê, îtbarê bi kîjanî tîne û jê bawar dike-ew ermenî ye” (Dîsa ew, rûê 386-a).

Hewaskar e oçêrka Abovyanê derheqa kurdê ezdî da, kîjan ewî nav kirîye ”Ezdî”. Vira lazim e bidin kivşê, wekî gele rast ezdy a hesav dike pareke cim’eta kurda, diha rast, cim’eteke usa ku ziman, ‘erf û ‘edet, medenyeta wan û kurda yek e. Lê pirs a xuliqandin, pêşdahatina wan da fikirê usa ‘elam dike, kîjan ê hucetê ne. Mesele, ew kurdê ezdî nav dike cim’et, kîjan ne rast e. Belê, ezdî cim’eteke cuda nînin, ew kurd in, lê rûê cudatya ayna dîn da xwe kurd nav nakin. Ew bûye sevevê wêyekê ku zeftçî tirk cedandine wana li hev bikin dijmin, şerê birakujî orta wan da pêş da bînin. Qulixçî ayna dîn, axa û begê dûrnedîtî vê derecê da destê wan da bûne hacet, lêpok û vêyekê gîhandîye derecêd nelayîq, necayîz. Bêtifaqya orta kurdê mehmedî û kurdê ezdî tenê bona dijminê xûnxor dest daye, çimkî bi wê yekê diha hêsa bûye wana bikin bin qolê xwe. Hatîye îzbatkirinê û tu tiştêkî şikberî nemale, wekî kurd û ezdî, çawa cim’et divêje, gulî darekê ne, ewledê dê û bavekî ne. Lê zeftçî tirk gele cara ce’dandine kurdê ezdî welgerînin, bînin ser ayna dînê surmanîê bi destî axa û begê kurdaye nepak. Hukumeta Tûrkîaê bawar kî salê carekê êrîş teşkîl kirîye miqabilî kurdê ezdî, ew xeza kirine. Boy vêyekê jî ewana mecbûr bûne bere-bere ji ‘erd, miskenê kal û bava - çyaê Şengalê û gelîê Lalişê (şimal-roava Îraqê) dûr kevin, xwe nêzîkî sînore dewleta ûris bigirin. Rûê vê yekê da jî berî Şerê Hemdînîaêyî Pêşin çend êlê kurdê ezdî li çend cîê Ermenistana Roavaê hev girtine: ela zuqurya, kîjanê ra usa jî divêjin ela Cangîr Axa, li alîê gola Wanê, nehya Bêrkirîê, êla Sîpka, alîê Qersê, nehya Dîgorê (hêna Abovyan da ew yalê Elaşgirê bûne, paşê salê sedsalya nonzdaye 80-yî hatine vira), wê ra usa jî gotine êla Elî Axa, êla Hesinya, li çyaê Sînekê, nehya Surmeliê. Wêra digotin ela Ûsiv Begê. Sedsalya 19 da li berpala çyaê Elegezê jî kurdê ezdî hebûn. Êleke biçûk jî li yalê Axbaranê hebûye. Kurdê ezdîye vira destpêbûna sedsalya 19-a ji Tûrkîaê rûê zordarîa dîwana wê da hatine vira. Mala Kok Axa serkarî wan dikir ku li gundê Mîrekê dima. Abovyan dide kivşê, wekî ezdî li nehya Zeytûn-Maraşê gelek bûne. Lê paê wan î hîmlî warê xweyî kal û bava - li çyaê Şengalê, li nehya Mûsilê mane û heta îro jî dimînin. Şerê Hemdînîaêyî Pêşin da hêna dîwana Tirkê Cahil kurdê ezdî jî xeza dikirin, çimkî ewana ji alîê dinya musulmanîê da dihatin zêrandinê û lema jî xwe li ermenya, dewleta ûris digirtin. Kurdê ezdîye alîê Bêrkirîê, Qersê û Sînekê tam hatin topraxa Ermenistana Sovêtîye niha. Li Serderavê û Axbaranê kurdê ezdî bi serkarya

mêrxasê lêgendar Cangîr Axa miqabilî zeftçîê tirk şer kirin, ku dixwestin cim'eta ermenya tam xeza kin. Lazim e em dereceke waye hewaskar bidin kivşê. Oxirmê giran da kurdê ezdî û ermenî timê bi tifaqdarîa sîlihdarîê pêş da hatine.

Vira lazim e em du derecê kêrhatî û ferz bidin kivşê. Ya pêşin ew e, wekî 'edetê sêwirandina kilamê mem ra, ê şer û şerkarîê nava kurda da, çawa hêna Abovyan da hebûye, usa jî pêyî ra. Eva 'edeta bi 'emirjîyîna cim'eta kurda, çawa Abovyan dinivîse, bi ya şerkarî û şerhizya wê va tê makkirnê. Kurd her wa nava şera da bûne, çawa şerê boy xatirê parastina serxwebûn serbestya xwe, usa jî sed heyf, şerê xwexwetîê da, ê axa û begekî kurda miqabilî axa û begekî dinê, kîjan, çawa tarîq şe'detîê dide, paê pirê bi destî dîwana Tûrkîaê hatîye tevrakirinê bi nêta qelskirina hereketê kurda yî berxwedayîne. Û çaxê mîr û hakim, axa û begekî kurd derketîye meydana şer, 'ese dengbêjê wî pê ra bûye, ê ku gotî cî bi cîkilam derheqa mêrxasya wî da bisêwiranda, pesinê mêranya wî bida. Xênji razîkirina hesîna mîr û hakme xwehizkirine, bi kîjanê ew, çawa divên, kubar û firmax dibû, bi wê kilamê dengbêj gotî borcekîdinêyî diha lazim û kêrhatî biqedanda: ewî gotî ew kompêşîya şerê giran ruhdar kira, ya ku mîr û hakim, axa û beg dabû ser xwe. A bi vî teherî, bi deha kilamê mêranîê hatine gihîştine me, heta roja îroyîn jî nava cim'etê da têne stiranê, çawa hizreta hindava rojê buhurîye mêranîê, syarîê, xweykirina nav û namûsê millet bi çek û sîliha. Û bi saya vî 'edetî ye ku tu qewmandinke berbiçe'v nava tarîqa cim'eta me da tune (xazma ya nuh û here nuh), derheqa kîjanê da kilam nehatibe sêwirandinê û ew negihîştibe me. Bi vî teherî, kilam jî bûne çe'vkanîed tarîqa milletê kurd, ji kîjana em gele tişt pê dihesin. Rast e, nava wan da carna derece hatine mezinkirinê û çawa 'efrandinê cim'etê, ê şer û mêrxasîê, elêmêntê lêgêndîê ketine nava wan, lê bi tamamî hîmê wan rast e û ew carna kanya tek-tenê ne, ji kîjana em hine qewmandinê tarîqîeye buhurî dihesin. Û kemala wan bi wêyekê mezin e.

Dereceke dinê, ku dîsa ferz e bi nêta dîharkirin û qîmetkirina heleqetîê cim'etê kurd û ermenî, ew e, çawa lênihêrandinê meye hertimî, zanebûnê meye wan kilama, ku me çûktîê da dest anîne, nîşan didin, nava tu kilameke mêranîê da gilîkî miqabilî cim'eta ermenya navînin, lo hela ser da jî gele kilama da derheqa ermenîa da bi hizkirin tê bîranînê. Hine kilamê usa da jî, ji kîjana yek nûrdarê mezin berev kirîye, pesinê tifaqdarîya kurda û ermenîaye sîlihdarîê tê dayîn miqabilî zordarê dereke, dijminê herdu milletaye tomerî, xenîmê serê wan - dewleta Osmanîê. Me bona îzbatkirina dostî, biratî û tifaqdarya ermenîa û kurda serzêdayê da kilamê derheqa wêyekê da çawa mesele anîne. Kilama derheqa Miçoê Şêx Îsaê da ew derece niha zelal tê kivşê:

"Wezê Delanê dinhêrim kevirê şîn e,

Kesekê xêra xudan tunîne, Cavekê daxe Keşîş Polo ra,

Bê: - Keşîş Polo, malik te xirav be, ocaxî te kor be,  
Îşev sê roj e û sê şev e mawîzera destê Miçongê Şêx' Îsaê da  
Li 'erâfê meydanê 'ingirîye: ne diteqe, ne dike deng e."

Bi vî teherî, bi van xebera û taqlê tenê bira dikare hewara xwe li birê daxê.

Me çawa daye kivşê û ewyek bal Abovyan jî heye, gelek cara rojê oxirmê giran kurd û ermenî çûne hewara hev, pişta hev gir tine. Kilamê Miçoê Şêx 'Îsaê û Şêx Mîrzaê nîveka sedsalya nonzdaye pêşin da hatine sêwrandinê, çaxê Waliê Sêrtê dixweze nîvserbestîya kurdê ezdî û ermenî wira bide hilanînê, ewana me'rûm bike, teslîmî dewletê ke û eger li hev neê, xeza ke. Bona wî meremî ordîke eskerê Tûrkîaêye giran sala 1833-a dikişê ser kurdê ezdî û ermenîya, ê ku wexta şerê Tûrkîaê-Ûrisêtêye salê 1828-1829-a xwe 'eyan kiribûn çawa terefdarê dewleta ûris û Şêx Mîrza tevgirêdan bi Gêneral Paskvîç ra çêkiribû (Binhêr: Djalîlê Djalîl, Kûrdi Osmanskoy Împerîi v pervoy polovînê 19-go vêka, Moskva, "Naûka", 1973, str. 101-103). Bona îzbatkirina wê fikirê, wekî rojê oxirmê giran kurda û ermenya timê xwe dane ser hev, çûne pişta hev, dostya wan werguhêzî biratya sîliha dibe, em himberîhevkirineke tarîqîye waye hewaskar bînin ortê. Pêşî şerê Delanê ra, ê kurd û ermenî Sêrtê miqabilî ordya Reşîd Paşa, devedevî qurnekê şûn da dîsa qezyake mezinbona cim'eta ermenya û pareke cim'eta kurda-ezdya saz dive, qezya xezabûna tam. Ew bihara sala 1918-a bû, çaxê eskerê Tûrkîaê alîkî da hat derkete deşta Araratê, nêzikî Êrêvanê, alîê din da Axbaranê. Û li herdu cya jî kurda careke dinê jî îzbat kir, wekî dost û birê ermenîaye amin in. Vê carê serkarê kurdê ezdî Cangîr Axaê mêrxasê cim'etê yî lêgêndar şerê Serderavê (Sardarapatê) û Axbaranê da bi syarê xwe va derba giran gîhand dijminê tomarî - ordîya tirka. Û li vira jî kilam hate sêwirandinê û ew kilam jî bi ya Şêx Mîrzaê û Keşîş Polo ra tevayî îro tê stiranê. Vê kilamê da cim'et pesnê mêrxasî û tifaqdarîa Cangîr Axa, Andranîk Paşa, Sêrob Paşa û êd mayîn dide.

Dereceke dinê jî, ku gotina Abovyan heq derdixê derheqa wê yekê da ku kurda îtbara xwe bi tirka nanîne, tenê ermenîya anîne, dîsa bi kilamê cim'eta kurdaye mêranîê-tarîqîê tê îzbatkirinê. Paê kilamê wî teherîye pirê da zordarîya dewleta Osmanîê hindava kurda da hatîye kivşkirinê. Eger wan kilama da, me çawa got, tu gilîkî miqabilî ermenya tune, lê miqabilî Tûrkîaê çîqa bêjî heye. Wan da cim'eta kurda Tûrkîaê, dewleta wê wa nav dike: "Roma Reş", "Roma xayîn", "Roma rûtik". Bi vî teherî, kilamê mêranîê ew neynik in, nava kîjana da 'emirê rastî, fikir û mitalê cim'etê ye 'esilî hatine dîherkirinê. Niha kurdê ezdî hîmlî li du welatan e: li Tifaqa Sovêtiê; rêspûblikaê Pişkavkazêye - Ermenîstanê, Gurcistanê, Adirbêcanê û Asya Orte, û li şimala Îraqê, hîmlî li çyaê Şengalê. Rohilatzanê sovetîê O. G. Gêrasîmov dide kivşê, wakî li wira reqema kurdê ezdî 150 hezar e (O. G. Gêrasîmov, Na Blîjnêvostoçnix pêrêkrêstkax, M., 1983, str. 236).

Hilbet, berê, em bêjin, destpêbûna sedsalya 19-a, kurdê ezdî diha z'ef bûne. Lê ew bere-bere du alya da kê m bûne: alîkî da hatine qirkirinê, alîê mayîn da welgeryane, çûne ser ayna dînê surmanîê.

X. Abovyan îzbatîê hevaskar 'elam dike derheqa 'emrîjîyîna kurdê ezdî, rizma wan, ayna dînê wan da. Vîra lazim e em derecekê bidin kivşê. Oçêrka Abovyan da derheqa 'erf û 'edet, ayna dînê kurdê ezdî da tiştê usa hene ku ne rast in. Vê derecê da nûrdarê mezin ne gunekar e, lê sevevê vê yekê înfîmatorê wî ne, ew meriv in, ji kîjana ewî pîrs û pîrsyar kirine. Kurdê ezdî divêjin, wekî dînê wan dînekî xef e, yanê perdekirî ye. Rastîê jî, tirêqê kurdê ezdî (şêx û pîr) surra dîn merivê mîletê mayîn ra 'eyan nakin.

Dereceke mayîn jî: ew, çî ku Abovyan ber çe'vê xwe dîtîye, gele rast, bê şaşî oçêrkê xwe da kivş kirîye û jî tabya rast jî şîrove kirîye. Lê çaxê ew gumanê datîne ser înfîmatora, gotina merivê mayîn, kê masya berdide. Dîsa diwekilînim, ev kê masî ne ê Abovyan in. Em gotî we yekê jî hildin ser hesav, wekî hêna wî da ulmê kurdzanîê kê m bû. Gotin, şîrovekirinê Abovyan derheqa kurdê ezdî da, xazma deba wan, rabûn-rûniştin û xeysetê wan da qîmetlî ne û heta roja îroyîn jî kemala xwe unda nekirine.

Oçêrkê X. Abovyan da zargotina cim'eta kurda ye dewlemend gele rast hatîye qîmetkirinê. Bi temamî nûrdarê mezin kemala zargotinê nav 'emîrê cim'etê da û xazma bona ulm, seba lê nihêrandina pîrsê tarîqa medenyeta cim'etêye cuda-cuda jî tabîê ulmîye usa şîrove kirine, wekî tê qey bêjî ewî dewra me da 'efîrandîye. Ew heyfa xwe tîne, wekî zargotin bere-bere unda dibe û xwezila xwe bi wêyekê tîne, ku wê çîqa baş bûya, ew gişk berevkirana, lê bona wêyekê cêva tije û we'dê aza lazim e, bona gund bi gund bigerî. (Dîsa ew, rûê 247-a).

Abovyan bona dinya ulmîê zargotina kurda ye dewlemend dîhar kir. Heyf, ew haj edebyeta kurda ye sadsalîê navîne dewlemend tunebû. Qinyatê, ku konsûlê ûrisa Aleksandir Jaba berev kirin û anîn Ûrisêtê, hela hê tu kesî ra û pê ra jî Abovyan ra ne 'eyan bûn.

Abovyan heyr hijmekarê kurda dimîne, çaxê xerckirina hereketê wan î xweykirina xwexwetya mîletîê divîne. Ew wê derecê bilind qîmet dike, ku kurd tenê kilamê xweye mîletîê distirên û bi temamî dewlemendîê medenyeta xweye mîlîetîê ruhanîê ser ya mîletê here pêşketî ra digrin. Û mîlethîzê mezin heyfa xwe tîne, ber xwe dikeve, wekî paê aşîqê Ermenîstanê ye pîrê tenê bi zîmanê tirkî di'efrînin.

Abovyan mîrxasya kurda bilind qîmet dike. Ew biheyr û hijmekarî dide kivşê: "Kurda carna padişa û xanê zor mecbûr kirine, wekî ber wana bilerizin". Ew mîrxasî tiştêkî bi dilê wî ye, çîmkî ew hereketekî xweykirina serbestî û xwexwetîa her cim'etekêyê zor e.

Abovyan qîmetekî bilind dide xeysetê kurda, ku ewana bêbext nînin. Eger dijminê qanî-qan jî xwe davê ber bextê kurd, -Abovyan dide kivşê- ew xiravya wî nake. "Hela hê neqewimîye, wekî kurd borcê malxwêtî biterbîne û dijminê xûnê bikuje, çaxê ewî bêçare... Eger kurd sozê tam dide û hebûna xelqê çawa amenet hildide, yanê jî soz dide surra himberê xwe 'eyan neke, ewê diha zû ji serê xwe derbaz be, ne ku navê bêbextî bîne ser xwe. Qedirgirtina wan hindava jina da, bile jina xaçparêz da, layîqî 'ecêvmayîne û jêhînbûnê ye" (Dîsa ew, rûê 388-a).

Û rast e, bi çapa xwe ve oçêrkê nûrdar derheqa kurda da ne haqa mezin in, lê wan da gele pirs hatine lênihêrandin û azurukirinê. Wan da qinyatê kêrhatî dikarin bivînin tarîqzan, miletzan, zimanzan, folklorzan. Goveka lênihêrandinê Abovyan gele fire ye. Aha hîmlî ew pirs, kîjan kêman yanê zêde xebatê Abovyane kurdzanî da hatine pêşdaxandin û safîkirinê: xulqandina cim'eta kurda, zimanê kurdî, 'emrê kurda yî sosîal-seyasetî, derecê 'emirjîyîna kurdaye mexlûqetî, ayîna dîne kurda, xazma dîne ezdya, deb, rizma kurda ye miletî, zargotina kurda, xeysetê kurda yî miletî û ê mayîn.

\* \* \*

X. Abovyan mîrateke zanîarîye dewlemend peyî xwe hiştîye. Çawa îdî hatîye gotinê, saxîe da, xênji kitêbeke dersa, ewî xebatê xweye çapbûyî nedîtîn. Ermenîstana Sovêtî da pêşî dest bi çapkirina 'efrandinê Abovyane bedewetî û ulmîye cuda-cuda kirin. Paşê ewana anor diha tam "Dîwan"ê nûrdar da hatin neşîrkirinê.

Sala 1941 oçêrka Abovyane "Kurd" rûperrê kovara "Sovetakan girakanûtyûn" da ("Edebyeta sovêtî") hate çapkirinê. Kutasya salê 40-î û 50-î li Ermenîstana Sovêtî hate mîserkirinê çapkirina berevokê 'efrandinê nûrdare akadêmîkîye tam bi heyst cilda. Eva qewimandineke ulmî-medenyetîye mezin bû nava 'emrê cim'eta ermenya da. Cilda heysta da ronayî dîtîn oçêrkê nûrdare tarîqî-miletzanî dereqa kurda da, lê usa jî ew nimûnê zargotina cim'eta kurda, ê ku Abovyan berevkirine. Em bîr nekin bêjin, wekî hine nimûnê zargotina kurda cilda hevta da hatine çapkirinê. Tîştêkî şabûnê ye, wekî pê destnivîsara Abovyan gihîştine me nimûne kilamê kurdaye lîrikê: bi zimanê kurdî û bi herfê ermenî. Cilda heysta da ne ku tenê ew oçêrkê "Kurd" û "Ezdî" hatine cîwarkirinê, lê usa jî qinyatê mayîn, çawa, mesele, miqalê "Kurd" û "Ezdî" ku bi çapa xwe, hinekî jî bi serecema xwe ji ê "Kavkazê" da çapbûyî cuda dibin. Vê cildê da usa jî serecema van herdu miqalaye tevayî, kurt hatîye çapkirinê, bi sernivîsara "Oçêrk derheqa xuliqandina kurda, nav û nîşanê miletî, ziman, deb, 'erf û 'edetê wan da". Eva miqala bi cûrê kurt Abovyan hazir kirîye, kes nizane bona çi meremî. Xênji wana, cilda heysta da nimûnê zargotina kurda bi tercima zimanê ermenî

hatine cîwarkirinê, kîjana em bi tercima kurdî vê kitêbê da didin.

Qîmetlî ne nivîsarnasîê xebatê Abovyane kurdzanîê, kîjan ê abovyanzanê ‘eyan Pîon Hakobyan in. Wan da gele gilî-îzbatîê hewaskar hene derheqa tarîqa nivîsara oçêrkê kurdzanîê, çapbûna wan da.

Derheqa ‘emir û şuxulkirina Abovyan, ‘efrandinê wî ye bedewetîê û ulmîê da lîtêratûrake dewlemend çê bûye. Tarîqzan û ‘edebyetzanê ermenî gele monografîa û miqalê ulmî pêşkêşî nûrdarê mezin û ‘efrandinê wî kirine. A wana guhdarî usa jî dane ser xebatê nûrdare kurdzanîê.

Kurdzanê kurd miqalê ulmîyê qîmatlî pêşkeşî Abovyanê nemirî, karkirina wîye kurdzanîê kirine, kîjana da bi heralî e’nene û qîmet dikin oçêrkê wîye ”Kurd” û ”Ezdî” - her yekî angorî wî çiqilê zanîarîê, bi kîjanî va ew mijûl dibe. Aha ew miqale:

Hecîê Cindî, ”Xaçatûr Abovyan û Cim’eta Kurda” (Sovêtakan grakanûtyûn û arvêst”, hej. 9-a, sala 1948-a), K. K. Kûrdoêv (Qanatê Kurdo), ”Xaçatûr Abovyan Çawa Kurdzan”, ”Oçêrkî po îstorîi rûsskogo vostokovêdênîi, sbornîk 2”, Moskva, 1956, str. 360-380; K. K. Kûrdoêv: ”X. Abovyan çawa Kurdzan-etnograf” (Îzvêstîi AN Arminskoy SSR, hej. 10-a, Êrêvan, 1955, str. 89-98);

*Ordîxanê Celîl: ”Xaçatûr Abovyan Derheqa Kurda da”, (Sovêtakan grakanûtyûn”, hej. 1-ê, sala 1960-a).*

Emînê ‘Evdalî remetî xebatê xwe ye cuda-cuda da, xazma ya ”Deba Kurdê Pişkavkazê” da oçêrkê Abovyane kurdzanîê bîr tîne û qîmet dike.

Tarîqzanê kurd Karlênê Çaçanî xebatêd xweye cuda-cuda da guhdarî daye ser karkirina Abovyan e kurdzanîê. Ewî miqaleke ulmîye cuda jî pêşkêşî Abovyanê kurdzan kirîye.

‘Edebîyetzanê kurd Knyazê Îbrahîm Mîrzoêv miqaleke ulmî bi sernivîsara ”Xaçatûr Abovyan û Pirsêd Pêşdaçûyîna Kurdzanîêye Niha” daye çapkirinê. (”Têzîsê dakladê konfêransê teşkîla pr ofêsor-dersbêja û ulmdar û pêşekzanêd cahile ulmîê, ê pêşkêşî 175-salîya Xaçatûr Abovyan”, Êrêvan, sala 1984-a). Eva berevoka ji alîê înstîtûta Êrêvanêye pêdagogîê da hatîye çapkirinê.

Miqaleke ‘edebyetzanê kurd Çerkezê Reş (Ç. D. Mistoyan) jî vê berevokê da hatîye çapkirinê, bi sernivîsara ”Poetîka Çarîna Abovyan”.

Çerkezê Reş usa jî nava xebata xwe ya dîsêrtasîaê da ( Dîharbûna ‘Emrê Cim’eta Kurda Nava ‘Edebyata Ermenîye Sovêtîê da”) derheqa oçêrkê nûrdar da dinivîse û wana qîmet dike.

Şayîrê kurdaye sovêtîê şîer avîtine ser Abovyan, ‘efrandinê xwe pêşkêşî wî

kirine, kîjana da pesinê wî merivê mezin, karkirina wî kurdzanîê didin. ‘Efrandinê Abovyan kitêbê kurdîye dersa da hertim têne çapkirinê. Fikirdarê ermenîaye ku peyî rêça Abovyanê mezin çûne, bi layîqî tradîsîaê wîye qenc pêş da birine. Ji wana geleka xebatêd berbiçe’ve qîmetlî kirine dereca kurdzanîê da: ji profesor Î. Êxîazarov girtî hetanî akadêmîkos H. Orbêlî. Û tiştêkî hewaskar: Orbêlî jî, wî peyîhatîê Abovyanê mezinî layîq, dost û xêrxazê cim’eta me yî helal, rikinê kurdzanya sovêtîê danî.

Ermenîstana Sovêtîeye îroyîn, paytextê wê bûne merkeza kurdzanîeye mezin û naskirî. Bi saya seyasetîa Partîa Komûnîstaye lînînîeye miletîê nevî-nevîçirkê kurdê hêna Abovyan îro welatê sovêtîeyî mezin da, kîjanî, çawa Yûrî Andropovê remetî da kivşê, hesav dikin wetenê xwe, bûne şayîr û nivîskarê bi nav, akadêmîkos, doktorê ulma, profesor, serwerê kafêdra û parêd îdarê ulmî, xîrûrgê ‘eyan, xebatçîê partîaê û dewletîeye cabdar, endemê parlamêntê. Zarê kurda gişk, lê ne ku mîna hêna Abovyan ewledek-dude dewletya, ê mîr û hakîma, diçin mektebê, zimanê zikmakî, ‘edebyeta kurdî hîn dibin. Li paytextê wetenê Abovyan kitêbê şayîr, nivîskar û ulmdarê kurd bi zimanê kurdî çap dibin, rojnema kurdî ronayî divîne, pê radîoa Ermenîstanê dengê dîktorê kurd, kilam û miqamê kurdîyê xweş têne bihîstinê. Li înstîtûta Akadêmîya Ermenîstanêye ulmaye rohilatzanîê para kurdzanîê vebûye, kîderê hemû derecêd kurdzanîê va mijûl dibin: tarîq, ‘edebyet, miletzanî û zargotina cim’eta kurda, pirsê zimanê kurdî. Ermenîstana wetenê Abovyan da ordîke fikirdarê kurdaye tam pêş da hatîye û ew ordî bi dereceke kivş va cuda dibe. Ew ordya fikirdarê ‘eynî miletîê ye, ya ku bi saya qewlê sazûyê qenc xût bi pirsê tarîqa medenyeta cim’eta xwe va mijûl dibe, qulixî pêşketin û gulvedana ‘edebyet û medenyeta xweye miletîê dike.

Eger Abovyanê mezin nişkê va serê xwe ji ax û berê sar hilda û evyek wetenê xwe da bidîta, wê çi bigota? Bêfitya, wê şaş û metel bîma û pê ra jî bi pêşketina dostê xweye hiskirîva şa bûya. Dikarin bêjin, wekî ji hêna Abovyan sedsalî nîvekê zêdetir buhurîye, bawar kî dinya û cim’et gişk bi tomerî pêş da çûne, rêvolûysîa ulm-têxnîkê mîaser dibe, meriv diçin ‘erşê ‘ezmîn. Ev gişk rast e, pêşdaçûyîna merivaêye tomerî tiştêkî îzbatî ye. Lê eger usan e, çima 20 mîlyon kurdê welatê Rohilata Nêzîk û Orte bin nîrê zulmê da nin û nava paşdamayîne da nin. Û ne ku tenê wî halî da. Eger hêna nûrdarê mezin da li wan welata hêla hê kurd hesav dikirin miletekî cuda, niha ne ku tenê extîarîê cim’eta kurdaye here sade pêpes dikin, lê pê ra jî heyîna wê cim’eta pîrmîlîon înkâr dikin. Lê Tûrkya îroyîn kurda dihesavînin ”tirkêd çya”, kîjana gi va zimanê zikmakî bîr kirine. Çi dikarî bêjî, çaxê ew hîn bûne wan hemû tiştîa înkâr kin, çi ku ne bi dilî wan e, wan ra dest nade, çi ku dikare wan ber dinê-’alemê bike robet. Ne axir ewana usa bi bêşermî û tisqîtî qirra mîlîon nîv ermenîaye hêna Şerê Hemdînîaêyî Pêşîn jî înkâr dikin, kîjan tiştêkî, çawa divên, bi şe’de-îzbatî ye. Tûrkîa îroyîn da salê carekê kurda bê serî dikin, ewledê wêye pêş û fikirdar

ber datestana didin sekinandinê, bi cûrê sedsalîê navîn ceza dikin. Lê li Îranê, kîderê haqa derheqa parastina qanûnê dînê îslamîê da dikin qare-qar, wan qanûna da, ê ku kuştina surman ji alîê surman da gune hesav dikin, bi tanka dadikutin gund û bajarê kurda, bomba ji firoka û tîkfira ser şênlikê wan da dibarînin.

Belê, nûrdarê mezin hêna xwe da bi dilêşî dida kîvşê, wekî dewletê Tûrkîaê û Îranêye zordar azayî û serbestîa kurda jê stendine, dixwezî wana lap me'rûm bikin, ruhê wanî mîletîê bitemirînin. Îro aw zordarî û zulmkarî hindava cim'eta kurda da diha giran bûye. Û xebatê nûrdarê mezîne kurdzanîê gelekî nêzîkî ruh û sewdê wan ewledê cim'eta kurdan e, ê ku qeleça xweykirîna nav û namûsa mîletîê, destanîna extîarîê mîletîê da xûna gevez dirêjin.

Navê X. Abovyan nemirîye. Wî navî berê pêşî cim'eta wî zêndî diparêze, ya ku bi saya qeydê sovêtîê mecala daxulqandîna mîletîê stendîye, usan e, pê ra jî ya qedîrgirtîna qîmetîê xweye medenyeta mîletîê, fikirdarê xweye mîletîê.

Navê nûrdarê mezin wetenê wî da danîne ser bajarekî nuh î bedew li serfêza Êrêvanê. Ew nav înstîtûteke Êrêvanêye here kîvş, ya pêdagogîê kirîne. Kûçeke Êrêvanê ye merkezî ye here kaw bi navê wî tê naskirîne, serfêza kîjanê da heykelê wî î mezin danîne. Navê Abovyan li mektebêd rêspûblîkaêye here 'eyan kirîne. Li mehela Êrêvanê ye Kanakêrê, mala kal û bavê Abovyan da, li kîderê nûrdar zarotya xwe derbaz kirîye, mûzê vekirîne. Pêşberî mal-mûzêê heykelekî wî î herî kaw danîne. Li mûzêa 'edebyetê û îskûstvaêye ser navê Ê. Çarêns arxîva Abovyan heye. Hukumata Ermenîstanê prêmîya û mêdala ser navê Abovyan kîvş kirîne, kîjana didin wan kesa, ê ku nava dereca ronkayê, xwendîna cim'etîê da emekê layîq dirêjin. Û kutasî, navê nûrdarê mezin, emekê wî her wa bi hemcim'etî tê hildanê û şêkirandinê, çaxê sersalî, rojê hobêlyanîêye kîvş 'emîrê wî ra girêdayî tene ortê. Şe'detîke qedîrgirtîna navê wîyê here nuh ewyek hesab dibe, ku 175-salya roja bûyîna wî hate kîvşê û bi goveka hemtifaqîê.

Bîranîna ewledê cim'eta ermenîayî mezin tiştêkî 'ezîz û ziyaretî ye bona cim'eta kurda, hindava medenyeta kîjanê da ewî bi helalî qulix kirîye. Û bîranîna wî ra 'emîrê cim'eta kurda ye medenyetê kese girê daye: înstîtûta ser navê wî gele ewledê cim'eta kurda xilaz kirîne û gelek jî îro tê da dixûnin. Mûzêa 'edebyetê û îskûstvaê da çawa tîberk xebatê Abovyan e kurdzanîê tene xweykirîne.

Mal-mûzêa Abovyan da jî derecê tevgîrêdana wî û cim'eta kurdaye dostîê tene ber çe'va. Li vîra şîkilê şîkilkêş L yûdvîg Fon Maydêle "Abovyan nava kurda da" dîwêr da darda kirîne, ê ku hesav dive usa jî xudanê şîkilê "Xaçatûr Abovyan" e 'eyan ê 'eynî î tek tenê. Abovyan, kitêb dest da, orta xortê kurd, mêrê kurdaye navsere da seknîye û wan ra qise dîke. Ew bi heyr û hijmetkarî,



bi hizkirin û hewaskarîke mezin li dost û mêvanê xwe yî ‘ezîz dinhêrin. Ser dîwarê mal-mûzêê ev xeberê nûrdar bi herfê mezin kaw nivîsîne: ”Cara pêşin ez ji kurda hîn bûm, wekî dereca here giran da jî meriv dikare serbilind be”, ”Em kurda dikarin hesav kin syar, aspêê rohilatê bi fikira wê xeberê ye tam”. Meli vira kitêba miletzanê kurdî ‘eyan Emînê ‘Evdale ”Deba Kurdê Pişkavkazê” dît, kîjanê da ewledê cim’eta kurda bi hizkirin xebatê wîye kurdzanîê qîmet dike.

\* \* \*

Oçêrkê X. Abovyane tarîqê-miletzanîêye ”Kurd” û ”Ezdî” cara pêşin tercimeyî kurdî dibin. Bi hesabhildana kemala wan xebataye ulmîê tercmekirina vãn oçêrkê nûrdarê mezin tiştekî lazim û ferz e. Û ez, çawa ewledê cim’eta kurda, xwe bextewar hesab dikim, wekî ev şuxulê kêrhatî para min ket. Min bi hesîneke bextewarîê, bi xofkêşîke zyaratî ev şuxul kir, çawa qedandina borcê merivayê hindava nûrdarê mezin da. Hesîneke mayîne xweş jî bi wê texmînkirinê bedena min hildgere, wekî xwendevanê kurda bi goveka diha fire wê vir ha da xebatê Abovyan bixûnin, ew jî bi zimanê zikmakî.

Transkrîpsiyona ji tîpên krîlî:

**Ahmet Cantekin**

# Kurd di kitêba Îbn El-Esîr de-II

(JÎ "EL-KAMÎL FÎ ET-TARÎX" A ÎBN EL-ESÎR)

## Şerê Navbera 'Ebdullah Îbn 'Hemdan û Kurdan û Ereban

Di vê [sala 314/926'an] de li ser riya Xorasanê û di erdê Mûsilê de nava Kurd û Ereban xira bû. Hingê 'Ebdullah îbn 'Hemdan ku li Bexdayê dima serweriya hemûyan dikir lê kurrê wî, Nasir ed-Dewle, li Mûsilê bû. Bavê wî jê re nameyek nivîsand û tê de ferman kir ku merivan bide hev û xwe berde Tikrîtê.

Ew rabû gotina bavê xwe bi cih anî û berê xwe da wê derê, ew di meha remezanê de giha cem bavê xwe. 'Ebdullah, piştî kuştin û çavtirsandina hinek Ereban rabû ew anîn û ji wan daxwaz kir ku derheq kirinên wî de çi gotine, bibêjin. Wan bersîva gelek tiştan ji xelkê re da, wî jî rabû ew bi xwe re hilanîn û birin li Şehrezorê avêtin ser **Kurdên Celalî** da ku bi wan re şer bikin. Xeyn ji merivên wî hinekî din jî gihîştin wan, bi vê yekê ew şidiyan û hêza wan xurt bû. Piştî dema ku Kurdan hêz û qeweta wî dît serî jê re danîn û dev ji şer û xirabiyê berdan.<sup>12</sup>

(. . . . .)

## Mirina 'Hesenweyhê Kurdî

Di vê [sala 369/979'an] de 'Hesenweyhê kurrê 'Huseynê Kurdî yê Berzîkanî, ('Hesen-weyh îbn el-'Huseyn el-Kurdî el-Berzîkanî) li Sermacê mir. Ew serokê leşkerê Berzîkaniyan bû ku bi navê "el-Berzîniyye" hatibû bi nav kirin. Herdu xalên wî **Wendad** û **Xanemê** kurrên Ehmed jî, serdarên hin leşkerên din bûn ku bi navê el-'Eyşaniyye hatibûn bi nav kirin. Wan nêzî pêncî salî li ser hêla ed-Dînewer (Dînewerê), Hemezaniyan [Hemedanê], Nehawendê, Es-Samîxan (Samîxanê) û hin hêlên Azerbaycanê heyanî tixûbê Şehrezorê mezinatî kir.

Her yek ji wan serleşkeriya çend hezaran dikir, Xanem di sala 350/961'ê de çû ser dilovaniya xwe û kurê wî **Ebû Salim Deysem îbn Xanem**, li Keleya Qessanê<sup>13</sup> li cihê bavê xwe rûnişt, heyanî ku Ebû el-Fet'h îbn el-'Emîd wî ji ser

hukm avêt û keleyên wî yên Qesnan, Xanemabaz û yên din ji holê rakir. Di sala 349/960'î de Wendadê kurrê Ehmed (Wendad îbn Ehmed) mir û kurrê wî Ebû el-Xenaîm Ebd el-Wehhab kete cihê wî, ew li cihê wî ma hayanî ku eş-Şazinxan<sup>14</sup> wî dîl girt û teslîmî 'Hesenweyh kir ku wî jî kele û milkê wî tev jê sitand.

Hesenweyh merivekî bextspî, siyasetzan û xuyxweş bû, ew serdestê kar û barê xwe bû û nedihîşt ku merivên wî diziyê bikin. Wî keleya Sermacê bi kevirên sîmetrîk avakiribû û li ser vê avahiyê li Dînewrê camiyek jî çêkiribû. Hesenweyh heyanî sala mirina xwe ku me li jor got, gelek xêr û xêrat li Mekke û Medîneyê didan.

Piştî mirina wî zarûyên wî ji hev qetiyar, hinek ji wan bi aliyê Fexr ed-Dewle ve û hinek jî bi ser 'Edud ed-Dewle ve çûn<sup>15</sup> Zarûyên wî ev bûn: Ebû el-'Ula, 'Ebdurrezaq Ebû en-Necm Bedr, 'Asim, Ebû 'Ednan, Bextiyar û 'Ebdulmelîk.

Bextiyar tevî mal û zexîreyê ve li keleya Sermacê dima. Wî pêşî ji 'Edud ed-Dewle re name rêkir û diyar kir ku ew dixwaze têkeve bin emrê wî, lê piştî fikrê xwe guhart û berê xwe jê dagerand. Hingê 'Edud ed-Dewle leşkerekî giran rakir û berê xwe da ser wî û birayên wî, dora wan girt û keleyên wan tev ji wan sitandin. 'Edud ed-Dewle ji nav hemiyar birayê wan Ebû en-Necm Bedr îbn 'Hesenweyh hilanî, zîlam danê û ew bi hêz kir. Ebû en-Nec Bedr jî wê herêmê tev zeft kir Kurdên din ê navçeyê jî xistin destê xwe û rewşa xwe baş li hev anî. Ew merivekî aqilmend, jîr û zana bû.<sup>16</sup>

(. . . . .)

### **Vegirtina Bajarê Hekariya û Der û Dorên Wê Ji Aliyê 'Edud ed-Dewle Ve**

Di vê [sala 369/979'an] de 'Edud ed-Dewle leşkerekî pirrr rakir û bire ser Kurdên Hekariya ku hingê bi Mûsilê ve girêdayî bû. Wî avête ser keleya wan û dora wê girt, leşkerê wî demeke dirêj li ser keleyê rawestiya. Ew Kurdên di keleyê de çendeyekî li benda hatina berfê û rabûna leşker bûn, lê Xwedê wer kir ku wê salê hatina berfê bi paş ket. Bi vê yekê re ew rabûn peyam şandin cem 'Edud ed-Dewle û daxwaza ewlehiyê jê kirin; wî hêviya wan pejirand, wan jî keleya xwe teslîmî wî kir û tevî leşker xwe berdane bajarê Mûsilê. Piştî derbasbûna rojekê di ser çûna wan re berfê hê nû dest pê kir.

Piştî e serdarê leşker sozê xwe xwar, ew zeft kirin û li kêleka rê ji Me'lesaya ber bi Mûsilê ve bi qasî pênc qonaxan seranserê rê, ew daleqandin û Xwedê jî xelkê ji şerê wan xilas kir.<sup>17</sup>

(. . . . .)

## **Kuştina Zaruyên 'Hesenweyh Ji Bilî Bedr**

Dema 'Edud ed-Dewle qencî bi Bedir û herdu birayên wî 'Asim û 'Ebd ul-Melîk re kir qedrê Bedr di ser ê wan re girt û ew kir mezinê **Kurdan**. Hingê ew herdu bira jê hesidîn, wan serî li ber hilda û ji ber emrê wî derketin. 'Asim hinek **Kurdên** dijî wî jî li hev civandin û ew anîn cem xwe. 'Edud ed-Dewle rabû leşker şand ser wî [Asim], wan êrîşî 'Asim û hevalbendê wî kir. Ew şikestin, 'Asim hêsîr bû û ew li ser piştê deveyan ketin Hemedanê, piştî wê rojê êdî pêjna wî nema hat. Ji bilî Bedr zarûyên 'Hesenweyh giş hatin kuştin, lê [Bedr] ew di wê rewşa xwe de li ser kar û xebata xwe ma. Ew merivikî zana, jîr, gelekî bi tevdir, qenc û milahîm bû. Di pêş de dîsa, bi destûra xwedê, dê agahdarî bê dayîn.<sup>18</sup>

(. . . .)

## **Rewşa Bazê Kurd ê Xalê Benî Merwan**

### **[Merwaniyan]û Girtina Mûsilê**

Di vê [sala 373/983'yan] de rewşa **Bazê Kurdî** baş û hêza wî qenc xurt bûbû; navê wî **Ebû Ebdullah el-'Huseyn ibn Dostik**<sup>19</sup> bû. Ew ji **Kurdê 'Humeydiyan** bû û di destpêkê de li wan gelî û birekên hêla **Diyarê Bekir [Diyarbekirê]** gelekî şer dikir; ew xwdî qilafetekî mezin î bi saw û bi heybet bû. Dema ku 'Edud ed-Dewle Mûsilê zeft kir **Baz** rabû çu cem wî, lê çawa çavên 'Edud ed-Dewle pê ket jê fikaran kir lê **Baz** jî vê yekê hîs kir, di dilê xwe de got: "Ez ne bawer im ku tu carî ev mirov dev ji min berde" û hahakê ji cem wî derket, xwe ji wir da alî. Piştî derketina **Baz** 'Edud ed-Dewle daxwaza girtina wî kir û ji dora xwe re got: "Ew mirovekî pir behêt û bi heybet e, şer û xirabî jê difûre, merivên wusa gere nemînin". Lê piştî ku xebera reva **Baz** gihîştê, ew zêde li ser nesekînî û dev ji danegirtina wî berda.

Ew [Baz] çu wan geliyên dora **Diyarê Bekir [Diyarbekrê]** û li wir ma ta ku rewşa wî xweş û hêza wî xurt bû. Piştî mirina 'Edud ed-Dewle wî **Meyfarqîn** û **piraniya Diyarê Bekir [Diyarbekir]** zeft kir. Hinek hevalbendên wî çûn gihîştin **Nuseybînê [Nisêbînê]** û ew jî vegirtin. Xelîfeyê wê hingê **Samsam ed-Dewle** rabû bi **Ebû Sa'd Behram ibn Erdeşîr** re leşkerekî giran hazir kir û şande ser **Baz**. Wî [Behram] êrîşî **Baz** kir, lê **Behramşikiya**, hinek ji hevalên wî dîl bûn û rewşa **baz** hê xurttir bû. Bes **Samsam ed-Dewle** di bin serdariya **Ebû Qasim Se'd ibn Mu'hemmed el-'Hacib** de leşkerekî hê pirtir rakir û şand ser wî. Ew li bajarê **Kewaşeya** li cem **Baculaya** li ser **Xabûrê 'Huseyniyeyê** rastî hev hatin û cengeke giran li dar xistin. **Se'd** û hevalê xwe şikestin û **Baz** temamê herêma **Deylemê** zeft kir, wî hin kuştin û hin jî dîl girtin lê piştê yê dîl jî hêdî hêdî kuştin. **Şa'ir**, **Ebû 'Hesen el-Beşnewî**, li ser vê bûyerê weha dibêje:

"Ji **Baculaya** em bi xem ji ber reviyân,

û em di wê tirsê de li kerb û xeman dinêrin“.

Mebest ji ”kerb û xeman”, Baz e (yanî ew weke keder li ber çavên wan e, lê dinihêrin û nikarin tişteki pê bikin - Narozi). Bi destûra Xwedê em ê sedmê vê yekê [vê kerb û nihêrtina lê] di beşa sala 432/1040’î de bibêjin.

Dema ku Baz zora Se’ d bir, tiştên me gotin anîn serê wan û herêma Deylemê zeft kir, hingê Se’ d bi lez çû, berî wî kete Mûsilê û Baz jî da pey. Ji ber xirabiyên Se’ d ên berê li Deylemê xelkê Mûsilê dijî wî rabû, lê ew bi tena serê xwe ji lepên wan filitî. Baz çû Mûsilê jî vegirt û bi vê re hêza wî xurt bû. Wî bi vê yekê pesnê xwe li ser Bexdadê da û qala veqetandina navçeya Deylemê ji Bexdadê kir. Baz gelekî di ser xwe re çû û kete nav hejmara wan kesên jirêderketî û terribî yên herêmê. Piştî vê yekê Samsam ed-Dewle jê pîrr paxav kir, rewşa wî girîng dît û xwe li ser vê [rewşa Baz] êşand. Ew rabû wî leşkerekî zahf da hev ji bo ku êrîşî ser Baz bike û sal jî qediya.

Hinek hevalên me ji Kurdên ’Humeydiyan ku bi bûyerên Baz serwext bûn ji min re gotin ku; “Nasnavê Baz Ebû Şecca“ e û navê wî jî Baz e, lê Ebû Ebdullah bi xwe Huseynê kurrê Dostik e û birayê Baz e. Baz serê pêşî şivan bûye, ew merivekî pir comerd û qenc bûye. Dema şivaniyê wî pezê xwe serjê kiriye û li xelkê bela kiriye, ji ber vê yekê jî navê wî di nav gel de bi camêrî derketiye û alem li dora wî civiyaye. Herweha wî riyan jî dibirî û şêlandinê dikir û li talanan dixist, tiştên ku ji wir jî dihatin dîsa li xelkê bela dikir ta ku koma wî pir bû. Her ku çû wî şerê xwe zêde kir û avête ser deveran. Dawiyê ew kete Ermenîstanê û bajarê Ercîşê xist bin destê xwe. Ev bajarê wî yê yekemîn bû, bi girtina wî [bajarî] re hêza wî qewî bû û ji wir jî ber bi navçeya Diyarbekirê ve meşiya. Wî li wir jî pêşî bajarê Amedê piştê bajarê Meyafarqînê û hinekên din ji navçeya Diyarbekirê vegirtin û” çewa me got, ”pê ve çû heyanî Mûsilê”.<sup>20</sup>

Wergera ji Erebî:

Emîn Narozi

---

(12) Ji berhema İbn el-Esîr ya El-Kamil fî t-Tarîx c. 8, r. 163, beşa sala 314/926’an hatiye wergerandin.

(13) Di çapa C. û A. de ”Wesnan” e, lê di eynî cihî de rêzek li paş ”Qesnan” tê. (Binêre İbn el-Esîr, El-Kamil fî t-Tarîx c. 8, r. 705)

(14) Di çapa C. de ”eş-Şazîn’han” û di ya B. de jî ”eş-Şazîncan” e. (Binêre İbn el-Esîr, El-Kamil fî t-Tarîx c. 8, r. 706)

(15) Ev du zarûyên Rukn ed-Dewleyê Buweyhî ne ku piştî bavê xwe li ser xelîfetiye li hev ketibûn. Malbata Buweyhîyan ku Faris in, demeke dirêj xelîfeti kirine û erdê Îslamê bi ser hev ve dane. (Ferdînanad Tûlû, el-Muncid fî el-Luxe we el-E’lam, Dar el-Meşriq, Beyrût, 1973, çap 7, beşa dîrok û agahan, r. 470, 309)

(16) Ji berhema Îbn el-Esîr ya El-Kamil fî t-Ĥarîx c. 8, r. 705- 706, beşa sala 369/979'an hatiye wergerandin.

(17) Ji berhema Îbn el-Esîr ya El-Kamil fî et-Ĥarîx c. 8, r. 709, beşa sala 369/979'an hatiye wergerandin.

(18) Ji kitêba Îbn el-Esîr ya el-Kamil fî et-Ĥarîx c. 9, r. 5-6, beşa sala 370/980'an hatiye wergerandin.

(19) Li gor çapa A. "Dosik" e. (Binêre Îbn el-Esîr, El-Kamil fî t-Ĥarîx c. 9, r. 35) lê di kitêba Îbn Xeldûn de "Zoştik" û "Doştik" derbas dibe (Binêre Ibn Xeldûn, Kîtab el-Îber we Dîwan el-Mubteda we el-Xeber fî Eyyam el-EĤeb we el-Ecem we el-Ĥerbe, Dar el-Kîtab el-Lubnaniyye, Beyrût, 1958 c. 4, r. 538, 675). Bes diyar e ku şaş e, çiku di hinek çavkaniyên din de jî mîna ya Ebdurreqîb Yûsuf ya bi nav ed-Dewle ed-Dostikiyye fî Kurdistan el-Wûsta (Dewleta Dostikiyan li Kurdistana Navîn) û ya Îbn el-Ezreq el-Fariqî ku ji aliyê M. E. Bozarslan ve bo Tirkî hatiye wergerandin û bi navê Merwanî Kûrtlerî Tarihi hatiye bi nav kirin, Dostik e. Ji bilî gellek agahdariyên hêja ku Ebdurreqîb Yûsuf di berhema xwe ya jorî de daye wî cedwelekî (şemayekî) jî li ser malbata Dostikî û Merwniyan belav kiriye. (Binêre Ebdurreqîb Yûsuf, ed-Dewle ed-Dostikiyye fî Kurdistan el-Wûsta "Dewleta Dostikiyan li Kurdistana Navîn", Hoşeng Kurdaxî, Kurd press, Beyrût/Lubnan, 1996, çap 2, r. 182-183).

(20) Ji kitêba Îbn el-Esîr ya el-Kamil fî et-Ĥarîx c. 9, r. 35-37, beşa sala 373/ 983'yan hatiye wergerandin.

Bangek ji M. Emîn Bozarslan:

## 1998'an "Sala Rojnamevaniya Kurd" qebûl bikin

Nivîskar M. Emîn Bozarslan di nameyêke xwe vekirî ya ji hemû rêxistinên siyasî, çandeyî û komelî re de, gazî berpirsiyaran dike ku sala 1998'an bi navê "Sala Rojnamevaniya Kurd" qebûl bikin. Bozarslan, di banga xwe ya 21.3.1997'an de weha dibêje:

"Wek ku tê zanîn, sala 1998'an, 100 saliya rojnama Kurdî ya pêşîn "Kurdistan" e. Rewşenbîrê Kurd ê nemir Mîqdad Mîdhet Bedirxan, di tarîxa 22'yê Nîsana 1898'an da li Misrê dest bi weşandina wê rojnama dîrokî kirîye, paşê birayê wî Evdirehman Bedirxan kargêriya rojnamê girtîye destê xwe û weşandina wê li Ewropayê domandîye.

Her weha, sala 1998'an dibe 90 saliya "Nûçenama Hevkarî û Pêşketina Kurdan" (Kürd Teavün ve Terakkî Gazetesi), ku di sala 1908'an da li Stanbolê bi Kurdî-Tirkî derketiye.

Ji bil van her duyan, kovara "Jîn" a çandeyî jî di sala 1998'an da 80 salên xwe dadugere. Ev kovara giranbuha jî di sala 1918'an da li Stanbolê bi Kurdî-Tirkî hatiye weşandin. Bi vî awayî, di sala 1998'an da sê salveger digîjin hev.

Wek ku tê zanîn, ez çend sal berê li ser "Kurdistan"ê û "Jîn"ê xebitîbûm, min her du jî wergerandibûn tîpên Latînî û ji nû ve çap kiribûn. Ez dixwazim bi kêfxweşî bidim zanîn ku, ez nuha jî li ser "Kürd Teavün ve Terakkî Gazetesi" dixebitim û wê jî werdigerînim tîpên Latînî. Daxwaza min ew e ku ez berî Newroza 1998'an wê jî çap bikim û bigîhînim destê xwendevanê Kurd. Bi vî awayî, di wê sala dîrokî da, her sê kovarên mr yên dîrokî jî dê di destê xwendevanê Kurd da bin.

100 saliya rojnamevaniya Kurd ji bo me Kurdan bûyereke gelek giring e. Di dîroka hemî neteweyan da bûyerên weha cîyên giring digirin, bi şênayî û civînan tîpên pîrozkirin. Bîranîn û pîrozkirina salvegerên weha tîpên gîhiştina neteweyî fire dike, gîyanê neteweyî xurt dike û hevgirtina neteweyî zexm dike. Eşkera ye ku îhtiyaciya me Kurdan ji hemî neteweyên dî zêdetir bi bîranîn û pîrozkirina salvegerên weha heye.





# Berî ku em hevpeyvînan bixwînin

Laleş Qaso

**P**êşî dixwazim bibêjim, li ser aloziya ku bi destê kurdên bakurê welêt di elfabe û gramera kurmançî de peyda bûye, min hevpeyvîn pewîst dîtî. Bi sebeba ku, belkî hema piçîkekî ev aloziya ha kêmbibe, min hevpeyvîn tenê bi kesên zimanzan an zimanas re sînorkirî ne hişt. Pirs û çerçeweya wan ji aliyê min hatin amadekirin. Bêguman min dixwest ku, ji bilî kesên ku min hevpeyvîn bi wan re kiriye, bi gelek kesên din re jî hevpeyvînê bikim, belê mixabin ewqas ji destê min hat.

Hin hevpeyvîn li ber teybê, hin bi destnivîsê û hin jî bi nameyê bûne. Nivîsên ku wek name gihane destê min, li ser daxwaziya xwediyê nivîsê min bi hin nivîsan nelîst. Vê carê bila xwendevan me bibexîşînin.

Ji ber ku hevpeyvîn hemû li ser elfabe û gramera C. Bedirxan hatine li darxistin, min pêwîst dît ku di vir de pêşî hinekî li ser xebata wî bisekinim û dûra jî hin dîtînen wî binivîsînim. Bi vê yeka ha ez bawer dikim ku xwendevan, pir bi rehetî wê bikaribin hin gotinan bidin berhev.

## a) C. Bedirxan û elfabeya wî:

C. Bedirxan di sala 1919an de elfabeya latînî ji xwe re bingeh digire û elfabeya kurmançiya jorîn dinivîsîne. Di vê elfabeyê de pêşî hin dengên kurdî li dîftongan siwar dike. Dûra piştî demekê dev ji dîftongan berdide û bi 36 tîpan elfabeyekê pêk tîne.

Di sala 1922an de fermanlî direve Elmanyayê û li bajarê Munîhê bi cih dibe.

Li vî bajarî hem zanîngeha hiqûq dixwîne, hem li ser elfabeya xwe dixebite û hem jî bi yûnanî dersên zimên dide hin perefesorên elmanî.

Di sala 1924an de elfabeya xwe ji 36 tîpan dadixîne 34 tîpan.

Di sala 1925an de ji Elemanyayê diçe Misirê. Û ji wir jî tê Sûriyê.

Celadet Bedirxan di elfabe û rêzimana xwe de heta ku tê sala 1932an guhertinan dike. Di sala 1932an de şiklê dawî dide elfabeya xwe. Li gor hin dîtinan, elfabeya wî bi awayê ku hemû zaravên kurdî bibersivîne hatiye amadekirin. Ev jî nameteke din bû ji bo kurdan. Wî bi zimanê farisî, tirkî, erebî, îngilîzî, elmanî, frensî û yûnanî dizanîbû. Dizanîbû belê bi awayê ku bi van zimanan têkeve devjenkan, bixwîne û binivîsîne dizanîbû. Ev yeka ha jî, wî ji aliyê zimên de tam dagirtî dide dest me. Yanî gava ku wî û Roger Lescot gramera xwe a li dor çarsed rûpelî saz dikir, bi hin gramêrên ewrûpiyan jî baş dizanîbû. Girîng e!

#### b) Şeş destûrên C. Bedirxan:

1) ”Ji wan niqtan pêve ko xasê denganiya zmanê kurdî ne, di şikil û dengên herfan de, herçend heye, xwe li elfabeya tirkan nîzing xistin û jê ne dîrketin. Armanca elfabê sekinandina dangan li ser kaxezê bi şikilan e, şikil bi herfan tîn nîşan kirin, û herf qebalewî û bi hemd in. Ji lewre nîşankirina (Bi erebî du tîp danîne ku di kompîtora min de tune ne. L.Q.) dengê bi (c) û yê bi (ç) û bi hevguhartin û cihguhastina wan wekhev bêferq e.

Lê bi vî awyî kurdên welatê jorîn û heçî ko elfabêya tirkî dinasin dê bikarin bê dişwarî ya kurdî hîn bibin û komel û kitêbên me bi hêsanîti bixwînin.

2) Herçend dibe, ew çend dengên herfên latînî ên adetî ko di zimanên din de nas in, di elfabêya kurdî de hilanîn û neguhartin. Bi vî awayî kurd dê bikarin elfabêya biyaniyan û biyanî ya me bi hêsanîti fêr bibin.

3) Nîşankirina her dengî bi herfeke serxwe û ji awayê herfên hevedudanî xwe dîr xistin. Bê şik e ko hînbûn, xwendin, nivîsandin û lêkdana herfên serxwe ji yê hevedudanî hêsantir e.

4) Her dengî bi herfeke cihê nîşankirin, yanî ji awayê nîşankirina çend dangan bi herfekê an dengê bi çend herfan, xwe dan alî.

Ev awa ji fikira çêkirina elfabekê bi hindik herfan an ji qesda qenc li sersekinandina denganiyê dikare bizê. Lê pê her du jî nakevin dest û di zimanî de bila sebeb di şiklî de ciyok peyda dibin û di nivîsandinê de tevlihevîke mezin berpê dibe.

Ji xwe di tu zimanî de danganî û nivîsandin ne lêvên yek in, û nivîsandin nikare bi tevayî li denganiya wî zimanî bê. Lewre ko kitkit û rengên denganiyê bi elfabêyê nayin nîşan kirin û li ser kaxezê sekinandin. Welê bûwa diviya bû

elfabêya her zimanî ji (50-60) herfan hevedudanî bibe.

5) Herçend heye, ji barkirina herfan bi nîşanên nû, xwe dan alî.

Nîşan ji hêlekê di nivîsandinê de bi vegera qelemê wextî dide winda kirin. Ji hêla din bi jibîrkirina nîşanê herf vedigerin ser şiklên xwe ên eslî, bîşan û tevî-hev dibin. Pejirandina çend nîşanan bi hev re ev jî dişwarîke din e. Ji lew re ji bona tevayiya herfên bi nîşan me ev (^)pejirand, û bilindek nav lê kir. Ji ber ko dengên herfan hem diguherîne hem bilind dike, û ji nîşanên wek (-, -') qenc têt veqetandin. Ji xwe boşbûna nîşanan nivîsandinê kirêt dike.

6) Herfên welê bijartin ko di şiklên xwe de li hev bîşan û bikevin hev. Ji lewre diviya bû ko em di nav herfên latînî de bimînin û ji elfabeyên din wek yûnanî û rûsî herfan megirin. Me jî welê kir û elfabêya xwe bi hindik guhartina dengên herfên latînî û bi barkirina hinan bi bilindekê çêkir. Bi vî awayî û gora destûrên jorîn me elfabêya xwe bi sih û yek herfan hevedu daniye. Herwekî di destpêkê de me da zanîn. Sehîtiya ko di her sê zarên kurdî de hatine çêkirin xuya kirine ko di zimanê kurdî de dengên bingehî ev sih û yek deng in. Ew jî bi van sih û yek herfan hatine nîşan kirin. Belê, her fin hene ko geh zirav, geh stûr, geh ji pêşî, geh ji paşiyê tîş xwendin. Lê ev fer qên ha ne ji guhêrîna cihderka dangan, lê belê ji guhêrîna rengê dangan tîş pê, û ji lewre di elfabêyê de nayin nîşan kirin. Ji ber ko elfabê tîş dangan nîşan dike, ne rengê dangan.” Hawar, hejmar 2, rûpel 6-7)

### c) C. Bedirxan li ser kumik û niqtê çî dibêje?

Ew dengdêran ”e, i, u - ê, î, û” dike du beş û dibêje:

”Niho, me ev şeş herf hene ko di pêşberî hev de, du tofên di şiklî de nîzîngî hev ditînin pê.

Em van çarên jêrên bigirin destê xwe û bi wan mijûl bibin: (e, i - ê, î)

Lê herwekî me berê jî goti bû, di dengayiya kurdî de, dengdêrek carinan kin û carinan dirêj nabit, yanî herçî dengdêrên ko kin in dirêjên wan nîne û herçî dirêj in kinên wan peyde nabin. Ber vê yekê dengdêra (e) herçend bête dirêj kirin tucarî nabit (ê) ji ber ko cihderkên wan ji hev cuda ne. Herwekî (i) jî bi dirêjxwendinê nabit (î).

Di destê me de tu herfên din ne ma bûn, û gora destûreke me diviya bû em herfên hevedudanî emel mekin. Ji lewre ji bona nîşan kirina tofa paşîn me ev nîşana ha (^)pejirand û navê wê kir bilindek.

Ev nîşana ha di hin elfabeyên din de jî heye. Lê bi vê ferqa ko di elfabeyên din de dengê dengdêran weke xwe dihêle, cihderkên wan naguherîne, tîş bilind dide xwendin. Di elfabêya me de du karên wê hene: Dengê dengdêran diguherîne û bilind dide xwendin. Lewma dengdêrên bi bilindek hemî jî dirêj

in û tucar kin nayên xwendin.

Li gora destûrên me ên bingehî, ko ji bona çêkirina elfabêya xwe me pêkanî û di pêşiya vê bendê de me da zanîn, diviya bû ko em bê sebebeke zor ji elfabêya tirkandûr mekevin. Li hir e, di herfên (i-î) de em ji ya wan dûr ketin.

Tirk (i)ya kin bi (i)ke bê niqte nîşan kirin. Heke me jî welê bikira û (i)ya kin bi (i)ke bê niqte û ya dirêj bi (i)ke adetî nîşan bikira çêtir ne dibû.

No, ji ber ko (i)ke bê niqte di nav herfên (u-n-m) û di pêş û paşê hin herfan de tevli wan dibe û ji wan derêxistina wê dikeve dişwariyê. Ji xwe tirk jî piştî çêkirina elfabêya xwe pê hisiyar û ji bona veqetandina (i)ke bêniqte ji herfên jorîn ko ketiye rex an nav wan, ser herfa ko berî (i)yê dihat îşaretê berdidasan.

Bê şik e ko me nikarî bû em bikevin nerastiyeke welê ko ji aliyê daniyê xwe ve hati bû nîşan kirin.

Jû pêve, herwekî heta niho xuya bû, ji lewre ko dengayiyên van du zimanan cihê ne, isûlê dengdêrên kurdî bivê nevê ji isûlê tirkandûr ketiye.” Hawar, hejmar 10-11, rûpel 4, 5.

ç) Li ser yekitiya elfabeyê:

C. Bedirxan di Hawarê hejmara sisêyan de ji Hamid Ferec re dibêje:

”...yekbûna miletan bi yekîtîya zmanî dest pê dike. (Bizmark yekbûna Elmanyayê li ser yekîtîya zmanê elmanî danî bû.

...Yekbûna kurdan jî bi yekîtîya zmanê kurdî çêdibe. Yekîtîya zmanî jî bi yekîtîya herfan dest pê dike. Yanî di yekîtîya zmanî de yekîtîya herfan gava pêşîn e.”

d) C. Bedirxan ji bo gramere çî dibêje?

”Gramer tevayiya qeydeyên rastaxaftin û rastnivîsandina zimên e.” Hawar, hejmar 27, rûpel 11.

e) Pêşniyar min:

Di van hevpeyvînan de a herî balkêş ku min dît, herkes C. Bedirxan wek otorîte qebûl dike, belê ji bilî Hesenê Metê, kesek jî wek wî nanivîsîne!

Li gor dîtina min gerek em li gramera C. Bedirxan vegerin; gramera wî wek pakêtiya ji xwe re mînak bigirin û binivîsînin. Eger redaksiyonên kovar û rojnameyan bikaribin biryareke wilo bistînin, ez bawer dikim ku tevliheviya zimên bi vî awayî wê hinekî rabe û herkes wê bibe xwedî nivîsek bi pîvan. Û a din jî êdî kesek wê nikaribe bibêje ”bi nivîsa min nelîze!” Wekî din, ez bi sê (1-2-4) pêşniyarên Alî Çiftçi re me. Belê eger gava ku wek Çiftçi hatekirin, berî her tiştî divê ku organîzasyonên kurd li hev rûnên; li hev bikin û dûra jî vê meselê bispêrin zimanasan. Wan çawa biryar da hêzên siyasî jî dê wan biryaran pêk bînin.

# Bi Kemal Burkay re

- Birêz Kemal Burkay, wek tê zanîn demek dirêj e ku di warê xebitandina elfebeyâ kurmancî de, di nav kurdan de dubendîyek heye. Li aliyekî PSK û hin rewşenbîrên kurd bi awayekî û li aliyekî jî temamê kurdistanîyên ku bi latînî hîn bûne, bi awayekî dinivîsîn. Ez bawer dikim ku tu bi vê dubendiya ha wek nivîskar, şair û siyasêgerekî kurd dêşî.

Di zikhev de pêşî dixwazim du pirsan ji te bikim:

Yek, gelo sebebên ku PSKê bêkumik nivîsand çî bûn?

Dudu, sebebên ku PSK hîn bêkumik dinivîsîne çî ne?

- Ger meriv pirsê usa dayne, angû, "bêje li alîkî PSK û hin rewşenbîr, li alî din hemû Kurdistanîyên ku Latînî hîn bûne" şaş e. Divê meriv meselê ji destpêkê bigre: Ev guhartin kîngê, bi destê kê û çîma çêbû û wê demê li welat rewş çawa bû?

Divê berî hertiştî bêjim ku, di warê çapemenî de bê kumik nivîsandin, cara pêşîn bi weşanên PSK dest pê ne kirîye. Di navbera salên 1962 û 1966 da çend kovar û rojnameyên emirkurt derketibûn, di rûpelên hinan da çend şîer û nivîsên kurt hatibûn weşandin. Wek Dicle Firat, Deng û Yenî Akiş.. Bi rastî di bîra min da ne mabû, van weşanan ew mesela kumik çawa bi kar anîbûn. Hemû hejmarên wan jî li der welat di dest min da tune. Angû yê heyî li Tirkîyê man, yan windabûn, yan hatin şewitandin. Vê dawîyê Dicle-Firat ji nu va çap bû. Lê nihêrîm û bala min kişand: Di wê da (i-î) yek bê niqte, yê din jî bê kumik hatibû nivîsandin; angû wek me. Di "Deng" da jî bi vî şiklî bi kar hatîye. Yenî Akiş, ku tê da gelek nivîsarên min derketi bû; her hal di wê da jî usa bû.

Di sala 1969 bi navê "Karakoçan" kovarek derketîye û tê da şêirên ku hatine çapkirin, ew jî bi şiklê (i-î) ne. Dîsa di wê salê da bi navê "Dîrîlîş-Mardîn'în Sesî" kovarek derketîye, di wê da jî Kurdîya ku heye dîsa bi vî rengî (i-î) ye. Di sala 1970 Bultena DDKO jî usa ye. (Binêr Rojnamegariya Kurdî, Malmisaniy û Mahmut Levendî).

Angû xuya ye ku, rojname û kovarên ku berî me derketine, di hemûyan da (i-î) wek me bi kar hatîye. Helbet di vê da sedemek heye. Bi raya min, ji bo hêsanîyê usa bûye.

Di wê demê da wek kitêbên Kurdî jî, elîfba Mehmet Emîn Bozarslan û Memû Zîn'a ku wî wergerandibû Latînî û du kitêbên Musa Anter (Birîna Reş û Ferheng) derketibû. Çapê wê demê yê hemûyan îro di dest min da tunin. Lê Musa Anter di kovar û rojnaman da, her usa jî di "Qimil" da bi şiklê (i-

î) kar anîye. Bozarslan jî, di Mem û Zînê da bi şiklê (i-î) kar anîye; ango yek bê niqte, yê din bi kumik..

Her usa jî, Dr. Şivan (Dr. Saît Kirmizitoprak) di destpêka salên 1970'yî da li Kurdistana Başûr ji bo PDK Bakûr meqerek vekiribû û li wê derê dersên zman bi vî şiklî dabû hevalên xwe. Gotibû ev kumik zêdeyîyek e û hînbûna zman girantir dike. Min ev tişt ji hevalên Şivan bihîstibû.

Min bi xwe di sala 1973 li der welat dest bi nivîsandina Kurdî kir. Hingê min di Ronahî da dinivîsand û bi kumik bû. Lê piştî ku em vegeîn welat û me li wir dest bi karê weşanê kir, me jî ew guhartin bi kar anî. Him di Rîya Azadî û Roja Welat da, him jî di kitêbên Kurdî da. Ev guhartina ku berî me bi destê kesên dinê hatibû kirin li me jî xweş hat. Guhartineke piçûk bû, lê ji bo xwendin û nivîsandinê hêsanîyek bû.

Me berê di Rîya Azadî (Özgürlük Yolu) da dest bi nivîsandina Kurdî kir. Rîya Azadî, di hejmara xwe ya heftan da (Çileyê Pêşîn 1975) di rûpelên xwe da beşek ji bo Kurdî vekir.

Hingê di warê çapemenîya Kurdî da, xasima ji bo Kurmancî-Latînî, li welat û li der welat rewş çawa bû?

Dema me dest bi weşana Rîya Azadî kir, li Tirkîyê tu kovar û rojnameyeke ku Kurdan derdixist tunebû. Di nav Kurdên Tirkîyê da yên ku xwendin û nivîsandina Kurmancî-Latînî dizanibûn qasî tilîyê du destan ne bûn. Kovar, rojname û kitêbên ku Kurdan berî sala 1970 derxistibun jî, bi piranî, di dema hukma leşkerî da ji tirsê hatibûn şewitandin û di dest xelkê da tunebûn.

Di vî warî da wê demê li parçên dinê û li der welat rewş çawa bû?

Li Sûrîyê tu weşaneke latînî tune bû. Li Ewrûpa di destpêka salên 1970'yî da du kovar derdiketin: Çîya û Ronahî. Çîya weşana xwe zû da sekinandibû û tenê Ronahî derdiket. Ew jî bi destê hevalê me derdiket..

Behsa parçên dinê û Kurdên Sovyeta berê nakim, ji ber ku elîfba wan bi tîpên Erebi û Kirîlî ye.

Ango, di sala 1975 da dema me dest bi weşana Kurdî-Latînî kir, "ji bo PSK û hemû Kurdistaniyên din" rewş usa bû, hevalê delal! Di nav "hemû Kurdistaniyên dinê" da yê ku bi Kurdî-Latînî tiştêk diweşand tune bû! Me li Tirkîyê, li himber zulm û zordestîyeke giran Roja Welat derxist û tevî wê jî gelek kitêbên bi zmanê Kurdî..

Ango wê demê terkkirina kumik li ser (î) pirseke mezin nebû. Kesî ew tişt ji xwe ra nekire derd û êş û ji me ra jî serevde.. Ji xwe, yên berî me jî -yên ku li Tirkîyê elîfba Latînî-Kurdî bi kar anîbûn hemûyan usa kiribûn.. Heya, rehmêtî Kamran Bedirxan ku, di jîyandina elîfba Kurdî da para wî qasî kekê wî Celadet heye, ev nekire tu pirs. Me rêzmanê wî yê piçûk cara pêşîn di nav Weşanên Hevra da li der welat çapkiribû. Cara duwemîn ku me ew li welat,

di nav Weşanên Rîya Azadî da der xist (Çirîya Paşîn, 1977), kumik jî rakir û sebebê wê di pêşgotinê da nivîsand. Kamran Beg ji bo vê yekê tu acizî nîşan neda û heya wek alîkarî ji me ra çend quriş pere şand ji bo vê xizmetê.

Ez bi xwe baş dizanim ku, elîfbayek ku cîyê xwe girt, tê da qisur hebin jî, zû bi zû nayê guhartin. Meriv nikare, kîngê dilê xwe bixwaze bi elîfbê bilîze. Lê dema ku ew guhartin çêbû, terkkirina kumik ji bo Kurdan nebû pirseke mezin. Ji ber ku, him guhartin piçûk bû, him jî, ji çend rewşenbîran pêve, gelê Kurd hîn elîfba xwe ya Latînî nasnedikir. Lîteratûra Kurdî ya Latînî jî hîn gelek kêmbû.

Lê terkkirina kumik hêsanîyeke baş bû. Ji ber ku, yên vê elîfbê bi kar tînin piranî Kurdên Tirkîyê ne. Ew jî hîn elîfba Tirkî ne. Terkkirina kumik ji wan ra hêsanî ye, him di warê xwendinê da, him jî di warê nivîsandinê da.

Lê ev dubendîya îro, çawa çêbû û çawa bû pirs ji bo me?

Piştî me, hevalên KIP'ê jî (hevalên Şivan) "Tîrêj" derxistin û tê da ev guhartin bi kar anîn, angoyan jî dev ji kumik berdan. Wek organa PDK-Tirkîye "Xebat" derket, (i)ya wan jî bê niqte bû. "Ala Rizgarî" jî usa bû.

Angoyan ku, li Tirkîyê kovar û rojnamên ku piştî me derketin, wan jî wek me û wek berî me kirin.

Li Ewrûpa yek-du weşanên teze (wek Dengê KOMKAR û Roja Nu, ku hevalên me derdixistin) wan jî dev ji kumik berdan.

Xuya ye ku wê demê di nav Kurdên Tirkîyê da, di weşanên heyî da -li welat û der welat- yekitî hebû û ew jî bi rengê (i-î) bû.. Angoyan ne tenê karê PSK bû.

Lê piştra, xasima piştî 12 Îlona 1980, ku gelek kes derbazî der welat bûn û li wir karê çandî geş bû, kovar û rojname bi dû hev derketin, hin kes û rêxistinên di weşanên xwe da dîsa kumik bi kar anîn. Hevalên KIP'î û yê dinê jî cardin vegeştin ser kumik. Bi vî awayî ev dubendîya îro çêbû.

Kurd û Tirk li Tirkîyê cîranê hev in. Li pir cîyan di mekteban da bi hevra dixwînin, di karxanan da bi hevra kardîkin. Di civînan da, di zindanan da li ba hev in. Lê li Ewrûpa cuda ye. Kurdên me yê ku ji dest rejîma zordest a Tirk revîn hatin der, li vir, di navbera xwe û Tirkan da xetêke stûr kişandin.. Cîranî, çûn û hatin êdî nema.. Bi raya min, di karanîna kumik da jî, ne sedemên ilmî, lê tesîra vê hîssiyatê heye. Kurdên penaber xwestin (î)ya Kurdî ji ya Tirkî cuda be! Piranîya wan, xwendin û nivîsandina Kurdî ji Rîya Azadî û Roja Welat hîn bûbûn, lê dema ku hatin Ewrûpa, li vir vegeştin ser kumik..

Baş e, lê em (ç)ya kurdî, (ş)ya kurdî û (e) û (a)ya kurdî û gelek dengên dinê çawa bikin? Ji ber ku ew jî wek yê Tirkan in.. Celadet Bedirxan ew bi zaneyî usa danîne..

Me bi nîyeteke baş, ji bo hêsanîyê, dev ji kumik berda. Dê me ne ew bû

ku, em ji xelkê cudabin. Heya me jî wek xelkê kir. Lê mixabin îro dubendîyeke usa çêbû. Helbet ez jî ji vê dubandîyê aciz im.

- *Kurd bêdewlet bûn; serok û rewşenbîrên kurdan di welatê xwe de xwînê û derketî bûn. Kurdan bi sed salan zimanê xwe bi elfabeya erebî nivîsandibûn. Tîpên erebî miqedes dizanibûn; nivîşt û bazbend ji tîpan çêdikirin û bi xwe ve dadiliqandin. Celadet Bedirxan jî di dewreke wilo dijar de elfabeya xwe saz dike û vê elfabeyê bi serok û rewşenbîrên kurdan qebûl kirin dide.*

*Birêz Burkay, di vê dewra pêşketî de gelo sebebên ku serok û rêberên kurdên bakurê welêt li ser du tîpên elfabeya C. Bedirxan nikarin li hev bikin çî ne? Safikirina vê problemê wê çawa bibe?*

- Ez xizmeta ku Celadet Bedirxan ji zmanê Kurdî ra kirîye gelek giranbuha dibînim. Ew mirovekî welatperwer, jîr û zana bû, di warê elîfba û rêzman da ji bo Kurdî-Latînî bingeheke baş danî. Divê em sîstema wî baş biparêzin û xirab nekin. Ger em di elîfbê û rêzman da hin kêmasî û şaşîyan bibînin jî gor dil û daxwaza xwe tê da guhartinan çênekin. Herkesek usa bike sîstem namîne û hertişt tevî hev dibe. Kîngê Kurd rizgar bûn, guhartinên ku hewce bin, bi destên saziyên netewî yên merkezî û resmî tên kirin û herkesek jî, bibê nebê gora wan dike.

Lê bi raya min, ev guhartina gelek piçûk ku bi destê Kurdên Tirkîyê li welat, hîn berî sala 1970'yî hatibû kirin. Rakirina kumik, tu zirar ne daye sîstema elîfba Celadet Bedirxan. Wî bi xwe jî, dema elîfba xwe hazir kir, xwest nêzî elîfba Tirkî be, da ku Kurdên Tirkîyê ku latînî bi kar tînin, bi rehetî hînê wê bin. Celadet Beg raya xwe di vî warî da di Hawarê da jî nivîsandîye.

Lê çima di navbera elîfba Celadet Beg û ya Tirkî da, di nîşanên van du dangan da (i-î) yan jî (î-î) ferq heye, divê meriv li ser wê bifikire. Gor hin malûmatan, wê demê, nîşanên van her du dangan di Tirkî da jî hîn rûneniştibû. Tirkan bo yekî niqte, bo yê din kumik bi kar danîn. Ya din jî, daktîloyên dest wan ji bo nivîsandina (i) ne dibûn. Bo guhartinê jî îmkânên wê deme têr ne dikir.

Sebep çî dibe bila bibe, îro, di elîfba Kurdî-Latînî da ev dubendî ne tişteki baş e û divê em jê ra çareyekî bibînin. Divê yan em bi temamî dev ji kumik berdin, yan jî bi temamî vegerin ser kumik.

Ji bo me ne mesela ênadê ye. Bo xatirê yekitîyê em dikarin vegerin ser kumik. Lê bi raya min, ewê bibe gavekî ber bi paş. Işê Kurdan di xwendin û nivîsandinê da wê zehmettir be.

Yek jî, nebe ku em vegerin, lê vêcar yê din poşman bin!

Bona vê yekê jî, divê em herdu alî li ser vê meselê, ne bi serhişkî lê bi dilekî fireh bifikirin. Gelo kîjan bo zmanê Kurdî rasttir e, kîjan baştir e?

Bi raya min kîjan bo hînbûna xwendin û nivîsandina Kurdan hêsantir e, ya



rasttir jî, baştir jî ew e.

Hin kes dibêjin (î)ya Kurdî ji ya Tirkî dirêjtir e û divê li ser kumik hebe. Ez dirêjîyeke usa nabînim. Lê usa be jî, di wê da çi heye, meriv dikare dirêj bixwîne! Kumik jî, niqte jî nîşanên dangan in, ne deng bi xwe ne. Nîşana dengên wek hev jî di hemû zmanan da ne yek e.

Divê em li ser pirsê hêsanî û giranîyê bifikirin: Kîjan xwendin û nivîsandinê hêsan dike, kîjan girantir dike? Kîjan zêde wext distîne?

Divê em ji zarokan û xortan bipirsin, ji xwendevanan, ji mamosteyên zman bipirsin, ewana bo vî tiştî çi dibêjin?. Divê em guhê xwe bidine nav welat.. Meriv dikare anketekî çêbike di nav gel da.

*- Tu pêvîst dibînî ku li ser pirsên elfabe û rastnivîsîna kurmancî û dimilî semîner, civîn û hwd. bêt amadekirin?*

- Helbet di civîn, semîner û kar-xebatên wekî wan da gelek feyde hene. Lê divê berî hertiştî ji bo çareserkirina pirsê kumik civîn bêt çêkirin baştir e. Divê zmanzan, nivîskar û rewşenbîrên Kurd bêt ba hev li ser vê babetê ray û ramanên xwe bêjin û bigihîjin netîceyekê.

*- Ji bo elfabe û rastnivîseke bi rêkûpêk, gelo xebatên te hene?*

-Ez ta ji destpêkê elîfba û rêzmanê Celadet Bedîrxan bi kar tînim. Bi nivîs û karên xwe yên dinê jî tim ji bo nasandin û cîgirtina wan xebitîme.

Rêzmanê Kurdî ya piçûk ê Kamran Bedîrxan ku îzahata xwe bi Tirkî ye, cara pêşîn, sala 1974 di nav weşanên HEVRA 'da derket û min Tirkîya wê gor dema teze rast kir û bo çapê hazir kir. Vê dawîyê li welat çapa pêncan çêbû.

"Dersên Zmanê Kurdî" jî, wekî tê zanîn dîsa berhemeke min e û bi navê Baran derketîye. Di vê kitêbê da jî ez elîfba û rêzimanê Celadet Beg bi kar tînim.

Kar û xebata min li ser elîfba û rêzman ev e. Wekî din karê min ê din gelek e û rê nade ku ez li ser zman xebatên dinê bikim. Lê nivîsandin bi xwe jî ger ji zman ra xizmetek e, ez bi navê xwe û bi hin navên dinê bi Kurdî dinivîsim, berhemên sîyasî û edebî didim.

# Bi Reşo Zîlan re

- *Birêz Reşo, demek dirêj e ku di warê pêkanîna du tîpên elfabeya kurmançî de, li bakurê welêt dubendiyek heye. Li aliyekî PSK û hin rewşenbîrên kurd bi awayê bêkumik û niqte û li aliyekî jî temamê kurdistanîyên ku bi latînî hîn bûne bi awayê kumik û niqte dinivîsînin.*

*Gelo nivîsandina bi awayê bêkumik û niqte, di warê li hevdukirina dangan, avakirina kîtan û hwd. de çewtiyeke rêzimanî bi xwe re tîne an na?*

- Pirsê elfabeyê ne pirsê rêziman e. Ji ber ku elfabe tiştêkî cida ye û rêziman tiştêkî cida ye. Rêziman ew qayide û qanûn in, ku zimanek bi xwe li ser ava bûye. Eger rêziman ji bo zimanekî ne hatibe nivîsandin, mirov ji aliyê zanista zimên de lê dinihêre; hin qanûn û qayideyên zimanan hene, wan dide ber xwe û li gor wan li rêzimana wî zimanî dikole; paşê qayideyên avabûna wî zimanî derdixîne meydanê. Lê heçî elfabe ye, ew zêdetir nîgar in, resim in ku ji bo her dengî cida cida hatine danîn û ji deng derbasbûna ser kaxezê ye. Gava tu dipeyivî, tu dangan bi kar tînî; hin endamên laşê xwe bi kar tînî; paşê deng derdikevin derve û tu wan dibihîzî. Bi vî awayî ziman dibe navgîn. Lê gava ku ne bi deng be, tu wan tiştên ku dibêjî birjînî ser kaxezekê, vêca ji te re nîgar gerek in. Ji bo her dengê ku ji devê te dertê, divê ji bo wan, tu resimekî bibînî û yek bi yek li ser kaxezê nîşan bidî. Vêca ji ber hindê dixwazim vê pirsê zelal bikim:

Bi guhartina elfabeyê yan jî çend tîpan rêziman xerab nabe. Rêziman wek xwe dimîne. Lê elfabe xerab dibe.

*- Yanî em dikarin bibêjin ku di guherandina du tîpên elfabeyê de rêziman xerab nabe?*

- Belê xerab nabe. Heta ku tu guhartinê di rêziman bi xwe de nekî, rêziman wek xwe dimîne. Guhartina elfabeyê tesîrê li ser zimên nake.

*- Bi rakirina niqte û kumikê, gelo zimanê kurmançî dikare nêzî zimanê tirkî bibe? Bibexişîne, berî argumentên ku tu ê pêşkêş bikî, ez hêvî dikim ku tu pêşî erê an na bibêjî û dûra têkeve vê meselê.*

- Eger tu wek "erê an na" bersivê bixwazî, ez hêvîdar im ku tu gotinê bi rengekî din şirove nekî.

*- Na na, rica dikim, wilo ne fikire. Di vê kasetê de tu çi bibêjî ez ê wê binivîsînim.*

- Ez dibêjim erê. Lê ez mecbûr im ku vê yekê hinekî zelal bikim. Eger parekî milletê kurd ê mezin ne di bin destê tirkan de bûna, li welatekî din, li cihekî din bindest bûna, min ê bigota na. Vêca ji ber ku parekî me î mezin di bin destê tirkan de ne, gava ku guhartina tîpekê bê pêşniyar kirin û ew tîp bi xwe di

zimanê tirkî de hebe, ez dibêjim erê dikare bibe sebebê guhartina dengên kurdî. Ji ber ku her zimanek li gor xwe xwedî dengêkî ye. Gava tu bala xwe nedî van qîmetan, wê çaxê problem mezintir dibe. Eger tu bixwazî grafemeke, ango nîgareke ku ji bo zimanê tirkî hatiye danîn têxî zimanê kurdî, kurd ku tirkî dizanin dê wê grafemê bigirin û wek ku di zimanê tirkî de tê bi lêv kirin, di zimanê xwe de jî bi lêv bikin.

- *Belê kurd vê grafemê(u) bi awayekî û tirk jî bi awayekî din bi kartînin.*

- Ji aliyê bilêvkirinê de piçek şaşî heye. Ji ber ku em wê wek (u)ya tirkî nabêjin. Ji ber ku di kurmancî de bi awayekî giştî dengê wek(ü)bes di hin devokan de heye. Lê wekî din ew (u) ye. Wek gava tu dibêjî gund(g-u-n-d), kurd(k-u-r-d). Lê heçî (u)ya di tirkî de ye, ew jî ya me dirêjtir e, mîna (û)ya me ye. Wek "uzun".

Eger tu bala xwe bidî vî cîlê nû, ku bêtir di bin tesîra tirkî de mane û kurdî dipeyivin, tu ê bibînî ku bi rastî ev deng hêdî hêdî dikevin bin tesîra tirkî. Mesele bala xwe bide kurdên Entabê, Sêwasê û hwd. di wir de ew deng hêdî hêdî tê guhartin. Kurdên ku cîla nû ne, nikarin xweşik bibêjin kurd. "Kürt" an jî "Kürd" dibêjin. Eva ha jî nimûneyeke gelekî baş e. Naxwe gava ku zimanekî serdest hebe û zimanekî din bindestê wî zimanî be, mecalaxwandin û nivîsandina wî zimanî tunebe, zimanê serdest dikare tesîra xwe li ser hin dengên wî zimanê bindest bike. Nimûneyeke din:

Paşgira (istan). Kurd vê paşgira ha tucarî wek (îstan) bi lêv nakin. Yanî kurd nabêjin Kurdîstan, Gulîstan, Afganîstan û hwd.

- *Çawa dibêjin?*

- Dibêjin Kurdistan, Gulistan, Afganistan, Bulgaristan û hwd. Wisan e yan na?

- *Wisa ye belê kurdên ku asîmle bûne Kurdîstan, Gulîstan û hwd. dibêjin.*

- Birayê min, asîmlasyon ji çi tê? Yek ji nexwandebûna zimên, dudu ji serdestbûna zimanê tirkî, sisê ji pûtepênedana zimanê xwe tê.

- *Mesele yekî wek min ku hîn baş nizane bi swêdî, gava ku yekî kurd dipeyive ez ji swêdiyekî bêtir di swêdiya wî de digihêm. Ez vê yekê jî bi deng ve girêdidim. Yanî dengê wî ê kurdî di têgihîştina min de dibe alîkar.*

- Na, ew ji sebebeke din tê. Gava mirov hînî zimanekî din dibe, berî her tiştî mirov bi zimanê xwe di hîzîre û paşê wê di mejiyê xwe de werdigerîne zimanê din û wisan dibêje. Ji ber vê yekê ha tu wek mirovekî kurd gava kurdekî ku bi swêdî dipeyive, tu jê çêtir fêhm dikî. Yanî hizirkirina te û wî yek e. Lê gava tu wan hizîrên xwe ji yekî swêdî re bibêjî û yê swêdî ew fêhm ne kir, mana xwe tu şaş dibêjî.

- *Belê dîsa jî bi dengê xwe ê kurdî dibêjim. Ez ê nikaribim (a-b-d) ya swêdî wek swêdiyekî bibêjim. Di vir de gerek dengêkî me î taybetî hebe.*

- Belê. Yekî kurd (a)ya xwe li gor xwe û yekî swêdî jî li gor xwe wê dibêje. Lê gerek tu vê bidî ber çavên xwe: Tu behsa kîjan zimanî dikî? Eger swêdî be, wê gavê jî divê tu guh bidî yê swêdî, tu rîayetî gotina wî bikî û wek wî bibêjî. Eger te wek kurdiya xwe got, wê çaxê jî te mala wî zimanî xerab kir. Ne tişteki rast e. Gava tu bixwazî zimanekî rast û durust bipeyivî, divê tu ji her alî de hewl bidî xwe, mirovên ku wî zimanî çawan dipeyivin wek wan bipeyivî.

Îcar di bersivê de ji bo kumik û niqtê min gotibû erê, yanî divê kumik û niqte wek xwe bimînin. Xetereke mezin e ku bîna guhartin! Çimkî gava wek ku tirk dixebitînin ev her du tîp hatin guhartin, çî ji alî kвалîtetê û çî ji alî kvantîtetê de wê nêzîkî yê tirkî bibin. Û ev yeka ha ji bo zimanê me ne tişteki rast e. Argumenta ku tirk (b) dibêjin û (b) dinivîsînin, kurd jî (b) dibêjin û (b) dinivîsînin ji bo kumik û niqtê derbas nabe.

- Çima?

- Ji ber ku (b)ya kurdî û (b)ya tirkî ji aliyê fonolojîk de ji hevdu ne ewqasî cida ne. Xeter tê de tune ku em bibêjin ev deng wê di wextekê de bibe dengê tirkî yan têkeve bin tesîra tirkî. Lê ferq di navbera (i-î)ya kurdî û ya tirkî de heye.

- Ew ferq çî ye?

- Ji aliyê qîmetê, kвалîtet û kvantîtetê û kurtbûn û dirêjbûnê de ferq heye. Tu (î)ya xwe bi şikleki û tirk (i)ya xwe bi şikleki din dibêjin û dinivîsînin. Û (î)ya kurdî ji (i)ya tirkî dirêjtir e.

- Her tiştê me kurdan ji ê xelkê dirêjtir e.

- Na.

- Mesele (a-o) ya me ji (a-o) ya tirkan dirêjtir e.

- Na, divê mirov ji aliyê fonolojîk de lê binihêre bê ka qîmetê wan çiqas e ne çiqas e. Dibe hin ferqên piçûk hebin. Lê dibe ku tesîrek mezin lê neke. Tişteki din heye:

Ji aliyê dengê (a-e) de mirov di hin devokên kurdî de dibîne ku ew (a)ya tê gotin, ne (a)yeke durust durust e. Yanî ne sedîsed (a)ye. Ne sedîsed (e) ye. Bûye dengê ku di navbera (a-e)yê de ye. Bi kurtî dixwazim bibêjim eger (a)ya kurdî û (a)ya tirkî mîna hev be jî xeter tê de nîne. Ji ber ku guhartinek mezin nayine meydanê. Lê heçî (i-î) ye, ew guhartineke mezin tîne meydanê. Tişteki din:

Tirkan hetanî çend sal berê û heta niha jî, hin tirkên ku dixwazin wê orjinalîteya zimanê xwe biparêzin, (î)ya dirêj ya îranî û erebî bi awayê kum dinivîsin.

- Mesele?

- Mesele gotina "maden" û "madenî" Gelek tirk hene niha jî gava

dinivîsînin bi awayê kumik ”madenî” dinivîsînin. Ji ber ku maden gotineke ne bi tirkî ye. (Î)ya ku tê paşiyê wê dike rengdêr û ew rengdêr bi xwe di zimanê erebî û farisî de heye.

- *Belê îro tirkan ew îşaret rakirine û ew tîpa ku bi wî dengî dirêj dihate xwendin dîsa dirêj dixwînin.*

- Belê, ew mirovên ku dixwazin tam û lezeta zimanê xwe bibînin, sedîsed welê dinivîsînin. Ji rexeke din ve, çîla kevn her bi kumik dinivîse.

- *Baş e birêz Reşo, taybetmendiya kumikê ku tê ser hin dengdêran û nayê ser hin dengdêran çi ye? Gelo ev kumik tiştêkî îlmî ye?*

- Çima hûn dev diavêjin rehmaiyê C. Bedirxan. Di gelek zimanan de kumik heye heyran. Çima hûn bi tenê yên kurdî digirin û berê xwe nadin hin zimanên din yên ewrûpî? Li hin zimanên slavî temaşê bike. Di zimanê romanî, çekî, portûgalî, spanî, frensî de hin îşaret li ser vokalan hene. Çima hûn van zimanan nadin ber çavên xwe? Û we berê xwe bi tenê daye kurdî û dibêjin; ”Çima li ser tîpên me kumik hene?” Eger di elfabeya latînî de tîpek din hebûya, ew keys bida me ku me bikaribûya (ê)ya xwe pê nîgar bikira, me ê ew daniya. Kumik ji ber hindê ye. Rehmetî C. Bedirxan temaşê kiriye ku diva bû ferqê têxe navbera (e-ê)yê. Eger tu ji aliyê fonembûnê de lê binihêrî, ew ji hevdu cida ne. Her yek maneyeke xwe dide. Wek nimûne; (em) tiştêk e û (êm) tiştêk e. Îcar rehmetî fikiriye ku dê çawan bikaribe vê bide xuya kirin. Temaşê kiriye ku baştirîn tişt ew e, ku nîşanekê bide ser (e)yê. Îşareta frensî jî hîlnabijêre; a kum hildibijêre. Ew jî ji ber ku di elfabeya transkrîpsiyona zimanên rojhilatî de kumik, ji bo dirêjkirin û bilindkirina vokalan dihête bi kar anîn. Pir jî baş fikirî ye. Xwedê kiriye ku elfabe wê çaxê hatiye danîn! Eger îro bihata danîn, gelek kurmancên me dê tiştên weha bi misogerî bidana bin pêyên xwe. Gava tu dikî tiştêkî bikî, gerek e ku tu berî her tiştî li çand, kultur û tarîxa xwe jî binihêrî. Vî camêrî wisan kiriye. Ji bo vê jî layiqî destmaçîkirinê ye. Îcar sebeba ku kumik daniye ser sê vokalan, ji aliyê kvantîtet û kvalîtetê de ji bo ku ji yên din cida bike.

- *Belê ez dixwazim dîsa vegerim ser (i-î). Wek ku tirk bi van her du tîpan dinivîsînin, em jî binivîsînin çima nabe?*

- Ma ne min di serî de jî gotibû. Eger para bêtir a miletê kurd ne di bin destê tirkan de bûya, min ew talûke ne didît. Lê ji ber ku em di bin destê wan de ne, dê ew deng bi rêya tirkî qîmeta xwe ya orjînal winda bike. Û di gelek tiştan de jî wê çaxê mane dibe ku bê guhartin. Paşê çima, yanî îllahî em mecbûr in elfabeya xwe nêzikî ya tirkan bikin! Çima ma em mecbûr in ku em her tiştên xwe bikin wek yên tirkan! Çima wextê ku ez bi kurdî dinivîsînim îllahî bi tirkî bifikirim û bi kurdî binivîsînim! Birayê min, wisan nabe! Divê em kurd bigihên qenaetekê: Yan em ê wek kurd bimînin, yan em ê bibin tirk û yan jî em ê bibin tirkekurd. Çi ye! Tu dibî tirk, dev ji kurdîniya xwe berdidî, wek

gelek kesan, tu dibî tirkekî zelal û paqij. Wê çaxê jî ser seran û ser çavan. Û ez ê dîsan jî hirmeta te bigirim. Yan tu dimînî kurd û hebûna milletê xwe diparêzî, ziman û kultura wî diparêzî, eva ji bo te serbilindî, şeref û fexr e. Lê tu çima rêyek din derdixî ber xwe, tu dibî tirkekurd û di nav kurdîtî û tirkîtiyê de diçî û têyi! Çima tu ê temaşeyî elfabeya tirkî bikî û elfabeya xwe jî bikî wek ya wan! Gava ku miletek di bin destê miletekî din de be, divê hewl bide ku bi her tiştî xwe ji wî milletê serdest cida bike. Divê rabûn û rûniştina xwe, ziman, çand û kultura xwe biparêze. Baş e, gava tu wan neparêzî, sibehê ez ê çawan bikaribim ji te re bibêjim ku ka çi tiştê kurdan ji yê tirkan bi ferq e!

- *Belê ezbenî C. Bedirxan bi xwe dixwest ku elfabeya xwe nêzikî a tirkan bike.*

- Di destpêkê de wî camêrî hizir kir ku elfabeya xwe li gor elfabeya zimanên ewrûpî çêbike. Û wisan çêkir. Paşê mecbûr bû ku biguhirîne. Ji ber ku di sala 1928an de tirkan dev ji elfabeya erebî berdan û bi ya latînî nivîsandin. Vêca dît ku piraniya milletê wî di bin destê tirkan de ye; eger weha be, elfabeya wî dê li Tirkîyê bibe tiştêkî pir xerîb. Û ev dibe ku bibe sebebê ku kurd bi hêsanî nikaribin bi zimanê xwe bixwînin û binivîsin. Ji ber vê yekê dev ji (ş)ya ku bi du konsonantan dinivîsî berda. Herweha dev ji (ç)ya ku bi du konsonantan dinivîsî jî berda û hwd. Ew grafemên ku tirkan ji bo (ş)ya xwe danîbûn, wî jî qebûl kir. Ji ber ku qîmetek ne diguhart. Herweha (ç) jî.

- *Belê wek fonem (ç) û (ş)ya me jî ne wek a tirkan bû ma ne ji xwe.*

- Belê, dît ku ferqeke mezin nake, welê danî. Lê pir tiştên din parastin. Û (î) û (i) parastin. Kesên ku behsa rehmetî Mîr Celadet dikin û dibêjin;”ev her du tîp di xwandin û nivîsandinê de tevliheviyê derdixînin. Eger ew sax bûya, dê sedîsed ew biguhartana û bikirina wek yê tirkî ...” ji bîr dikin ku Mîr Celadet di sala 1951ê de û Mîr Kamûran Bedirxan jî di sala 1978an de çûn rehmetê. Van her du camêran jî pêşketina zimanê tirkî bi dirêjahiya jîna xwe de didîtin. Herweha herduyan baş bi tirkî jî dizanîbûn. Wan bi xwe çima guhartineke wilo li gor dilê hin began ne kirin? Yanî (i-î)ya kurdî ne kirin wek yê tirkan. Gerek mirov li ser bersiva vê pirsê raweste!

- *Gelo ne ji ber meseleyeke teknîkî bû ku wan camêran (i-î)ya xwe ne kirin wek a tirkan?*

- Na na, mesela teknîkê ne rast e. Di wan deman de Sûrî di bin destê Fransayê de bû. Fransiyayê li Şamê çapxane vekiribûn. Di wê çapxanê de mekineyên ku jê re dibêjin entertayp (makîneyên ku gule dihelîne û pê tîpan dinivîse) hebûn. Di wan entertaypan de (ç, ı) hebûn. Yê din jî hebûn. Eger bixwestana dikarîbûn ev her du tîp (i-î) bi awayê ku tirkî dinivîsînin binivîsandana. Belê nenivîsandin. Ne meseleyeke teknîkî bû. Û heçî pirs a din e, ku nizanim dê filan tîp di navbera filan û filan tîpan de winda bibe, xuya

neke û hwd... Hema bi kurtî, cihê pêkenînê ye.

- *Belê C. Bedirxan di vir de dibêje ku; " ... No, ji ber ko (i) bê niqte di nav herfên (u-n-m) û di pêş û paşê hin herfan de tevli wan dibe û ji wan derxistina wê dikeve dijiwariyê."*

- Ev tişt di destpêka salên 1930î de hatine gotin û nivîsîn. Wê çaxê zanista zimên ne wek îro pêşdeçûyî bû. Gelek tişt hatin guhartin. Hingê zanîna însanan di derheqa zimannasiyê de ne wek îro kûr bû. Îcar rehmetî jî wê çaxê wisan dîtiye, wisan hizir kiriye û nivîsiye. Nayê wê manê ku eva ha sedîsed tişteki zanistî û rast e. Gava mirov temaşeyî hin zimanên din dike, dibîne ku eynî ew tişt, di wan zimanan din de jî hene. Û yên wan tucarî di navbera du konsonantan de winda nebûne. Eger rehmetî gotibe jî, dîsa bi hirmeteke mezin û bêsinor xwe dixim bin pêyên wî, lê ez vî tiştî tişteki zanistî û rast nabînim. Eva ha ne argumentekî îlmî, rast û durust e. Eger wisan ba, wê çaxê jî diviya bû gelek miletan di elfabeya xwe de guharîn bikirana. Yanî divê em dev ji tirke-kurdiyê berdin, yan bibin xwemalî yan jî bibin dereke ango biyanî. Ji van herduyan divê em yekê ji xwe re hilbijêrin. Dev ji polemîkan, ku nexweşiyêke bêdawûderman e, berdin. Û bi baweriyaya min divê mirov li hin nimûneyên din jî temaşe bike û wan ji xwe re bike nimûneyêke baş.

*Mesele?*

- Mesele zimanê katelanî. Gelo tu dizanî bê ev feqîrên katelanî çendî hewl didin da ku zimanê xwe ji zimanê spanî biparêzin! Yanî niha gava em kurd zimanê xwe ji zimanê tirkan biparêzin, navê me dibe şovenîst û nîjatperest! Lê gava ku yekî bo nimûne katelanî vê yeka ha bike, em pesnên wan vedidin û jê re li çepikan dixin! Bala xwe bidêyê, bingeha zimanê sirbî û xirwatî yek e. Ji bo xatirê Xwedê, ka îro ferqa di navbera van her du zimanan de çi ye! Ji te dipîrsim?

- *Ez nizanîm.*

- Di navbera wan de ferqeke wek kurmanciya Ruha û Diyarbekirê heye. Dibe ku hîn jî piçûktir be, wek a Ruha û Siwêrekê be. Lê îro her du alî jî vê ferqa ha, perçeyek ji zanava ango huwiyeta xwe ya neteweyî dibîne. Bila ev ji me re bibe nimûne. Ez pir bi xurtî li dij nîjatperestiyê me. Û herwisane ez hej xelkê van dewletan jî dikim. Naxwazim ku kesek binê van gotinên min bikole. Lê ez dibêjim madem ku em ê kurd bimînin, tiştên me ên xweş hene divê em biparêzin. Hema eva ha jî (bilindek) yek ji wan tiştan e.

- *Yanî tu dibêjî ji C. Bedirxan ev tişt ji me re maye, û ji bo kurdan bûye wek tişteki milî gerek em pê nelîzin?*

- Ezbenî milîbûn, helbet camêr ji serî heta binî milî difikirî. Bi baweriyaya min wî pir bi xurtî pêyên xwe danîne erdê; di hin tiştan de îsrar kiriye û ne xwestiye ku kurdî wisan bibe tirkekurdî. Bala xwe bidêyê, eger wî gotin çêkiribin jî, pir

hindik tirkî fikir kiriye. Camêr bi tirkî baş dizanîbû. Çima bi tirkî fikir ne kiriye û gotinên kurdî li gor wê çênekirine. Bi zimanê hindo-ewropî fikir kiriye û paşê gotin çêkirine. Ji bo ku zimanê wî birîndar nebe, gotin li gor qalibên zimanê xwe danîne. Ez li vir dixwazim ji te re bîranîneke xwe vegêrim.

Sala 1972an bû, hinga ez li bajarê Berlînê bûm. Rehmetî Mîr Kamûran Bedirxan hate vî bajarî. Ez çûm balefirgehê pêrgîniya wî, min ew anî û li mêvanxaneyekê bi cîh kir. Di delîveyekê de me li ser vê meseleyê jî sohbet kir. Lê berî her tiştî dixwazim bibêjim ku di wê demê de zanîna min a zimên li gor îro tiştêkî din bû. Min ji rehmetî pirsî; "Ez benî berî niha bi çend salan li Tirkîyê hin tişt bi kurdî derketin." Bi kurtî, min gramera rehmetî Kemal Badilî, elfabeya mamoste M. E. Bozaslan û pirtûka rehmetî Dr. Şivan wek nimûne ji Mîr Kamûran re behs kir. Di bersiva xwe de wî weha got:

"Birazî, ev ne tiştêkî rast e. Min û birayê xwe me bi salan li ser van pirsan kar kiriye. Ez û xanima xwe pêkve, em 15, 16 zimanan dizanin. Gava em li ser pirseke kurdî dixebitin, em bala xwe didin van zimanên din jî. Li gor serbêjînga îro, em dikarin bibêjin ku ji me çêtir mirov nînin ku bikaribin li vê pirsê hûr bibin. Ez vê wek şaşiyekê mezin dibînim! Ew guhartin, ew şiklên nivîsînê, ew elfabeyên ku hatine danîn, ez tiştêkî rast nabînim. Çima em ê elfabeya xwe bikin wek ya tirkan?"

Vêca tiştên weha helbet, gotin bi gotin, pir zehmet e ku bête bîra mirovî. Lê ez dikarim sedîsed te piştrast bikim ku weha hate gotin. Gotinên rehmetî ji min re gelekî hêja bûn. Maneya wê ji bo min pir girîng bû!

- *Yanî tu dibêji Kamûran Bedirxan li dij rakirina kumikê bû?*

- Belê. Wî dixwast ku hin taybetmendiyan mîletê me jî hebin.

- *Birêz Reşo wek tê zanîn, vekîta her zimanî li ser bingehekî ilmî ava dibe. Belê ji ber ku elfabe ji xemla dengên pêktê, aliyê wê ên estetîk û pedagojîk girîng e! Tu li aliyekî hem hîç amanê nadî guherandina tîpeke elfabeya C. Bedirxan, li dij guherandina (i,i) ya kurdî di kovara Bergeh hejmara 8an rûpelê 81ê de dibêji:*

"Heta ku pîrsa Kurdistanê ya siyasî nehête çareser kirin, neteweyê Kurd nebe xwedî dewleteke serbixwe û gişt Kurdan di bin alaya xwe de kom neke, realîzebûna vê mebestê pir dijwar e. Di vê pirsê de, pîrsgirêkek ne bi tenê nîgarkirina foneman e. Lê pîrsgirêka herî aloz, helbijartin û li ser biryar dayîna elfabeyekê ye. Ango latînî yan erebî? Rewşa siyasî ya ku îro neteweyê Kurd tê de ye, jê re rewşa têtê dîtin, sê elfabeyên cihê cihê li wî mecbûr kirine; erebî, latînî û kîrîlîkî. Kurt û kurmancî; guhartina wê bi ser darê mala xwe bûna neteweyê Kurd ve girêdayî ye."

Û li aliyê din jî tu bi xwe li gor rêbaz û destûrên gramera C. Bedirxan nameşî. Di vî warî de tu hin pêşniyaran tîni û digel Enstîtuya Kurdî ya Parîsê



van pêşneyaran pêk tîni. Tu di derbarê zimên de di kovara Bergeh hejmara 4, 5 û 6an de "Reformek pêwîst e" dibêjî û tu reformê dikî. Mesele tu di derbarê hin lêkerên du perçe, di derbarê neyinî, di derbarê parkîtan, di derbarê dengdaran, di derbarê bêjeyên ku di kurdî de homograf in, di derbarê çi navdêr çi regndêr gir û hûrek nivîsandina navên netewî û hwd. de wek C. Bedirxan nafikirî û nanivîsinî. Bi dîtina min guherandinên ku di bendên jorîn de hatine kirin, hilweşandina gramera C. Bedirxan bi xwe ye.

Di rewşek wilo zîz û dijwar de, çendî îlmî dibe bila bibe, guherandina vekîta C. Bedirxan gelo wê wek çi fêdê bide me? Û ji bir neke ku te bi xwe, guherandineke wilo ancax bi otorîteya milletê kurd a siyasî dikare bibe, nivîsiye. Tu çima gramera C. Bedirxan diguherîni?

- Berî her tiştî dixwazim vê pirsra siyasî piçekî zelal bikim.

Bi baweriya min çawan ku pirsra kurdî pirseke siyasî ye û çareserkirina pirsra kurdî jî bi siyasî ve girêdayî ye. Ez mesela zimanê kurdî jî di eynî çarçoveyê de dibînim. Pirsra kurdî pirseke siyasî ye û helek siyasî jê re divê. Yanî kurd bibin xwedî dewlet. Bi çi şiklî dibe bila bibe, otonom dibe, federatîf dibe, konfederatîf dibe xem nake. Yanî kurd bikaribin xwe bi xwe îdare bikin û otorîteyê xwe a merkezî çebikin. Vêca em ê hemû silavê li wê otorîteyê bikin û têkevin bin emrê wê. Ew otorîte bila meseleya zimên hal bike. Wek ku tê gotin; "Bê lam û cîm" hertişt di bin emrê otorîteyê de bê kirin. Îcar gava ku otorîteyek wisan çêbû, ez bawer dikim ku ew otorîte dê ji mirovên zimannas grûbekê pêk bîne û bibêje; Kerem bikin, hûn li ser elfabeyê biryarê bidin. Bi elfabeya çîni hûn dixwazin? Baş e ser çawan. Elfabeya çîni li welatê me dibe elfabeyê mecbûrî, herkes pê dinivîsîne. Û paşê jî pirsgerêkên din ku bi zimên ve girêdayî ne. Çi aliyê gramerî çi aliyê vokabîlerî û gencîna peyvên ve be û hwd. ew grûb dê biryarê bide.

- Yanî tu dibêjî di roja îro de guherandina elfabê û çareserkirina temamê pirsgerêkên zimên bi otorîte siyasî ve girêdayî ye?

- Belê.

- Baş e tu çima vê guherandinê dikî?

- Bi awayê ku rehmetî Mîr C. Bedirxan nivîsîbû, demeke dûr û dirêj ewqas tişt derneketin. Lê piştî salên 70yî nivîsên kurdî piçekî bêtir bûn. Ji aliyêkî din de li Sovyeta berê, li hin deran, di hin dibistanan de zimanê kurdî dihate xwandin. Niha xweş nayê bîra min, lê ez bawer dikim ku dê di sala 1936an de be, li Rewanê kongreyê kurdnasan pêk hat. Di wê kongreyê de biryara ku dê devoka Rewanê bibe devoka edebî ya kurdan hat wergirtin. Bi baweriya min ew biryareke pir çewt bû. Ji ber ku rehên wê biryarê ne digiha dîroka milletê me. Devoka Cizîra Botan bîngehek bû ji bo kurmançiya me. Diviya bû wê kongreyê jî ew devok berdewam bikira. Belê ne kirin.

Vêca di wê reforma ku tu dibêjî de min behs kiriye. Min ew reform ne ji ber ku min xwe zana didît, ji ber hin pêwistiyên, tevlihevî pirtir nebin pêşniyar kiribû. A din; divê em ji bîr nekin, gava ku hin bingegehên nivîsînê hatibûn danîn, sal salên 30î bûn. Di wan çaxan de zanista zimên tiştêkî din bû. Tiştên ku rehmetî Bedirxan pêşniyar kiribûn, dibe ku di wan çaxan de tiştine maqûl bin. Lê bi wext re me dît ku hin tişt hin probleman derdixînin. Mesele tiştin jê bi temamî li dij zanista zimên in. Wek nimûne; dubarekirina dengdaran. (Serast-serrast). Gava em vê gotinê analîz dikin, em dibînin ku gotina serrast ji du gotinan pêk hatiye. Yanî (ser-rast). Îcar gava ku mirov van her du gotinan li hev siwar dike, li gor zanista zimên nabe ku yek ji van gotinan tiştêkî xwe winda bike. Çimkî mane tê guhartin. Gava min (serast) xwand, (se) di kurmancî de yanî kûçik/kûfî, rast jî, li vir ango durist. Lê kurmanc nabêjin (serast), (serrast) dibêjin. Îcar tiştê ku rehmetî Mîr C. Bedirxan gotiye tiştêkî din e:

Şede, yanî şidandina tîpên di gotinekê de. Şede di zaravayê kurmancî de tune. Rast e, tune. Ev ji bo zimanê erebî ye. Di erebî de mm, nn, ll, ss û hwd. tên ba hev. Gava ku kurd van dibêjin wek ereban naşidînin. Şidandin di zimanê erebî de taybetmendiyek e. Di zimên de tu mecbûrî rehên gotinê biparêzî. Eger tu gotinê wek heyî neparêzî, ji aliyê zimannasiyê de tu ê têkevi şaşiyeke mezin! Ji aliyê analîzê de tiştêkî pûç derdikeve. Min ev gotiye. Rehmetiyê Bedirxan di vî warî de şaşî kirine. Eynî tişt ji bo parkîta (xurt-xurtir) daye. (-Tir) pirtikeke ji bo danberheviyê ye. Dîsa eger ji gotinê fonemek biçê, gotin bê qîmet dibe. (Xurtir) nabe. Ji ber ku (xurt) û (ir) nîne. Ya rast ev e, (xurttir).

Ku em bîr ser pirsê neyînîyê:

Di vî warî de mantiqek, konsekvensek, di nivîsara rehmetî C. Bedirxan de nîne. Li kûderê bi hev re, li kûderê ne bi hev re nîne. Di nivîsandinê de ji bo hin deman ango tempûsan cida cida dinivîsîne. Lê ji bo hin deman jî bi hev re dinivîsîne. Ev ne tiştêkî mantiqî ye. Divê em nivîsandinê zelaltir bikin ku mantiqek tê de hebe. Yan bi hev re, yan ne bi hev re. Ez bi vê yekê re me. Di ya rehmetî Bedirxanan de kêmasiyeke mezin heye; mantiq nîne. Di fêrkirinê de pir zehmetiyê derdixîne. Mirovên ku nû dest bi xwandin û nivîsandinê dikin dibêjin; "Ev gotin li vir çima bi hev re ye û li vir çima ne bi hev re ye?" Bi rastî min tu bersiv nîne.

- Mesele?

- Mesela (ez nakim) bi hev re ye û (ez ne hatim) ne bi hev re ye û hwd, her du jî formên neyînîyê ango negasyonê ne, lê demên cida cida.

- *Îzaheta vê li ba C. Bedirxan heye. Di formê erîni ên lêkeran de gava pêşgira (di-bi) hebe, pêşgira negasyonê (ni-ne-na) cihê wan digire. Nimûne:*

Ez nakim - ez dikim, ez nizamim - ez dizanim, ez ê bixwim - ez ê nexwim û hwd. Îcar lêkerên erînî ên ku ne li gor qayideyên jorî nin negasyona wan cihê tê nivîsandin. Nimûne:

Ez hatim - ez ne hatim, min dît - min ne dît, ez çûm - ez ne çûm û hwd.

- Belê ev hemû jî (n-ni-ne-na-) ji rehekê diçin. Ji (ne)yê diçin. Ji bo vê yekê ferq di navbera (ne - na) de nîne. Her du jî ji bo neyinîkirinê ne.

- *Wilo ye ne wilo ye ew tişteki din e, belê di vî warî de li ba C. Bedirxan mantiqek heye. Û a din jî problema min ne ev e. Ez tişteki din dixwazim. Di meseleya nivîsandinê de qaos heye. Di vî warî de C. Bedirxan hin qûral danîne û em li gor qûralên wî nameşin. Ez wek yekî ji redaksiyonê nikarim bi nivîsa tu kesî bilîzim. Qaşo ez jî redaksiyonim. C. Bedirxan di nav kurdan de wek otorîte hatiye qebûl kirin. Hinekî jî divê ku mirov ji aliyê siyasî û civakî de li meseleyê binere. Di reformên ku te pêşkêş kirine ez jî bi te re. Belê ezbenî kurd ne hazirên van reforman e. Gelo çend kurd wek otorîte te qebûl dikin? Ji destê vê tevliheviyê moralê xwendin û nivîsandin û xwepêşxistina zimên bi min re nema! Ez nema dizanim binivîsînim. Nivîsên min yek yekê nagire. Kekê min, ji bo selameta zimanê xwe divê em li C. Bedirxan vegerin.*

- Ezbenî berî her tiştî divê ez tişteki bibêjim. Dibe ku dilê gelek kesan pê biêşe. Ez dibînim, ew mirovên me yên ku bi kurdî dinivîsînin di gelean de bingeha xwandin û nivîsandina kurdî nîne. Mirovê ku mektûbekê dinivîsîne mixabin dibe nivîskar. Vêca mirovên weha, wek te jî got, tişteki şaş dinivîsînin û dibêjin, "Dest medin nivîsa min!" Bi ser de jî xwe zimanzan û kurdîzan dibînin. Bi rastî alozî û tevliheviyeke mezin heye!

- *Mesele di tewanga jimarnavan de yek 90-an, yek 90î, yek 90î, yek 90-î û hwd. dinivîsîne. Û C. Bedirxan jî îzaheta ku em ê bi vî awayî, (90î) binivîsînin kiriye. Gava tu ji wan re dibêji, "Tu çima wilo dinivîsîni?" Ew ji dibêje, "Tercîha min ev e!" Kuro tercîha te çawa ev e! Ma tu reyisê vî zimanî yî?...*

- Wek C. Bedirxan rast e. Tewanga 90î nêr e. Û divê pêve bê nivîsandin. Nabe ku tewang jê cida be yan jî ew bi apastrofê yan bi tişteki din bête veqetandin.

Tişteki din dixwazim bibêjim. Ez rexneya te ser serê xwe û ser çavên xwe qebûl dikim. Berî ku min ew nivîsara bi navê "Reformek pêwîst e" nivîsand, ez pir li ser fikirîm. Min li dor sê, çar mehan hizir kir ku gelo ez binivîsînim yan nenivîsînim? Lê belê min ji bo xwe wek mecbûriyetekê dît, ku ez binivîsînim. Dîtina min ew bû. Divê ew bend li ber me nebin ku em nikaribin dîtînen xwe bibêjin, awirên xwe bidin diyar kirin. Lê mixabin berî ku ez wan tiştan binivîsînim, kovar û rojnameyên kurdan bi awayê ku hîç eleqeya wan bi rehmetî Celadet Beg re tune be, dinivîsandin. Tu dixwazî ez nimûneyekê

bidim te?

- Na.

- Îcar gava ku şaş hate nivîsandin, ez mecbûriyeta ku rexneyê lê bigirim di xwe de dibînim.

- *Ez dixwazim vê gotinê ji devê te bibihîzim: Şêst û pênc sal e ku elfabe û gramera C. Bedirxan, çewt rast, di nav kurdan de hatiye qebûl kirin. Em divê li gor destûrên wî bimeşin. Tu çi dibêjî?*

- Ezbenî min di gramera wî de guhartin ne kiriye. Eger hûn nivîsarên min welê şirove bikin, hinga hûn bêbextiyeke mezin li min dikin. Bi a min ji gramera rehmetî C. Bedirxan baştirin gramere nîne. Û ez dikarim pir bi rehetî bibêjim, dê kêmcamêr derkevin ku bikaribin ji wê çêtir gramerekê binivîsin.

- *Belê tu bi xwe li gor gramera wî nanivîsinî.*

- Gramer tiştê e û rastnivîsin tiştêkî din e.

- *Na. Rastnivîsin beşekî gramere ye. Bi hev girêdayî ne.*

- Bi hev girêdayîbûn ne rast e, du tiştên cida cida ne.

- *Baş e ji aliyê rastnivîsinê de tu çima wek C. Bedirxan nanivîsinî?*

- Di rastnivîsinê de kêmasiyên rehmetî C. Bedirxan hene. Gava berê min got ku, di hin tiştan de mantiq nîne. Rehmetî giranî nedaye ser rastnivîsinê. Wî bêtir giranî daye ser gramere. Ji bo wê jî pêwîstî bi kemilandina rastnivîsinê heye.

- *Bêguman ziman karekî akademîk e, helbet em ê pê dakevin. Belê bêku em ji rastnivîsinê C. Bedirxan dûr bikevin. Rastnivîsin di vê rewşa îro de bûye pîvanek girîng. Û ev pîvan li ba C. Bedirxan heye.*

- Rehmetî C. Bedirxan ji bo gramere qayide danîne lê ji bo rastnivîsinê qayide û qanûn danenîne.

- *Danîne.*

- Na, dananîne. Dibe ku li gor te welê be. Axirê rê bide min da ez tiştêkî din jî bibêjim, yan na, dê kêmasî hebe. Ez gava ku li vê pirsê temaşe dikim, ez dinihêrim bê ka ji aliyê zanistî ve û ji aliyê pedagojîk ve çawan e. Bê ka zaravayên din bi çi awayî ne. Yanî zaravayê xwe çawan xistine rastnivîsinê. Ez dibînim hin tiştên ku di şerha rehmetî C. Bedirxan de hene, tiştine ne rast in...

- *Ezbenî kaset diqede û me dawî li gotina xwe nanî.*

- Dibe ku piştî bîst salên din yan jî sed salên din eva min rast derkeve. Di zimên de nabe perçeyên ku digihên hev, ango morfem, ji xwe fonemekê winda bikin...

- *Baş e gava di vî warî de semîner li darkevin tiştêkî çawa ye?*

- Baş e, lê me çend zimannas hene?

- *Ez ê jî dîsa bibêjim tevliheviyek mezin heye. Bi çî awayî dibe bila bibe divê ev tevlihevî rabe. Pîvanek lazim e. Û ev pîvan jî li ba C. Bedirxan heye. Em ê wek wî binivîsînîn ka heta bê çawa dibe.*

- Ser seran ser çavan. Bila em ê hemû wek wî binivîsînîn. Belê birayê min vê jî nakin. Xwezî bikirana. Tîştêkî zêde min ne gotiye. Tev de du, sê tişt in. Bila bê mînaqêşe kirin. Tu dikarî pir bi rehetî ji min re bibêjî ma tu kê yî! Ez pir razî me ku herkes ji (a)yê heta (z)yê wek wî binivîsîne û wek wî bibêje. Bila tu kes nebêje "bi Xwedê li ba me weha nayê gotin." Em ê, herkes, wek wî bibêjin û binivîsînîn. Mezinahiya C. Bedirxan yek jê di vir de bû: Gava ku wî gramer nivîsand sedîsed neda ser rêya botiyan. Çima? Ji te dipirsim?

- *Kurdistanî difikirî.*

- Helbet! Mezinayî di vir de ye. Di gel ku devoka Cizîra Botan bîngeha klasîkên me bû, wî dît ku hin tiştên botiyan ji bo gramereke giştî giran e û li gor botiyan ne çû. Wî dît ku gotina; "Min pere hebe" ji gotina "Min pere hebîtin" xweştir û kurtir e. Wisan qebûl kir û danî. Îcar kê ji me camêran dikare vê camêriyê bike û dev ji devoka xwe berde! Ez ji te dipirsim kê dikare?

- *Pêşî tu giraniya xwe deyne. Yanî ji me re bibe mînak.*

- Evên ku kitêb nivîsandine, ez rica dikim ku gotina min bi şiklekî çewt neyê fêmkirin. Gava ez rûpelekî ji kitêba wan dixwînim, ez tê digihêmbê ji kûderê ye, ji kêjan heremê ye, ronakbîriya bi çî zimanî ye. Çima, ji ber ku bi îsrar e. Bi tenê li gor zimanê hewş û mala xwe diçe. Lê mirov zimên ne ji bo bi tenê hewş û mala xwe, lê belê ji bo miletekî dinivîsîne. Divê berî her tiştî em ji vê çarçoveya teng derkevin û bi kurdistanî hem lê binihêrin û hem jî binivîsîn. Ji aliyê gramerî de pirsên me yên pir mezin hene! Di radyo û televîzyon, rojname, kovar û hwd. de gramerê rezîl dikin. Îcar gava ji wan re; "Heyran hûn çima wilo dikin?" tê gotin, "Em li gor C. Bedirxan dikin!" dibêjin.

- *Tu dixwazî ji wan re çî bibêjî?*

- Ez hêvî dikim ku ew berî her tiştî Hawarê, Ronahî, Roja Nû, Stêr, Memê Alan û hwd. bixwînin. Hem jî çend caran. Gramera kurdiya kurmançî bixwînin, hînî qayide û qanûnên zimanê xwe bibin... Bi xwandina van berhemên ha ez bawer dikim ku dê ew kurdiya xwe serrast bikin.

- *Birêz Reşo, li himber asîmlasyonê tu dixwazî çî bibêjî?*

- Bi rastî li perçê welatê me yê herî mezin, kurdî di bin talûkeyeke mezin de ye! Asîmlasyonêke pir xurt û dualî heye! Ji aliyekî de dewlet bi awayekî sîstematîk û ji aliyekî de jî kurd bi xwe xwe asîmle dikin. Ev zimanê me yê delal pir bi xurtî dihele! Ew dayik û jinên me yên ku em bi kurdiya wan serbilind dibûn, niha zimanê wan yan têk çûye, yan jî têk diçe! Her kurd li hember vê

asîmlasyonê gerek şîpya bisekine. Her kurd berê divê zimanê xwe baş hîn bibe...

- *Birêz Reşo, ji bo vê hevpeyvînê careke din sipas dikim. Dibe ku min hinekî tu aciz kiribe, bibexişîne.*

- Ez jî sipas dikim. Bawer bike ez bi vê hevpeyvînê kêfxweş bûm

## Bi Mêhdî Zana re

- *Birêz Mêhdî Zana, ji bo zelalkirina hin tiştan dixwazim çend pirsan ji te bikim.*

- Kerem bike.

- *Bi qasî ku ez dizanim tarîxa tekoşîna welatperweriya te ji sala 1960î û vir de destpê dike. Ma rast e?*

- Ez di sala 1963an de beşdarî nav refê azadîxwazên kurd bûm.

- *Di wan deman de em dibînin ku welatperwerên wek M. Anter, Edîb Karahan û hwd. ne bi awayê elfabeya C. Bedirxan dinivîsînin.*

*Gelo hayê we ji elfabeya wî tune bû?*

- Di destpêkê de belkî hayê min ji elfabeya wî bûbe û dûra min ji bîr kiribe. Belê ez baş zanim ku min, gramera Kemal Badilî di sala 1965an de xwend. Dîsa di vê salê de min dîwaneya Cegerxwîn Sewra Azadî xwend.

- *Di rojnameya Dicle-Firat hejmara heyştan de, em elfabeya C. Bedirxan dibînin. Ji bilî vê hin tekstên kurdî jî hene. Rojname dide dest ku hayê we hemîyan ji elfabeya C. Bedirxan bûye. Digel vê awayî hûn dîsa jî li gor elfabeya wî nanivîsînin. Yanî hûn ji nivîsandina kumik û niqtê direvin. Çima?*

- Çima çima. Erê, me çima bi kumik û niqtê nenivîsî ye? Tu wisa dibêjî ha?

Ezbenî, berî her tiştî gerek em zanibin ku di her demê de hin şert û xisûsiyetên xwe ên taybetî hene. Dema ku me li demê wisa nerî, ez bawer dikim ku em ê bêteqûreq li hev bikin.

Di wan deman de jî mîna îro, dewleta tirk tişteki kur dan qebûl ne dikir. Miletê kurd "mehellîtirk" zimanê wî jî "mehellîturkçe," didît. Yanî ne difikirîn ku wê mirov çawa karibe deh milyon kurd têxe mehelêkê û ji zimanê wan re "mehellîdîl-mehellîturkçe," bibêje!

Ez bawer dikim ku hûn evên îro du tiştan tevlihev dikin. Gava me bi kurdî dinivîsand, armanca me, ji bo ku em hem kurdayetiya xwe bi zimên ji dewleta tirk re îspat bikin û hem jî xortên xwendevan bi rehetî karibin nivîsên kurdî

bixwînin. Kes li ser mesela ku C. Bedirxan wisa an wisa nivîsiye ne difikirî.

- *Ma tu dixawzî li ser elfabeya C. Bedirxan tişteki bibêjî?*

- Wek ku em hemû dizanin elfabeya C. Bedirxan bi latînî ye. Bi qasî ku alimên zimên dibêjin, zaravên kurdî bi ser elfabeya latînî ve diçin. Û eger neçe jî em ê dîsa bi a latînî binivîsîn.

- *Çima erebî nabe qey?*

- Na. Nivîsa latînî hem sivik û hem jî ji sê pişkên kurdan du pişk bi vê elfabê dinivîsîn. Yanî kurmanc û zaza. Îro elfabeya latînî li temamê dinyayê derbas dibe. Elfabeya erebî bi me û ereban dimîne, em ê çî bikin jê heyran. Dixwazim dawiya bersiva pirsra te wisa bînim:

Di vê rewşa ku berê her yekî ji me li derekê ye gerek em bi elfabeya C. Bedirxan nelîzin. Herçi elfabe ye tişteki milletî ye. Belkî hin kêmaniyên vê elfabeyê hebin. Mirov ji niha de ew kêmanî rakiribana baş dibû. Belê çavê min ka ew tifaqî!

- *Tu bawer dikî ku di dema îro de kurdistanîyên bakur wê bikaribin li hev rûnên û meseleya "bi kumik" û "ne kumik" di nav xwe de safî bikin?*

- Xwezîka te ev pirs ji min ne kiriba!

- *Çima?*

- Ma çawa ne çima! Heta roja îro çî hatibe serê me, hemû ji destê bêtifaqîya me ye! Eger tifaqiyek me bûbaya, ji zû de em ê jî di nav milletên dinyayê de bihatana qanê û wê problema me a elfabeyê jî tune bûya!

- *Tu wek nivîskar, di nivîsandin û xwendina bi awayê kumik û bêkumik de çî zehmetiyan dibînî?*

- Bi rastî tişteki ne xweş e.

- *Çima ne xweş e?*

- Mesele gava ku ez nivîseke bi kumik dixwînim û hema pey re nivîsa bêkumik dixwînim, ez hinekî li binguhê hev dikevim. Heta ku ez xwe ji tesîra nivîsa bi kumik derdixînim û xwe li gor a bêkumik eyar dikim, zeman digire. Ez bawer dikim ku ev yeka ha bêtir wê li ser zarokan tesîr bike. Te di vê hêlê de bi tu psîkologan re peyivîn kiriye?

- Na.

- *Divê tu ji wan jî bipirsî çavê min. Îcar heyran, em mecbûr in ku em hemû wek hev binivîsîn. Çimkî em miletek in. Ya em ê hemû pev re şekalê berevajî ya jî rast têxin lingên xwe. Xelkê me ê kurmanc û zaza yek millet e. Kurmanc û kurmanc, zaza û zaza û kurmanc û zaza hemû divê bi elfabeyekê binivîsîn. Ma tu dixwazî ez hîn jî dirêj bikim?*

- Ez bawer dikim wê bes be.

- Baş e.

- *Gelo dewleta tirk çima ewqasî ji zimanê kurdî aciz e?*

- Tirk ji me bi aqiltir bûn, îro jî ji me bi aqiltir in. Dewleta tirk baş zane ku, berebere miletek bi zimanê xwe heye. Eger heta îro kurdên Anadolê li ser pêyan mabin ev hemû bi xêra zimên e. Eger kurd bi milletî li ser pêyan mabin ev hemû dîsa bixêra zimên e. Ji Atatirk û vir de dewleta tirk pir bi dijwarî li ser zimanê kurdî rawestiya. Ji bo ku vî zimanî ji holê rake hertişt kir. Bi rastî gelekî jî bi serket. Gelek zanayên milletê me bi tirkî xwend û nivîsand û zimanê xwe ji bîr kirin. Partiyên me bi giştî dev ji zimanê xwe berdan û bi tirkî siyaset gerandin. Bi tirkî kovar, rojname û kitêb nivîsandin. Me kurdan gotinek heye dibêjin: "Tiştê mayî ji ê çûyî çêtir e" Her kurd ji niha û pê de gerek karibe bi kurdî bixwîne û binivîsîne; bi kurdî rojname û kovaran biweşîne û kitêban biafirîne.

- *Belê ezbenî te jî çar kitêb bi tirkî nivîsandin?*

- Rast e. Min çar kitêb bi tirkî û yek jî bi kurdî nivîsandiyê. Tu çima ên bi tirkî dibêjî belê a bi kurdî nabêjî?

- *Bibexişîne ez pê ne hisiya bûm.*

- Kitêbên min ên bi zimanê tirkî dîrokî ne. Ji bo ku hem milletê kurd û hem jî ê tirk problema kurd fêm bike, min bi tirkî nivîsand.

- *Ma tu hîn jî dinivîsîn?*

- Ez dinivîsînim belê ne bi tirkî, bi kurdî. Îro di dest min de çar kitêb hene, her çar jî bi kurdî ne.

- *Ji bo elfabe û gramereke yekgirtî pêşniyarên te çi ne?*

- Çavê min li ser vê meselê pêşî divê ku serok û rêberên kurd li hev rûnên, li hev bikin û dûra jî meselê teslîmî wan kesên ku alimên zimên in bikin. Hem problemên me ên milî ne tenê elfabe û gramere. Wekî din jî gelek problemên me ên milî hene, li ser van meselan jî gerek ev însanan li hev rûnên...

- *Birêz Mêhdî di dawîya vê hevpeyvînê de tu dixwazî çi bibêjî?*

- Hêviya min ku komeleya we van xebatên xwe ên hêja bidomîne. Xebata we perçekî tekoşîna milletê kurd e.

- *Wilo ye?*

- Ez wilo dibînim hevalo, kî ji xwe re çi dibêje bila bibêje...

- *Xalê Mêhdî ji bo vê hevpeyvînê dîsa spas dikim.*

- Bi rastî ez kêvxeş bûm ku min bi hevalekî xwe î hepsê re hevpeyvînek wisa xweş kir. Ez jî spasî te dikim û serkevtinê dixwazim.



# Bi Malmîsanij re

- Birêz Malmîsanij, *wek tê zanîn beşekî kurd van her du tîpên (i-î) elfabeya C. Bedirxan bi awayê (ı - i) lêdikin. Bi kurtî, li ser vê neyekitiyê dîtina te çî ye?*

- Ez ji vana bi "Î" û "İ"-dinivîsim. Heke ez bi kurtî bibêjim sebebên wê ev in:

Wekî ku tu jî dizanî piraniya nivîskarên kurd -ên ku bi elfabeya kurdî ya bi herfên latînî dinivîsin- bi "Î" û "İ" dinivîse/dinivîsin. Herweha di piraniya weşanên kurdî yên Kurdistana Bakur û yên kurdên bindestên Sûriyeyê de, di weşanên hemî enstîtuyên kurdî de bi vî hawî tê nivîsîn. Min bi xwe jî berê bi "I" û "İ" dinivîsand lê ji ber ku ez dixwazim ku di vî warî de yekîti hebe, min baştir dît ku ez jî wek piraniyê binivîsim.

Kesên ku îro bi "I" û "İ" dinivîsin, dibêjin ji ber ku îro li Kurdistana Bakur û li Tirkîyê kurd bi awakî mecbûrî tirkî dixwînin, "I" û "İ" ji wan re ji "I" û "İ" hêsantir in. Ev rast e lê digel vê rastiyê rastiyeke din jî heye: Her ji ber wê/wî sebebê/sebebî ji kurdên Kurdistana Bakur re herfên "Û", "U", "Ğ" ji herfên "U", "Ü", "X" hêsantir in. Yanî ji wan re hêsantir e ku di ciyê "axa, xerîb, xezal, xurbet, kuçe, rût, rûn" de "ağa, ğerib, ğezal, ğürbet, küçe, rut, run" bê nivîsîn.

Bi mîlyonan kurd li Tirkîyê û li Kurdistana Bakur piştî pênc salan (piştî "ilkokul"ê) xwendina xwe didomînin/didomîne. Ewên ku piştî pênc salan xwendina xwe didomînin zimanekî ewropî (îngilizî, frensî yan jî almanî) jî dixwînin. Wê gavê ew herfên Q û X jî nas dikin. Em bibêjin heke frensî bixwînin van her du herfan wek "ku" û "îks" telaffuz dikin. Yanî yekî wisa heke herfên kurdî nizanibe dê kelîmeyên "xêr" û "text" wek "ksêr" û "tekst" bixwîne. Wê gavê wê "textê padîşah" (bi tirkî "padîşahın tahtı") bibe "tekstê padîşah" (padîşahın metni).

Heke pîvan (krîter) tenê hêsanbûn be rewş ev e. Heke tu tenê hêsanbûnê wek krîter qebûl bikî, divê tu ciyê herfên "I", "İ", "U", "Ü", "X" (yên elfabeya Celadet Bedirxan) de "I", "İ", "Û", "U", "Ğ" (yên elfabeya tirkî) bigrî. (Herfa "X" ya ku ez li vir behs dikim, ew herf e ku Celadet Bedirxan carna di nuqte danîne ser.)

Gava meriv vê rastiyê dibêje, hin kesên ku naxwazin rastgo bin xwe dispêrin nîsbeta hindikbûna "U", "Ü", "X" û dibêjin nîsbeta van herfan hindik e, ya "I" û "İ" zêde ye. Gava meriv ji wan dipirse "Ma heke nîsbeta 'herfên hêsan' hindik be divê tu di ciyê wan de 'herfên nehêsan' qebûl bikî? Çima tu ne li ser gotina xwe yî? Dixwaze nîsbet hindik be dixwaze zêde be,

hêsan hêsan gotî ye. Fermo, hemî hêsanan qebûl bike, bi wan binivîse.” Bersîva van pirsan li ba wan tune.

Bi kurtî, ez bi xwe ne bawer im ku di şertên îro de kurd li ser van herfên dawîn (yanî I, Î, Ü, U, Ğ) li hev bikin û dev ji herfên din (Î, Î, U, Û, X) berdin.

Xwendevanê/a ku nû dest bi xwendina kurdî dike gava ku di hin weşanan de ”I-Î”, di hin weşanan de ”Î-Î” dibînê, prosesa hînbûna wî/wê zehmettir dibe. Loma ez yekîtiyek li ser ”herfên nehêsan”, ji rewşa îro, yanî bi du hawî (li alîyek I-Î, alîyek jî Î-Î) nivîsandinê baştir dibînim.

Bi a min, heke Celadet Bedirxan di destpêkê de di cihê herfên ”Î, Î, U, Û, X” de ”I, Î, Ü, U, Ğ” qebûlbikira/bikirana ji kurdên Kurdistanê Bakur re hêsantir dibû lê wî wisa nekiriye û îro êdî dereng e. Ez dibêjim dereng e, ji ber ku otoriteyê -çi siyasî-çi nesiyasî- hevbeş a kurdan îro tune. Madem piraniya mezin îro wek Celadet Bedirxan dinivîse, bi a min baştir e ku meriv mil bidê da ku ev piranî bigihîje dereca yekîtiya alfabe-yê. Yan na, dê ew tevlihevî dewam bike. Divê meriv ji bîr neke ku mesela elfabe-yê timî ne tenê mesela hêsanbûnê ye, faktorên din jî hene. Ma herfên elfabe-ya erebî, ermenî, îbranî, guncî hemî hêsan in? Na.

## Bi Remzî Kerîm re

- *Birêz Remzî, di nav kurdan de li ser kumika ku C. Bedirxan di elfabe-ya xwe de bi kar aniyê devjenkek pêti daye. Hin jê vê kumikê wek problemeke cidî dibînin. Di vî warî de tu dikarî çi ji me re bibêjî?*

- Minaqêşeya vê pirsê bi kurdên Tirkîyê ve sînorkirî ye. Kurdên Îraqê, Sûrî û Îranê yên ku hînî elfabe-ya latînî a kurdî bûne û bi vê elfabe-yê wek her kurdekî Tirkîyê dikarin bixwînin û binivîsînin qala problemeke wiha nakin. Li gor bawerîya min ev minaqêşe bi kurdên bi tirkî elfabetîze bûnê ve girêdayî ye. C. Bedirxan bi xwe bi detay li ser dengên kurmançî û herfên elfabe-ya xwe sekinî ye. Bingehên ku wî ji elfabe-ya xwe re danîne heşkere ne. Gava ew minaqêşeya (i-î)yên elfabe-ya xwe dike dibêje bi zanîn ew ji elfabe-ya tirkî bi dûr ketiye. Argumenta wî ya herî bingehîn ji bo vê dûrketinê denganiya kurmançî ye. An ku dengê (i)ya kurdî dengêkî yekcar cihê ye ji (î)ya tirkî. Fonksiyona bilindekê ew e ku dengêkî ku Celadetî jê re herfek peyda kiriye, dike dengêkî din. Tevî ku wî navê wê îşaretê kiriye bilindek lê bi ya min fonksiyona esasî ya bilindekê ne bilindkirina dengêkî ye. Di elfabe-ya kurmançî de fonksiyona niqteya li bin (ç)yê li bin (ş)yê çi be bi giştî fonksiyona bilindekê jî ew e. Ji xwe li gor wî di kurmançî de dengdêreke kin tucarî dirêj nabe. Û ya

dirêj jî kin nabe.

Bêguman ez kurdên ku alîgirên guhertina elfabeyê ne bi xizmetkariya asimlasyonê gunehkar nakim. Lê temaşeyî çend flmên kurdî bikin yan kurdên ku ji Kurdistana Tirkîyê dema teksteke bi kurmançî dixwînin baş guh bidinê. Dengê (i)ya kurmançî wek (ı)ya bi tirkî bi lêv dikin. Ev yek dikare bibe sedema xerabkirina dengê ji dengên kurmançiyê.

- *Birêz Remzî yanî tu dibêjî ku gava kurdên Kurdistana Tirkîyê (i-î)ya kurdî wek (ı-i)ya tirkî bi karbînin, di vir de wê hin dengên kurdî xerab bibin?*

- Erê ew tehlîke heye.

- *Belê ezbenî ew kesên ku tu dibêjî ew bi xwe asîmle bûne. Kurdekî ku asîmle ne bûbe, wî dengê ku tu dibêjî wê bi dengê xwe ê kurdî bibêje.*

- Argumenta herî maqûl ya kurdên alîgirên guherandina elfabeyê, rakirina kumikê ew e ku wê ji kurdên Tirkîyê re fêrbûna xwendin û nivîsandinê rehetir bike. Dikare wiha be. Lê divê em ji bîr nekin ku elfabeya kurdî ya latînî ji bo kurdan û li gor dengên kurmançî hatiye amadekirin. Ne ji bo kurdên ku bi kurdî nizanin lê bi tirkî elfabetîze bûne. Eger hat û kurdan li Tirkîyê mafê xwendina zimanê xwe bi dest xist yan perçeyekî Kurdistanê kete bin destê kurdan, ma em ê çawa bikin? Ma ne zimanê pêşî wê kurdî be? Ma em ê pêşî zimanê tirkî fêrî zarokan bikin û paşê jî yê kurdî? C. Bedirxanî ne gotiye ez vê elfabeyê ji bo qonaxekê çêdikim. Û ne jî gotiye ev elfabe ji bo kurdên ku bi kurdî nizanin, lê ji bo kurdên ku bi tirkî dizanin û divê berî ku hînî elfabeya min bibin divê fêrî elfabeya tirkî bibin. Ya din, bi ya min kumik ne asteng e li pêş fêrbûna elfabeya kurdî ya latînî. Tecrûbeya kurdên Sûrî, Îraq û Îranê vê yekê baş xuya dike. Di dawiya vê pirsê de dixwazim bibêjim ku ez nizanîm eger C. Bedirxan ji gora xwe rabûya wê elfabeya xwe biguherta yan na. Lê ez texmîn dikim wê pir li ber wê yekê biketaya ku piştî 60-65 salan hêjî hin kurdan gotinên wî fam ne kirine.

- *Baş e dixwazim di derbarê gramera kurmançî de bipirsim. Bi ya te di vî warî de tevliheviya herî mezin çi ye?*

- Di warê gramera kurmançî de di kurmançiya nivîskî de bi ya min tevliheviya herî mezin di warê tewang û pirjimariyê de ye.

- *Tu dikarî çend nimûneyan bidî?*

- Celadet Bedirxanî gotiye "Zimanê kurdî zimanekî tewangbar e" Bi ya min ev gotin stûna herî bingehîn ya kurmançî zelal dike. Ez ê bi du nimûneyên basît vê yekê şîrûve bikim:

Min te dît - Min sêvan xwar

Mixabin çewtiyên bi vî awayî di kurmançiya nivîskî ya îro de pir in. Û sed mixabin heta îro jî li ser vê çewtiyê qasî ku pêwîste ne hatiye peyvîn. Di

kurmancî de navdêr di komekê de li gor wezîfeya ku hildane ser xwe, tên tewandin, yan xweser dimînin.

Navdêr, di hemû demên lêkerên întanstîv de xweser in û tucaran nayên tewandin. Lê di demê niha û paşerojê yê lêkerên transtîv de navdêr ku subjekt be xweser e û navdêr ku objekt be, tê tewandin. Nimûne:

Leyla xwarinê dixwe - Leyla wê xwarinê bixwe

Lê berevajîya vê di hemû demên bihurî yê lêkerên transtîv de navdêra subjekt tê tewandin, navdêra objekt xweser dimîne.

Leylayê xwrin xwar -Leyla xwarin xwariye - Leylayê xwarin xwari bû û hwd.

Ev qeyde ji bo tewanga pronavan jî her wiha ye.

Ez Leylayê dibînim - Ez ê Leylayê bibînim - Min Leyla dît

Eger em navdêra "Leyla" rakin û şûna wê pronavê deynin, wê wiha be:

Ez wê dibînim - Ez ê wê bibînim - Min ew dît

An ku nabe bê gotin:

Min Leylayê dît - Min wê dît

Ji bilî çewtiya tewangê di warê pirjimariyê de jî qeyde tên serûbin kirin. Di komekên jêrîn de Yekjimarî û prejmariya navdêran yan bi pirtika tewangê yan jî di dawîya lêkeran de xuya dibe.

Ez sêvê dixwim (yekjimar), ez sêvan dixwim (pirjimar), min sêv xwar (yekjimar), min sêv xwarin (pirjimar)

Bi kurtî be jî û bê detay be jî min xwest li gor xwe di warê gramerê de di kurmanciya nivîskî de çewtiya herî mezin xuya bikim. Li gor qeydeyên li jor komekên:

Min wê dît - Min sêvê xwar - Min wan dît - Min sêvan xwar çewt in.

*-Ji bo pêşketina zimanekî bi rêkûpêk, di roja îro de çi divê mirov bike?*

- Berî her tiştî divê rêxistinên siyasî û dezgehên din yê kurdî di warê parastin û pêşxistina kurmancî de xwedî programên konkret bin û di pratîkê de ji niha dest bi cihanîna programa xwe bikin.

Divê gramera tekûz ya hemû aliyên zimanê kurdî dide ber xwe bê nivîsandin.

Divê ferhenga vî zimanî derkeve.

Divê dezgehên wergerandinê ji gelek zimanan bo kurdî bîn avakirin.

*- Ji bo vê hevpeyvînê careke din spas dikim.*

- Ez jî spas dikim.

# Bi Dr. Celadet Çelîker re

- Birêz Celadet Çelîker di sala 1996an de bi navê "Çend Pirsên Alfabe ya Kurdî" kitêbek te der çû. Di vê kitêbê de bi dûr û drêj tu li ser elfabe ya Mîr Celadet, û bi giştî jî li ser (i-î)ya kurdî rawestiyayî. Tu guhertinê di van her du tîpan de dixwazî. Ji ber çî sebebên bû ku te kitêbek wilo nivîsand?

- Gava ez derketim derveyî welêt min dît ku di warê elfabeyê de di nav kurdan de tevliheviyek heye. Di salên 70î de hem wek xwendevan hem jî wek destpêka nivîsandina kurdî be jî hayê min ji kitêb, weşan û hwd. ên wê demê hebû. Tevliheviya di nav kurdan de li ser du herfên elfabe ya C. Bedirxan delîl û argumentên ji bo parastina bi kumik û niqtê dihatin pêş, ji bo min wek tiştên mantiqî û îlmî ne duxuyan. Ew kesên ku ew her du tîp diparastin bi îthamên gelekî giran êrîşî kurdên din dikirin. Loma jî min xwest ez gav bi gav bi dû mantiq û awayên wê ên di danina elfabe ya Hawarê de, kevîm û bikolim. Herwisa di vê xebatê de min xwest ez dîroka elfabe ya latînî a kurdî li her çar aliyên kurdistanê piçekî vedim.

- Em dibînin ku elfabe ya C. Bedirxan di şertên pîr dijwar de, li mahciriye çêbû ye. Gelo elfabe ya wî ji kêjan demê de li Kurdistana mezin hatiye bi kar anîn?

- Bêşik diyar e ku pîrsa bi karanîna elfabe ya kurdî li bakurê welêt, bi pîrsa siyasî a kurd ve girêdayî ye. Ji salên 1930î, 40î û heta 50î dewleta Tirk tu mecal ne daye kurdan ji bo ku kurd karibin bi elfabe ya xwe tişteki binvîsin. Wê demê jî, îro jî, siyaseta dewleta Tirk ji binî de li ser înkarkirin û tune kirina ziman û milletê kurd ava bûye. Bi qasî ku ez pê dizanim li bakurê welêt cara pêşî di sala 1958an de di kovara "Îlerî Yurt" de, bi elfabe ya latînî-tirkî hin tiştên kurdî der çûn. Di sala 1963an de di kovara Dicle-Firat de elfabe ya Hawarê hatiye çapkirin. Kemal Badilli di sala 1965an de di kitêba xwe a li ser rêzimana zaravayê kurmançî, elfabe ya Mîr Celadet bi kar tîne, lê niqta li ser herfa (i)ye a Hawarê radike û wê wek (i) datîne. Ev yek di elfabe ya M. Emîn Bozarslan a ji sala 1968an de jî bi vî awayî ye (i-î). Di salên 1970an de di kovar û kitêbên ku li welêt derketine de, hema hema bi tevayî ji dêlva herfên Hawarê(i-î)ye bîniqte û bêkumik hatin bi kar anîn. Wek nimûne, kovarên Riya Azadî, Rizgarî, Roja Welat û Tîrêj; kitêbên Zimanê Kurdî (Dr Şivan û K. Bedirxan), Memê Alan, Turkçe izahli Kurtçe Gramer (Dr. Kamuran Ali Bedirxan) û hwd.

Wek ku dixuye, hê di destpêka salên 1960î de hayê kurdan ji elfabe ya Hawarê heye. Lêbelê wan ev elfabe ya ku sîh sal berê li derveyî welêt hatibû damezrandin, di jiyane de ceribandine û bêyî ku munaqeseyekê li ser bikin,

bi karanîna bêkumik û bêniqte ji bona hinbûn, xwendin û nivîsandina kurdî ji xwe re qenctir û siviktir dîtine. Di nav wan salan de, ji bo tu kurdeki ne sergêjîyek, ne tevlîheviyek çêbûye û ne jî kesî daxwaza bi karanîna kumik û niqtê kiriye.

- *Digel ku ewên berê elfabeya Hawarê jî dibûn û nas kiribûn dîsa jî niqte û bilindek bi kar ne anîne û herwisa minaqeşe jî ne kirine.*

*Yanî tu dibêjî ku ev minaqeşeyên li ser niqtê û bilindekê dîsa li mihaciriyê, li derveyî welêt dest pê kiriye?*

- Belê rast e. Gotûbêjên di vê babetê de berhemên mahaciriyê ne. Ger 12ê îlona 1980î nebûya û kadroyên kurd ên ku li welêt bi kurdî dinivîsandin karîbûna ew karê xwe bidomandana, dê îro gotûbêjeke bi vî rengî di nav kurdan de tune bûya. Hemû kurdên li bakurê welêt dê bêniqte û bêkumik nivîsên xwe biweşandina.

Piştî derbeya eskerî a 12ê îlonê, piraniya kurdên ku bi nivîsandina kurdî mijûl dibûn ji neçarî derketin derveyî welêt. Hin kurdên ku ji mêj ve li welatên Ewrûpa diman û ji wan tecrûbên li welêt têr hayidar nebûn, kurdên nuhatî bi îthamên giran suçdar dikirin. Wan digot, ên ku kumik û niqtê radikin, ew "tovê wêrankirina zimanê kurdî direşînin." Heta nivê salên 1980î jî, piraniya nivîsên kurdî bêniqte û bêkumik hatin çapkirin.

Lê divê meriv li hemû kurdên li Ewrûpayê ne heqiyê meke. Hin ji wan hê di salên 1970î de bêniqte û bêkumik tişt weşandine. Wê ek nimûne, di sala 1975an de, li Belçîqayê di nav Weşanên Şivan de fer henga Joyce Blau bi bêkumik û bêniqte der çû...

- *Birêz Celadet êdî dixwazim gotinê serguherî meseleya bilindekê bikim.*

- Kêrem bike ser çavan.

- *Gelo mecbûriyeta ku Mîr Celadet Bedirxan bilindekê di elfabeya xwe de dixebitîne ji ku tê? Mîr Celadet çima kumikê di elfabeya xwe de bi kar tîne?*

- Berî ku ez te bibersivînim, dixwazim hinekî li ser şeş destûrên C. Bedirxan rawestim. Bi şirûvekirina her şeş destûrên wî, ez bawer dikim ku wê bersiva pirsra te pir zelal bê holê.

- *Ez ê wan her şeş destûrên ku tu dibêjî binivîsînim. Bibexişîne...*

- Baş e. Bi rastî Mîr Celadet di danîna elfabeya xwe de, yek bi yek li ser dengên kurdî û herfên miqabilî wan disekine. Ew li gora destûrên xwe 31 herfên elfabeya kurdî-latînî pêk tîne. Sedemê ku ew mecbûr dimîne kumikê bi kar tîne, ew bi xwe di hejmarên 10 û 11 ên Hawarê de îzah dike. Gava meriv ji nêzik de li nivîsa wî an jî li serwextkirina wî dinere dixuye ku Mîr Celadet berê ji bo dengê(i)ya kurdî herfa (i)yê digire nav elfabeya xwe û paşê jî ew radibe kumikekê datîne ser (i)ya adetî a latînî û wê li miqabilî dengê(i)ya kurdî

bi kar tîne. Li vir gelek tişt bala meriv dikşînin. Ew ji alîkî de di destûra xwe a yekê de dibêje, heta ku ji dest bê divê elfabeya wî nêzîkî a tirkî be. Lê di van her du herfan de, ew ji destûra xwe a yekem bi dûr ketiye. Ew bi xwe ji xwe dipirse û dibêje gelo me wek tirkan bikira dê çêtir nebûya? Bi xwe jî bersiva pirsê xwe dide û dibêje, na dê çêtir nebûya. Ji ber ku di nav wan salan de, yanî di navbera salên 1928-32an de, di nav tirkan de li ser herfa (i)yê sergêjeyiyek peyda bûbû. Mîr Celadet derheqê vê sergêjayiyê de wiha dibêje:

Gava herfa (i)ya bêniqte di nav hinek herfan de, wek herfên (u, n, m), tê nivîsandin ew wenda dibe û loma jî ji bo xwendevanan sergêjeyî çêdike. Ji bo çareserkirina vê tevliheviyê tirk rabûna hinek niçik anîne ser ew herfa pêş an jî paş herfa (i) yê. Ji ber vê yekê Mîr Celadet dibêje, tevî vê zanînê û tecrûbeya ku bi serê tirkan de hatiye, ne dibû ku me jî şaşiyêke bi vî awayî têxista nav elfabeya xwe. Piştî ku Mîr Celadet li himber dengê(i)ya kurdî herfa (i)ya adetî a elfabeya latînî neqand, îcar ew vedigere ji bo dengê(i)ya kurdî li herfekê digere. Ji ber ku wî herfa (i)ya adetî a latînî ji bo dengêkî din bi kar anîbû, di destê wî de tu herfeke din ne mabû. Li gora destûreke wî jî, diviya bû wî dîftong bi kar ne aniya. Ji neçarî ew radibe kumikekê tîne ser (i)ya adetî wê(i)yê li miqabilî dengê( i )ya kurdî bi kar tîne.

Mîr Celadet du xusûsiyêtên kumikê datîne. Yek, gava bilindek tê ser herfekê, dengê wê herfê diguhere, ji wê herfê herfeke din çêdike. Dudo, bilindek dengê herfê bilind dide xwendin. Mîr Celadet tenê ji bona dengê(i)ya kurdî bilindek bi kar ne aniye, herwisa bilindek aniye ser du herfên din jî: (ê) û (û). Gava meriv ji nêzîk de li van herfan dinere, diyar dibe ku ev her du herf bi guhertinên du herfên adetî ên elfabeya latînî, (e) û (u), bi dest ketine. Mîr Celadet rabûye berê van her du herfên adetî li miqabilî du dengên kurdî xistiye nav elfabeya xwe (e-u) û paşê jî ji bo du dengên kurdî ku li miqabilî wan di elfabeya latînî de tu herfên adetî tunebûn, bi guhertinên li ser van her du herfan, du herfên nû çêkirine. ( ê, û ): e => ê; u => û. Bi gotineke din, wî wek di elfabeyên miletên din de, di danîna elfabeya xwe de ew herfên latînî ên adetî ku miqabilî dengên kurdî ne girtine nav elfabeya xwe û ji ber ku li miqabilî dengên mayî di elfabeya latînî de tu herf tunebûn, rabûye li ser herfên adetî guhertin çêkiriye û ew li himber dengên mayî bi kar anîne.

Lêbelê Mîr Celadet di danîna du tîpan de, li eksê vî prênîsîbî çûye. Gava ku meriv ji nêzîk de li du herfên elfabeya wî ( i-î ) dinere, dixuye ku wî ew herfa adetî a ku di elfabeya latînî de heye (i) li miqabilî dengê a kurdî (i), bi kar ne aniye, lê rabûye li himber dengêkî kurdî ku li miqabilî wê di elfabeya latînî de tu herf tunenin, bi kar aniye, ango dengê (i)ya kurdî. Ev herfa latînî (i), hema hema di hemû elfabeyên ku ya latînî ji xwe re bingeh girtine de, miqabilî dengê( i ) yê ye. Wekî ku me li jor dît, wî pêş ew herfên adetî yên latînî (e- u) li miqabilî dengên wan ên kurdî bi kar anî û paşê ji wan li miqabilî dengên ku

di elfabeya latînî de ne hatine destnîşankirin herfin nû çêkirine ( ê- û ).

Gava Mîr Celadet ji bo dengê(i)ya kurdî (î-ya Hawarê) li herfekê digere, di destên wî de tu herfên latînî ên adetî namînin. Lewra wî ew herfa adetî ku miqabilî wî dengê kurdî ye ji bo dengêkî din bi kar anîbû. Loma jî ew neçar ma bi alîkariya kumikê herfeke nû çêkir: ( î ).

- *Baş e gelo çima Mîr Celadet, wek di dengên ( e, u ) de, berê ji bo dengê(i)ya kurdî herfa adetî a latînî danayine ?*

- Sedemê vê yekê ew e ku Mîr Celadet di danîna elfabeya xwe de li gor rêz û pergala elfabeya tirkî çûye. Wek ku tê zanîn, di elfabeya tirkî de herfa (i) beriya ( i ) tê. Gava Mîr Celadet wê tevlihevî û sergêjeyiya ku herfa (i)yê di nav tirkan de peyda kiriye dibîne, ew herfa adetî a latînî (i)yê ji dêlva herfa elfabeya tirkî (i)yê digire nav elfabeya xwe. Paşê gava dor tê ser peydakirina herfekê ji bo dengê(i)ya kurdî ji ber ku di destê wî de herfeke latînî ya adetî nema ye, ew mecbûr dibe bilindekekê bîne ser herfa (i)ya adetî, ku dibe (î). Bi dîtina min, li vir Mîr Celadet şaşî kiriye. Ger ew li gor rêz û pergala elfabeya latînî biçûya, dê ev şaşî derneketa holê. Herwekî di herfên (e-u) de, dê Mîr Celadet li miqabilî dengê(i)ya kurdî(i)ya adetî a latînî bi kar baniya. Sedemên vê şaşiyê ne taybentmendiyên denganiya zimanê kurdî ye, lê tevliheviya di nav tirkan de û rêz û pergala elfabeya tirkî ye.

Tevliheviya di nav tirkan de û rêz û pergala elfabeya tirkî bûye sebebê ku Mîr Celadet ji çend destûrên xwe bi dûr bikeve. Bi gotineke din, du dengên kurdî bi (i-î) destnîşankirin, ew mantiq û ahenga di navbera destûrên wî de hene, xerab kiriye.

- *Çawa yanî xerab kiriye?*

- Bi vê kirina xwe, wek ku ew bi xwe dibêje, ew ji elfabeya tirkî bi dûr dikeve (destûr 1). Di destûra duduyan de ew dibêje, heta ku ji dest bê, dê ew herfên latînî ên adetî bigire nav elfabeya xwe û wan neguhere. Bi vî awayî kurd û biyanî bi hêsanî karibin elfabeyên hev fêr bibin. Lêbelê ew herfa (i)ya latînî, li miqabilî dengê wê danayine, lê li miqabilî dengêkî ku di zimanên biyanîyan de tune datîne. Di destûra xwe a pêncan de ew dibêje, herçend heye, ji barkirina herfan bi nîşanên nû, xwe dûr kirin. Nîşan di nivîsandinê de wext bi meriv dide wendakirin û herwisa nivêse jî kirêt (qirêj) dikin. Lê wek ku dixuye, ew radibe herfa latînî a adetî (i)yê bi nîşaneke nû (^)bar dike.

Wek ku me berê jî got, Mîr Celadet ehemiyeteke gelek mezin daye nîsbetên dengên zimanê kurdî. Ewî her xwestiyê ku dengên bi nîsbetên bilind, bi herfên hêsan bêne destnîşankirin. Lêbelê gava di navbera nîsbetên dangan û destûrên wî de dubendî derketine, wî li qazanc û ziyanan neriye.

- *Wek nimûne?*

Wek nimûne gava ew li ser herfên (v) û (w) disekine, dibêje li gor nîsbetan,



nîsbeta dengê(w)ya kurdî (% 1,6) ji nîsbeta dengê(v)ya kurdî (% 1) zêdetir e. Loma jî diviya bû ku nivîsandina herfa li miqabilî dengê(w)yê, ji a li miqabilî dengê(v)yê hêsanîtir bûya. Dîsa ew didomîne û dibêje, herçend hêsanîyek dê çêbûbûya, lêbelê dê elfabeya me ji a latînî a adetî bi dûr biketa (destûr 2). Lewra di elfabeya latînî de, herfa (v)yê li miqabilî dengê(v)yê û ya (w)yê jî li miqabilî dengê(w)yê ye. Wek ku dixuye, Mîr Celadet ji bo qazancên piçûk ne xwestiye elfabeya latînî feda bike, ji bilî di pirsra ( i ) û ( î )yê de.

- Baş e, gava me ( î )ya kurdî wek a latînî nivîsand îcar em ê çawa bikin ji (i)ya kurdî?

- Dî vî warî de bi dîtina min a herî maqûl ew e, çawa ku beşekî kurdan jî bi kar tînin, ji dêlva (i)ya Hawarê em herfa (i)ya bêniqte, herwekî ku di elfabeya tirkî de jî heye, bi kar bînin. Kurdan ev herf li Kurdistanê ceribandine û tu tevlihevî bi tu kesî re çênebûye. 24 herfên elfabeya me û a tirkî mîna hev in. Bi vî guhertinê wê hejmara herfên wek hev, bibe 25.

- Erê di vir de ez bawer dikim ku tu tiştêkî ji bîr dikî. Mesela di xwe nêzîkirina elfabeya tirkî de Mîr Celadet di destûra xwe a yekê de tiştêkî din jî dibêje, ku ez ê ji te re bixwînim: "Ji wan niqtan pêve ko xasê denganiya zmanê kurdî ne, di şiklê û dengên herfan de, herçend heye, xwe li elfabeya tirkî nîzing xistin û jê ne dîrketin.

- Erê rast e, di danîna elfabeya xwe de Mîr Celadet taybetmendiyên denganiya zimanê kurdî dane ber çavên xwe. Gava ew sedemên danîna kumik û niqtê îzah dika û dibêje, çênedibû ku me ew tevliheviya ku di nav tirkî de rû da bû, bianiya tîxista nav elfabeya xwe (di nav herfên u, m, n de wendabûna herfa i-yê), paşê bi cumleyekê dibêje, denganiyên van du zmanan cihên e, isûlê dengdêrên kurdî bivê neyê ji isûlê tirkî dîr ketiye.

- Gelo ne ji ber ku dengên (i) û (î)yan kurdî û tirkî ji hev cihên e, loma Mîr Celadet kumik û niqtê bi kar tîne?

- Bi dîtina min, îzaheta Mîr Celadet a ku piştî pirsra ku ew ji xwe dika û dibêje, me jî wek tirkî bi (i) û (î) binivîsiya qe ne çêtir bû, îzaheta bingehî ye. Û ev îzah jî li ser wê tevliheviyê ye ku ji rûyê(i)ya bêniqte di nav tirkî de derketibû.

Eger Mîr Celadet pîvana duduyan esas bigirta û hemû dengên zimanê kurdî ên ku ji dengên zimanê tirkî cihên e, bi herfên ku ji elfabeya tirkî cida ne destnîşan bikira, diviya bû herfên elfabeya me (a) û (u) ji ên tirkî cihê bihatana nivîsandin. Lewra ferqa di navbera (i)ya tirkî û a kurdî çibe, ferqa di navbera (a)ya tirkî û a kurdî jî ew e. Mîr Celadet dibêje dengê (a) û ( i )ya kurdî ji ên tirkî drêjtir in. Baş e, eger sedemê esasî yê kumika li ser (î)yê taybetmendiya denganiya kurdî bûya, divê ji bo eynî taybetmendiya Mîr Celadet kumikek bianiya ser herfa (a)yê jî. Ji hêla din, herfa (u) di elfabeya me

û a tirkan de wek hev e. Lêbelê dengê(u)ya kurdî ji dengê a tirkî cihê ye. Di tarîfkirina dengê(u)ya kurdî de, Mîr Celadet dibêje ev deng, dengekî ku di navbera du dengên tirkî (u) û (ü) de ye û hîç di zimanekî ewrûpî de ev deng tune. Li vir jî em dibînin ku taybetmendiya denganiya kurdî ne bûye sedemê ji herfa elfabeya tirkî cida bûnê. Hin heval jî dibêjin, ji ber ku dengê (i) ya kurdî ji a tirkî drêjtir e, loma jî Mîr Celadet kumik anîye ser (i) ya adetî. Lewra kumik dangan bilind dide xwendin. Li vir divê bê gotin ku dirêjbûn an jî bilindiya dengê(i)yê, ne ji ber sedemê kumikê ye. Bilind tê xwedin ji ber ku ev deng di denganiya kurdî de bilind e. Loma jî kumik tune be jî, dîsa dê bilind bê xwendin. Herwekî ku di herfên (a) û (o)yên elfabeya kurdî de dixuye. Ji ber ku dengên (a) û (o)yên kurdî di denganiya zimanê kurdî de dirêj in, herfên miqabilî wan (a, o) bêkumik jî dirêj tên xwendin. Ger mexseda Mîr Celadet ji kumikê destnîşankirina dengdêrên dirêj bûya, diviya bû wî kumikek bianiya ser herfên (a) û (o)yê jî...

- Yanî tu dibêjî Mîr Celadet ji mecbûriyetekê kumik anîye ser (i) ya adetî. Sedemê vê mecbûriyetê jî, ji rêz û pergala elfabeya tirkî û ji wê tevliheviya ku di nav tirkan de hebû tê.

- Erê.

- Tirkên ku cîla kevn in, kumikê davêjin ser hin gotinên ku ji erebî û farisî ketiye zimanê wan. Wek nimûne, gotina "Madenî" Gelo ev ne ji ber destnîşankirina dengê dirêj e ku divê kumik bê ser? Bêkumik wê tirk çawa bikaribin wê lezeta ku "madenî" dirêj bixwînin, bistînin? Bi vê yeka ha kumik nabe tiştêkî îlmî gelo?

- Ev dîtin nêzîkî 15 sal berê di mînaqeseyên kumik û niqte de, ji bo parastina kumika li ser (î)yê hatibû pêş. Ez nîzanim gelo pê girtiyên vê dîtinê hê jî wê diparêzin an na.

Di vê dîtinê de hin tişt tevlihev kirin. Gava tirkan di sala 1928an de dest bi karanîna elfabeya latînî kirin, gelek gotinên ji zimanên erebî û farisî di tirkî-osmaniya wan a rojane de hebûn. Ev gotin li gor deng û qayideyên morfolojiya wan zimanan ketibûn zimanê tirkî-osmanî. Dengê (i) ya dirêj yek ji wan dangan bû. Problema tirkan ew bû ku wê ew çawa dengekî biyanî (i) ya dirêj ji dengê zimanê xwe dengê (i) ya tirkî cida bikin. Lewra dengê (i) ya tirkî kurtir e. Ji bo vê cidayiyê destnîşan bikin, tirkan kumikek anîn ser (i) ya adetî. Wan demekê kumikek anîn ser (a) ya drêj jî. Ji ber ku di denganiya tirkî de (i) yeke drêj tune, (î) ya bi kumik tucar wek herfekê ne ketiye elfabeya tirkî. Nexwe ji bo tirkan pirs, ji dengekî xwe cidakirina dengekî biyanî bû. Eger rojekê bi hin gotinên biyanî dengekî biyanî ku ji dengekî me kurtir an jî drêjtir be bikeve nav zimanê me, di wê rewşê de em ê ji bo ji dengê xwe cidakirinê li nîşanekê bigerin. Ji xwe îro di nav tirkan de bi karanîna kumikê ber bi wendabûnê ve diçe.

Ji aliyê din ve, di denganiya kurdî de du dengên (i)yê, ku yek kurt û a din jî drêj be, tune ne. Di tarîfkirina dengdêran de Mîr Celadet dibêje, dengdêrên kurdî an kurt an jî drêj in. Yên kurt dirêj nabin û yên dirêj jî kurt nabin. Gava di kurdî de (i)yeke kurt û yeke drêj tune be, wê çaxê pêwîstiyek ji bo kumikê tune ku dengê dirêj jî ê kurt cida bike...

- Doktor, kumik îlmî ye an na?...

- Baş e, kumik îlmî ye an na? Mîr Celadet du xisûsiyetên kumikê tîne: Kumik tê ser herfekê, wê diguhêze dike herfeke nû û herfa nû bilind dide xwendin. Di rewşeke din de, gava du dengên meriv hebin ku denganiya wan wek hev be, lê yek dirêj û ê din jî kurt be, ji bo ji hev cidakirina van her du dangan jî meriv dikare kumikekê bîne ser dengê dirêj. Çi di halê ku Mîr Celadet tarîf dike û çi jî di halê ji hev cidakirina du dangan de be, bi karanîna kumikê, bi dîtina tişteki îlmî ye. Gava meriv bi van pîvanan li herfên elfabeya me ên bi kumik dinere, di herfên (ê) û (û)yê de bi karanîna kumikê, kirineke îlmî dixuye. Lêbelê di herfa (î)yê de, ev her du pîvan jî li meydanê tunenin. Ji ber ku di elfabeya latîni de herfeke adetî li miqabilî vî dengê kurdî heye û loma jî pêwîstiyek ji bo çêkirina herfeke nû tune. A duduyan jî, di zimanê kurdî de tenê ( i )yeke (î-ya Hawarê) heye û ew jî drêj e. Ji ber ku (i)yeke kurt tune, hewcedariyek bi kumikê tune ku (i)ya kurdî ji (i)yeke din cihê bike...

- *Baş e, li gor hin dîtinan gerek elfabeya me dûrî a tirkan be. Xwediyê van dîtinan hin argumentan tînin. Mesele li ser pîrsa (i) û (î) pîr disekin. Tu jî bi awayekî din li ser vê pîrsê disekinî. Li gor argumentên wan gava ku em (i) û (î)ya xwe bikin wek a tirkan wê di zimanê me de xerabûnek çêbibe. Yanî wê ev dengên me xerab bibin. Tu jî vê yeka ha tam berevajî wan diparêzî. Di vê hevpeyvînê de tu dixwazî çi bibêjî?*

- Divê berê ez li ser giringiya rakirina kumik û niqtê bisekinim. Dibe ku hin heval bipirsin, gelo ev pîrs çima ewqasî gring e? Çawa ku min berê jî got, ew şeş destûrên ku Mîr Celadet elfabeya xwe li ser ava kirine, bi rastî jî prensîbin ku pîr li pêş in; di hînbûna elfabeyê, xwendin û nivîsandinê de karê xwendevan pîr hêsan dikin. Lêbelê di pîrsa kumik û niqta li ser tîpan de (i-î), ji sedemên ku li derveyî zimanê kurdî, wî zerar daye van destûrên xwe. Loma jî rakirina kumik û niqtê, dê van şeş destûran hê qayimtir bike û ew dubendiya ku ketiye navbera elfabeya wî û destûrên wî, dê ji holê rake. Ev yek.

A duduyan, dengê (i)ya kurdî ( i-ya Hawarê) dengê gelek nîsbetbilind e. Li gor hesibandina Mîr Celadet bi xwe jî, ev deng di zimanê kurdî de miqabilî sedî deh hemû dengê kurdî ye. Gava meriv vî dengî (i) dide ber dengên din, tenê bi serê xwe ev deng bi qasî yekûna yazdeh dengên kurdî ye. Mîr Celadet dibêje, bingehê dengdêrên kurdî ji du dangan pêk tên. Ew jî dengên (e) û (i) ne. Dîsa ew dibêje, ew dengên ku nîsbetên wan bilind in divê bi awayekî gelek zelal û sivik bîn destnîşankirin daku xwendevan bi hêsanî ji heqê xwendin û

nivîsandina wan derê.

Mixabin herfa (i)ya Hawarê ku miqabilî dengê (i)ya kurdî ye, dibe sedemê gelek tevlîheviyan. Berî her tiştî, ev herf di elfabeyên cihanê ên latîni de miqabilî dengê (i)yê ye. Gava zarokên kurd ên bakurê Kurdistanê di mektebên tirkî de dest bi xwendinê dikin ew bi rêya elfabeya tirkî di prosesekê re derbas dibin. Ev yek ji bo zarokên kurd ên li derveyî welêt jî her bi vî awayî ye. Zarokekî kurd ku di heft saliya xwe de dest bi mekteba tirkî dike, bi elfabeya tirkî, çi bi awayê herfhinkirinê û çi jî bi awayê kelîmehînkirinê be, bi salan di qonaxên cihê cihê ên hinbûna xwedin û nivîsandinê re derbas dibe. Ew fêr dibe ku her herfek miqabilî dengê ye. Divê ew herf li gor rêzekê bîn rex hev û bi hev re bîn xwendin. Di nav salan re, ev prosesa xwendinê bi otomatîzebûyînê jî karekî bi îradî der tê, dibe karekî otomatîkî. Yanî bi talîm û terbiyên di nav salan re, çawa xwendevan kelimeyê dibîne, bêyî ku li ser bifikire û bîne bîra xwe bê ka çi herf di wê kelîmê de hene, yekser bêyî ku ew hay jê hebe çavên wî terkîba wê kelîmê dipişkêve û bi rêya sinirî bînayiyê dişîne mêjî. Divê ew sînyalên ku bi otomatîkî bi rêya çav gihîştine mêjî, di mêjî de gotina li miqabilî wê kelîmeyê ku di hafizeya dirêj de heye, şiyar bike.

- *Wextê hafizeya dirêj çiqas e?*

- Ev wextekî dûdirêj digire.

- *Mesele?*

- Mesele hemû tiştên ku em hîn bûne. Îcar bifikire bê çiqas wextekî dirêj e.

Belê. Gava zarokên kurd bi rêya elfabetîzebûyînê digihên vê qonaxa bilind a xwendinê, çawa ew herfa (i)ya Hawarê dibînin, wê yekser wek herfa latîni a adetî (i) dixwînin. Ji ber ku di elfabetîzebûyîna wan de, ev herf miqabilî (i)ya adetî ye. Çaxê ew gotinekê li gor dengê (i)ya adetî dixwînin, yan gotin tu maneyekê nade yan jî maneyekê cihê dide. Ji bo ku ew (i)ya Hawarê wek dengê (i)ya kurdî bixwînin, divê bînin bîra xwe ku ev herf ne a adetî ye, lê a Hawarê ye. Ev tê wê maneyê ku xwendin ji qonaxa otomatîzebûyînê dadikeve a îradî. Ev yek jî dibe sedemê xwendina bi kulî-kulî. Lewra gava xwendevan di hevokekê de li çend gotinan dilikume û tê dawîya hevokê, tiştê ku wî di serî de xwendibû, êdî nayê bîra wî. Ji ber ku wî tiştên di serî de û ên di dawiyê de, di wextê hafizeya kurt de ne gihandiye hev.

- *Hafizeya kurt çiqas e?*

- Hafizeya kurt ew wextê ku gava meriv li kataloga telefonê dinere û hejmara telefonê digire û telefon dike. Piştî telefonkirinê an jî di wê navê de yek tiştê jî meriv bipirse, hejmara ku meriv ji katalogê girtibû êdî nayê bîra meriv.

- *Wextê hafizeya kurt çiqas e?*

- Bi saniyan e. Îcar ji ber ku nîsbeta dengê (i)ya Hawarê pir zêde ye, ev

tevlîhevî dibe sedemê kurdên ku hîn nû bi heweseke bilind dixwazin kurdî bixwînin, ji xwendina kurdî tu tamê nagirin û jê sar dibin.

Maneya vê yekê ew e ku gava meriv ji kurdîxwendinê sar bibe, dê meriv kêmîr bi kurdî bixwîne.

- *Erê ez jî ji xwendin û nivîsandinê sar bûme?*

- A te tiştêkî din e. Îsyan e. Yek ji awayên li dijî asîmîlasyonê şerkirin, geşkirin û berfirehkirina bi zimanê kurdî xwendin e. Gerek rewşenbîrên kurd li ser vê meselê bifikirin. Çimkî ev pirs, pirs a bi milyonan zarokên kurdan e ku ew bi kirasê elfabeya tirkî hînê elfabeya latînî dibin. Min berê jî nivîsî, bi qasî ku ev pirs ji bo zarokên kurdan giran e, ji bo komek rewşenbîrên kurd ku piraniya wan li dervêyî welêt in, ewqas ne giran e. Piraniya kurdên ku bi kumik û niqte dinivîsin jî, dibêjin bêkumik û bêniqte nivîsandin ji bo kurdên bakurê Kurdistanê rehetir e. Lêbelê dîsa jî, ji sedemên psîkolojîkî naxwazin ev guhertin di elfabeya Hawarê de çêbibe...

- *Li Kurdistanê mezin em di dibistanên tirkan de hînê elfabeya latînî dibin. Em bêjin ev yek ji bo me problem e. Lê kurdên başûr û hwd. bi elfabeya erebî dixwînin. Ji bo wan jî ev problema ku tu dibêjî heye gelo?*

- Belê heye.

- *Ji kerema xwe re vê bûyerê hinekî veke?*

- Lewra kurdên başûr beriya elfabeya Hawarê nas bikin, ew di mekteban de zimanekî biyanî, ku pirî caran îngilîzî ye, bi elfabeya latînî dixwînin. Gava ew dibînin ku herfa (i)ya elfabeya Hawarê ne miqabilî herfa (i)ya adetî ye, ev yek ji wan re xerîb tê. Beriya ku kurdên bakurê Kurdistanê li ser vê pirsê gotûbêjê bikin, em dibînin ku kurdên başûr pêşniyar anîne daku ev tevlîhevî ji holê rabe. Zimannasê kurd Cemal Nebez hê di sala 1974an de pêşniyar dikir ji bo ku kumik û niqte bê rakirin. Di pêşniyara wî de dê li miqabilî dengê (i)ya kurdî herfa latînî a adetî (i)û ji dêlva dengê (i)ya kurdî jî, wek ku di elfabeya tirkî de heye, herfa ( i ) bihata bi karanîn.

- *Baş e, eger mekteb û saziyên me hebûna, zarokên kurdan ji destpêkê de bi elfabeya Hawarê bixwendana û di dûra mesele zimanê swêdî ku tê de(i)ya latînî heye bixwendana, wê ji wan re jî ev problema iro derketa?*

- Jixwe eger kurd xwediyê desthilatdariya siyasî, çandî û a perwerdekirinê bûna, dê ew hê ji destpêka hînbûna elfabeyê bigire heta qonaxên dawî ên elfabetîzebûyîné, bi elfabeya Hawarê bikirina. Ji bo wan zêde problem dernediket. Lê çî fêde, em kurd beriya ku hewil bidin bi elfabeya Hawarê hînî xwendin û nivîsandinê bibin, nîvê emrê xwe bêtir bi elfabeyên miletên serdest derbas dikin. Problem di vir de ye. Gava me di mektebên kurdî de, di bin desthilatdariya siyasî a kurdî de bi elfabeya Hawarê bixwenda, zehmetiyên di warê hînbûna elfabeya zimanekî biyanî, kêm zêde dê wek zehmetiyên

zarokên miletên din bûna...

- *Bibexişîne, dîsa dixwazim bê m ser meseleya niqtê û kumikê. Dema ku me ev her du tîp (i-i) wek tirkan lê kir, di hindurê wextê de dikare zerarê bide dengê me û vî dengî bi temamî bike wek ê tirkî...*

- Na na, ez ne di wê baweriyê de me ku wê ew her du tîpana zerarê bidin zimanê me.

- *Çawa yanî nadin?*

- Nadin ji ber ku, yên ku deng didin herfan em bi xwe ne. Herf bi xwe ne xwedî dengên standart in, ku li hemû derên cihanê bi yek rengî bîn bi lêvkirin. Ji bilî kurt û dirêjiyê, gelek herfên elfabeya latînî di elfabeyên miletên cihê de, miqabilî dengên nêzîkî hev in. Lêbelê gava her millet van herfan bi lêv dike, her yek li gora denganiya zimanê xwe dangan li wan bar dikan. Loma jî gava em herfên (i)û (i) di nivîsên kurdî de dixebitînin, em wan li gora denganiya kurdî bi lêv dikin û gava tirk di nivîsên xwe de van herfan bi kar tînin, ew jî li gora denganiya xwe wan bi lêv dikin. Ji hêla din ve, wisa dixuye ku di vî warî de têgihîştinek şaş di nav kurdan de heye. Gava meriv behsa (i)ya bêniqte dike, yekser herfa elfabeya tirkî (i)ya bêniqte tê bîra wan. Ji ber ku piraniya kurdan vê herfê wek herfeke mexsûsê elfabeya tirkî dibînin, loma jî dibêjin bila ev taybetmendiya elfabeya tirkî nekeve nav elfabeya me. Di rastiyê de (i)ya bêniqte ne malê tirkan e. Ev herf, hê beriya (i)ya bi niqte peyda bibe hebû û ji 2500 salî û bi vir ve heta iro jî wek herfekê di elfabeya yunanî de tê bi karanîn. Dîsa ev herf (i), ji sala 1916an û pêve di elfabeya fonetîk a navnetewî de jî tê bi karanîn. Em dibînin hin zimanzanên ewrûpî, ji bo saloxdana bi lêvkirina dengê(i)ya kurdî (i-ya Hawarê), herfa (i) ya elfabeya Fonetîk a navnetewî bi kar tînin. Wek ku tê zanîn, ji aliyê tirkan ve bi karanîna vê herfê (i) ne demek ewqasî dirêj e, piştî sala 1928an ne. Dengê herfa (i)ya elfabeya fonetîk ji dengê (i)ya tirkî bêtir nêzîkî dengê (i)ya kurdî yanî a Hawarê ye...

- *Bibexişîne, tam di vir de dixwazim bibêjim: Kurdên Anadolê û kurdên li hêla Sêwas, Entab û Meleyê, em dibînin ku dengên wan ên kurdî hatine guhertin. Bûye dengê tirkî. Wek nimûne, ew ji Kurdistanê re "Kürdistan," ji kurd re "Kürt" dibêjin. Ev jî dide xuya kirin ku divê kurd tucarî van her du (i-i) tîpên elfabeya xwe nekin wek ên tirkî...*

- Tu têkiliya vê bi kumik û niqtê tune.

- *Çawa tune?*

- Tune, çimkî ev tişt yekser bi pîrsa asîmîlasyonê ve girêdayî ye. Sedemê ku dengên tirkî ketine nav denganiya kurdên Anadolê û ên ji bajarên roavayê Kurdistanê, ne ew e ku wan di mekteban de bi herfên (i)û (i)yê bi kurdî xwendine. Ji ber ku bi asîmîlasyonê di denganiya wan de guhertin çêbûye, te divê bi kumik be yan jî bêkumik be, gava ku ew hewil bidin tiştê kurdî

bixwînin, wê ew li gora denganiya xwe ya nû ku nêzîkî denganiya tirkî ye, herfan bi lêv bikin. Ev yek, bi asimîlebûyîna wan ve girêdayî ye. Gava yekî ku ji binî ve asimîle bûbe, êdî di navbera denganiya wî û yekî tirk de ferq namîne. Yê tirk herfên elfabeya kurdî bi çi awayî bi lêv bike, yê asimîlebûyî jî dê bi wî awayî bi lêv bike. Piraniya kurdên ku dengên zimanê tirkî ketiye nav denganiya wan, di rabûn û rûniştinên xwe de, di têkilîyên xwe ên di nav malê û di ên bi derûdor re, bi tirkî diaxivin. Mirovên bi vî awayî, di gelek qonaxên asimîlasyonê re derbas bûne hatine ghiştine qonaxeke dawî ya dengguhertinê. Denganiya wan ji a kurdî derketiye bûye wek a tirkî. Ji xwe zimanê zarokên wan ê zikmakî êdî ne kurdî, lê tirkî ye. Loma jî ew, çi bi niqte çi jî bêniqte be, çi bi kumik û çi jî bêkumik be, wek tirkan nivîsên kurdî bi lêv dikin. Lêbelê kurdên ku asimîle ne bûne û di rabûn û rûniştinên xwe de, di têkilîyên bi derûdora xwe re bi kurdî diaxivin, nivîsên kurdî dê li gora denganiya kurdî bixwînin. Gava ku ew herfa (i)ya Hawarê wek dengê (i)yê dixwînin jî (dengê î-ya Hawarê), ew ne li gor denganiya tirkî lê li gor denganiya kurdî, wê dirêj dixwînin. Tevlîheviyên di vî warî de min berê bi rêz kirin. Kî kare îda bike û bibêje gava ku kurdan di salên 1970î de nivîsên kurdî dixwendin, wan, herfên (i) û (i)yê ne li gora denganiya kurdî, lê li gora denganiya tirkî dixwendin? Hemû kesên ku xwedî tecrûbeyên wan salan û van salên dawî ne, baş pê dizanin ku îdayeke bi vî awayî hebe, ew ji rastiyê dûr e.

Şaşiya dîtina ku dibêje, bi rêya herfên elfabeya tirkî, dê dengên zimanê tirkî jî bikeve nav zimanê kurdî ew e, ku herf û dangan eynî tişt dibînin.

Ez bi rastî jî meraq dikim, gava ew hevalên ku dibêjin bi rêya herfên elfabeya tirkî (i)û (i)yê, dê dengên zimanê tirkî bikevin nav zimanê kurdî, gelo ew li ser herfa Hawarê (i)yê çi bibêjin? Baş e, gava xwendevanê kurd bi herfa (i)yê dengekî tirkî têxe nav zimanê kurdî, bi çi awayî eynî xwendevan gava herfa (i)ya Hawarê dixwîne, kare xwe ji dengê (i)ya tirkî bi dûr bixîne. Lewra Herfa (i)ya Hawarê di elfabeya tirkî de heye û miqabilî dengekî din e. Gelo ev heval dikarin îda bikin ku gava kurdên Anadolê û ên ji bajarên roavayê Kurdistanê herfa (i)ya Hawarê dibînin, ew vê herfê ne li gor (i)ya elfabeya tirkî, lê li gor denganiya zimanê kurdî bi lêv dikin ?

- Baş e, *em dibînin ku ji bilî Celadet Bedirxan, hin milletên ewrûpî jî di elfabeya latîni de hin gubertin çêkirine. Wek nimûne, elfabeya swêdiyan. Wan di (a)ya latîni de gubertin kiriye û hin herfên nû bi dest xistine:( â - ä). Celadet Bedirxan jî di elfabeya xwe de kumikekê davêje ser hin tîpên latîni. Çima ji xelkê re normal e belê ji me re ne normal e? Û a din, îro di nav kurdan de kumika li ser (î)yê hema çawa be bûye wek tişteki me î milî, bila wilo bimîne. Bila tade li me û zarokan bê, bila em zû fêr nebin û herwilo zehmetiyê bikşînin...*

- Te tişteki pir maqûl destnîşan kir , îcar meselê nebe dereke din. Bibexîşîne,

bihêle...

- *Fermo bibêje.*

- Ne herfên elfabeya swêdî (*å - ä*) û ne jî kumika li ser hin herfên elfabeya Hawarê (*ê, î, û*) nîşanên milî ne. Lewra ji bilî elfabeya swêdî, herfa (*å*) di elfabeyên norveçî û danîmarqî de jî hene. Herfa (*ä*)yê di nivîsên elmanî û ên fînî de jî dixuye. Ji bilî elfabeya Hawarê di nivîsên miletên din de jî kumik tên bi karanîn. Di elfabeya romanyayî de (*î*)ya bi kumik jî heye. Çaxa meriv li elfabeyên miletên skandînavî dinere, hin tiştên girîng der tîstên pêşberî meriv. Elfabeya her miletî xwediye dîrokekê û jiyaneke ye. Wek hemû tiştî, ji bo elfabeyê jî destpêkek lihevanînê, damezrandinê heye. Li gor pêwîstiyên hin dem û dewranan di wan de guhertin çêdibin. Elfabeyên welatên skandînavî ên berê, ne wek elfabeyên wan ên îro bûn. Xasme jî ew dengên ku miqabilî van her du herfên ku te behsa wan kir (*å - ä*), bi awayekî gelek cihê dihatin destnîşankirin. Ji dêlva herfa (*ä*)yê, bi sedan salan di elfabeya swêdî de dîftonga ( *ae* ) hat bi karanîn. Her îro jî ev dîftong di elfabeyên norveçî û danîmarqî de tê bi karanîn. Ji bo hêsankirina xwendin û nivîsandinê, swêdiyan ji mêj ve ye dev ji vê dîftongê berdane û ji dêlva wê ve herfa (*ä*) bi kar tînin. Ji hêla din ve, li miqabilî herfa (*ä*)yê bi sedan salan di elfabeyên swêdî, norveçî û danîmarqî de du ( *a* )yên li kêleka hev ( *aa* ) hatin bi karanîn. Di elfabeyên norveçî û danîmarqî de bi karanîna herfa (*å*)yê piştî salên 1900î ne.

Nexwe herfên elfabeya swêdî (*å - ä*), tenê di pêşveçûna dîroka elfabeya wan de teqabulî qonaxekê dike. Sibero dê di vê elfabeyê de çî guhertin çêbibin, em pê nizanin. Ji vê qonaxê jî dixuye, ku li gor pêşveçûnên pedegojîkî û pêwîstiyên civakî elfabeyên miletan di nav prosesa ber bi hêsankirinê, ber bi sivikkirinê ve diçin. Gelek milet dixwazin elfabeyên xwe ji dîftongan rizgar bikin. Mîr Celadet ev meyla ber bi hêsankirinê ve bir û qazancên vê yekê zû dît. Loma jî ew di şeş destûrên xwe de behsa xwe ji dîftong û nîşanên cihê dîrxistinê dike, behsa pêwîstiya bi herfên hêsantir destnîşankirina dengên nisbetbilind dike.

Dîroka elfabeyan derseke din jî rami me dike, ku ev e: Elfabeya tu miletî ne wek Quran an jî Mishefa Reş e ku divê neyê guhertin. Di nav demû dewranan re, li gor hewcedariyên her miletî, guhertin di elfabeyên wan de çêbûne û çêdibin. Divê em bi vî çavî li elfabeya xwe jî binêrin. Mîr Celadet li gor hin qayide û prensîban elfabeya xwe li hev anî. Ev elfabe heta îro elfabeya herî baş e. Lê gava meriv bi çavekî mutlaq lê binere û çavên xwe li hewcedariyên demê bigire û li dij modîfîyekirina hin tiştan derê, berî her tiştî meriv zerarê dide vê elfabeyê bi xwe. Di jiyane de tişteke ku mutlaq be tune. Hin kes di vê pîrsê de ewende hisî ne ku yekcar ji tamê dertînin. Ew dixwazin kurdên ku bi kumik û niqtê dinivîsinin wek kurdên eslî û ên din jî û ên ku bîniqte û bêkumik



dinivîsînin ber bi tirkbûyinê ve diçin, nîşan bidin. Ev ne şêleke maqûl e. Û bi rastî jî sewiya munaqeseyên di vî warî de pir nizm dikin.

- *Belê min bi xwe jî bi awayê bêkumik û niqtê kitêb nivîsandin. Lê ez dibêjim qey ez bi her awayê xwe kurd im. Û di zimanê min de jî hîç navê asîmlasyonê peyde nabe. Heta zimanên ku ez bi wan dizanim, min di nav zimanê xwe ê kurdî de asîmle kiriye. Yanî ku ez tirkî çawa baş dizanim, tam bi dengê xwe ê kurdî li hev dixurbilînim. Ez bawer nakim wek ku tu dibêjî qiyasek wilo hebe.*

- Na wisa ye! Qey tu nivîs û minaqeseyan taqîb nakî...

- *Baş e doktor, ji gotinên te dixuye ku Mîr Celadet pir bala xwe daye ser elfabeya tirkan. Gelo di danîna elfabeya xwe de wî kîjan elfabe esas girtiye? A latînî an gelo a tirkî ?*

- Helbet elfabeya tirkî jî ji elfabeya latînî hatiye girtin. Belê min fêhm kir bê tu çi dixwazî. Tirk rabûne bi hin guhertinên li ser hin herfan, elfabeya latînî li gor pergalek ku li zimanê wan tê ji bo elfabeya xwe bi kar anîne. Gava meriv ji nêzîk ve li şeş destûrên Mîr Celadet dinere, di wan de mantiqek bala meriv dikşîne. W isa dixuye ku Mîr Celadet li gor ehemiyet û gringiya destûrên xwe, ew bi rêz kirine. Bi gotineke din giranî û ehemiyeta destûra yekê ji a duduyan, a duduyan jî ji yê mayî zîdetir dixuye. Gava tirkan di dawiya sala 1928an de elfabeya latînî pejirandin, di destê Mîr Celadet de elfabeyek latînî hebû ku îro li ber destên me ye. Gava meriv vê elfabeya Mîr Celadet û elfabeya tirkan dide ber hev, hin tişt diyar dibin. Tirkan bi alîkariya zimanzanên biyanî berî C. Bedirxan du tişt dîtine. Yek jê ev e:

Destûrên ji bo damezrandina elfabeyek fonetîkî a modern. Gava tirkan di sala 1928an de li ser van destûran elfabeya xwe diyar kirin, di elfabeya ku di destê Mîr Celadet de hebû, ev destûr xuya nakin.

Dudu jî, tirkan beriya Mîr Celadet ji bo dengê(i)ya xwe herfek danîne. Em pê nizanin bê ka gelo Mîr Celadet di elfabeyên xwe ên beriya sala 1928an de, ji bo dengê(i)ya kurdî tu herf danîne yan na. Lêbelê di elfabeya 1928an de, li himberî vî dengê kurdî, ku bi qasî sedî dehê hemû dengên kudî ye, tu herf tunenin. Herwisa em pê dizanin ku di elfabeya erebî a ku tirk û kurdan bi kar tanîn de, ne dengê tirkî û ne jî ê kurdî bi sedan salan ne hatibû destnîşankirin. Loma jî, ji bo vî dengî peydakirina herfekê, gaveke girîng bû û ev gav ji alî tirkan ve hat avêtin.

Piştî ku tirk elfabeya xwe diyar dikin, Mîr Celadet dibîne ku di navbera elfabeya wî (a sala 1928an) û a tirkan de ferqeke gelek mezin heye. Ew radibe wan xebatên xwe yê nêzîkî deh salan ku wî li ser elfabeya latînî didomand, dide aliyekî û elfabeya xwe nêzîkî a tirkî dike. Loma jî, gava ew xwe nêzîkirina elfabeya tirkî wek destûra yekê datîne, li gor elfabeya latînî, ehemiyeteke

zêdetir dide elfabeya tirkî. Ew di destûra duduyan de qala bi karanîna herfên adetî ên elfabeya latînî dike. Eger wî, giraniyeke zêdetir bida elfabeya latînî, dê wî dev ji xebatên xwe yên deh salan berneda û di destûra xwe a yekê de qala xwe nêzîkkirina elfabeya tirkî nekira.

Em vê zêde ehemiyetdanîna elfabeya tirkî di warekî din de jî dibînin. Mîr Celadet di danîna rêzû pergala elfabeya xwe de, elfabeya latînî bingeh nagire, lê a tirkî bingeh digre. Çawa me berêjî got, ev şaşî bû sedemê kumika li ser (î)ya Hawarê. Gava ku dubendî di nav destûrên wî de çêdibin, ew li gora rêza destûrên xwe diçe. Bi gotineke din, gava ku dubendî di nav detûrên yek û duduyan de hebe, ew giraniyê dide destûra yekê û xwe ji destûra duduyan dûr dixê. Em vê yekê di nivîsên wî de dibînin. Di gotûbêjên li ser herfek ji bo dengê(ç)ya kurdî de ew weha dibêje: Di latîniya kevn de dengê(ç)yê carna bi herfa (c)yê hatiye nîşankirin. (Îro jî herfa c di zimanê îtalî de carna miqabilî dengê ç-yê ye). Eger ew li gor destûra xwe a duduyan biçûya, diviya bû wî ji dêlva dengê(ç)ya kurdî herfa (c)yê daniya. Lê di vê rewşê de, dê wî destûra xwe a yekê feda bikira. Lêbelê, ew radibe xwe ji elfabeya latînî dûr dike û wek ku di elfabeya tirkî de heye, ji bo dengê(ç)yê herfa (ç)yê û ji bo dengê (c)yê jî herfa (c)yê bi kar tîne. Tiştêkî balkêş e ku di elfabeya wî a sala 1928an de, li miqabilî dengê(ç)yê wî herfa (c)yê bi kar aniye.

Zimanzanê ku bi Mîr Celadet re rêzimana kurdî nivîsiye Roger Lescot dibêje, elfabeya tirkî tesîr li Mîr Celadet kiriye. Mîr Celadet di rewşên dijwar de elfabeya xwe pêk anî. Di wê demê de yek bi yek serhildanên kurdan hatibûn fetisandin. Tu hêvî ji bo kurdan nemabû. Mîr Celadet li mahaciriyê bû û xwe spartibû dewleta Fransayê. Li derûdora wî zimanzanên kurd tune bûn. Ewî ev karê giran bi tena serê xwe dikir. Tirk xwedî sazî û dewlet bûn û ji gelek pisporên biyanî alîkarî digirtin. Loma jî, tiştêkî gelek normal e ku wî ji tecrûbên tirkî fêde wergirtibe. Ev yek mezinayî û otorîteya wî helbet kêmtir nake.

Îcar dibe ku ew rêzên li jor ne bi dilêhin hevalan bin. Lewra hin heval di wê dîtîne de ne, heta ku ji dest tê divê em kurd xwe ji elfabeya tirkî bi dûr bixin. Lêbelê ev dîtîn li dijî mantiqû prensîbên Mîr Celadet e. Eger pîvan, heta ku ji dest hatî xwe ji elfabeya tirkî bi dûrxistin be, wê çaxê kerem kin em bizivirin ser elfabeya Mîr Celadet a 1928an. Beriya ku wî xwe nêzîkî elfabeya tirkî kir, ev elfabe di destê wî de bû. Di wê elfabeyê de li miqabilî dengê(ç)ya kurdî herfa (c), li miqabilî dengê(c)yê herfa (x), li miqabilî dengê(k)yê herfa (q), li miqabilî dengê(ş)yê diftonga (sh), li miqabilî dengê(û)yê diftonga (ou), li miqabilî dengê(i) ya kurdî tu herf nehatiye bi karanîn. Ew hevalên ku dixwazin, em xwe ji elfabeya tirkî bi dûr bixin, bila kurdan qani bikin, kerem kin em li hev bikin û bizivirin ser elfabeya Mîr Celadet a sala 1928an. Ka bi vî awayî, dê çi sosret bê serê kurdan !

Ez dixwazim ku em hemû kurd li ser vê pirsê piçekî bifikirin: Eger tirkan di sala 1928an de elfabeya xwe ne guhertibana û her elfabeya erebî bi kar bianîna û Mîr Celadet jî elfabeyeke wek a ji sala 1928an li dû xwe bihişt, dê gelo îro elfabeyeke çawa di destême de hebûya?

- *Pirsa dawî birêz Çelîker. Bi dû ku Mîr Celadet elfabeya xwe datîne, nêzîkî bîst salan dijî. Ew kumik û niqta li ser du herfan (î, i) ranake. Herwisa Kamûran Bedîrxan heta sala 1978an li jiyânê ye û ew jî guhertineke bi vî awayî nake. Çima ew bi xwe guhertinê di van her du herfan de nakin ?*

- Rast e, Mîr Celadet piştî danîna elfabeya xwe nêzîkî bîst salan li jiyânê ma û di elfabeya xwe de tenê yek guhertin çêkir. Wî cihyê herfa (k)û (q)yê bi hev guhast. Divê bêgotin ku di jiyana Mîr Celadet bi xwe de, tu mecal çênebû ku elfabeya wî li bakurê Kurdistanê bê ceribandin. Loma jî tiştê ku di jiyânê de neyê ceribandin, meriv nizane bê ka dê sibero çî probleman bi xwe re bîne. Bêceribandin, ne qabil bû ku Mîr Celadet zanibûya bê ka elfabeya wî dê ji bo kurdên welatê jorîn çî tevlîheviyan derîne. Di dema wî de problemeke bi vî awayî derneketiye ku ew rabe li çareserkirinekê bigere. Ji hêla din ve, kovara Hawarê li bakurê Kurdistanê belav nebû û xwendevan û abonemanên Hawarê gelekî kêmbûn; ew çend kurdên Sûriyê û ên Behdînanê bûn. Nûredîn Zaza di sala 1975an de dinivîse, yek ji sedemên ku kovara Hawarê weşana xwe rawestand ew bû, ku xwendevanên wê kêmbûn û ew pereyên ku ji wan dihat nikarîb û kovarê bide jiyandin.

Îro em du tiştan dizanin: Yek, Mîr Celadet dût didît û loma jî elfabeya xwe nêzîkî a tirkî kir. Di vî warî de wî weha digot: ”..bi vî awayî kurdên welatê jorîn û heçî ko elfabeya tirkî dinasin dê bikarin bêdişwarî ya kurdî hîn bibin û komel û kitêbên me bi hêsanîtî bixwînin!”

Ya duduyan, ên ji ekola Hawarê, wek Kamûran Bedîrxan, Cegerxwîn, Osman Sebrî û Nûredîn Zaza li dij rakirina kumik û niqta li ser van du herfan (î, i) derneketine. Di jiyana wan de, wek nimûne kitêba Memê Alan ku N. Zaza redakte kiribû, du kitêbên Kamûran Bedîrxan (yek bi Dr Şivan re) ên li ser rêzimana kurdî, li Kurdistanê bi bîniqte û bêkumik derketin. Rojek ji rojên Xwedê li tu derê ez rastî nivîseke wan ne hatime ku li dijî bi vî awayî çapkirina van kitiban derketibin.

- *Ji kerema xwe re gotina dawî bibêje.*

- Gotina min a dawî: Bi rakirina niqta li ser (i)yê û kumika li ser (î)yê, em elfabeya Hawarê xerab nakin, wê bêtir dighînin ew şes destûrên hîmdarê wê û bi vî awayî jî wê hê tekûztir dikin. Li gor pîvanên pedegojîkî, dê ew ji bo kurdan hêsanîtir bibe. Tekûzkirineke bi vî awayî di destême de ye. Çima em xwe ji ber vî karî didin alî ?

# Bi Hesenê Metê re

- Em îro dibînin ku di warê elfabe û gramera kurmançî de di nav rewşenbîr, dezgeh û rêxistinên kurdan de tevliheviyek heye.

*Birêz Hesenê Metê, ez dixwazim ku em ji kumikê dest pê bikin. Tu çi dibêjî?*

- Baş e ser çavan.

- *Wek ku tu jî dizanî, di nav me de li ser tîpa bi kumik û bêkumik dubendiyek heye. Di hebûn û nebûna kumikê de gotina te çi ye? Yanî kumik hebe çi ye ne be çi ye?*

- Îro problemên me yên zimên ewqas gelek in, kumika ku tu bahs dikî li hemberî van probleman tiştêkî pir piçûk e... Ca bifikire ku problemeke te û laşê te bi xwe heye, tu bi ser ve nabî ku derpê û kirasekî li gor bejna xwe peyda bikî, li gor lingê te şekal tune, ji delingên şalê te yek teng û yek fere ye; ji piyên çakête te yek kin û yek dirêj e... ma ne tiştêkî ecêb e ku fotêrek li serê te û tu werî ji min bipirsî û bibêjî: "Ev fotêr li min tê an ne?" Bi gotineke din, problemên wekî din hene û tirsra min ew e ku bêtir jî bibin.

- *Wek çi?*

- Wek ji aliyê rastnivisînê de problemên mezin hene.

- *Baş e, li gor dîtina te ev problemên ha çawa dikarin rabin an hinekî kêmtir bibin?*

- Ji bo kêmkirina problemên weha, otorîta ilmê ziman, dezgehên ku bi vê fonksiyonê radibin, rewşenbîrên têgêhîştî û xelkekî bêkompleks û gelek tiştên din divê. A wê çaxê meriv ê bikani bin gavina bavêjin ku vê tevliheviyê kêmtir bike. Lê bi vê rewşa îro ne bawer im ku em ê bikani bin vê yekê jî bikin.

- *Belê ezbenî, bi qasî ku ez dibînim di vê rewşa îro de her çiqasî têr neke jî hin dezgeh û zimanzanên me hene. Wek nimûne: Enstîtuya kurdî a li Stenbolê, a li Parîsê a li Bonê û hwd...*

- Ji endamên enstîtuya Stenbolê jî pêşniyarên gramêr û elfabeyên nû belav bûn. Ku me hemûyan ev pêşniyarên wan weke otorîta zimanekî qebûl bikira diviya bû me jî îro weke birêz Feqî Huseyn Sagnîç binivisanda, me ê bi elfaba Raîf Yaman binivisanda. Û bi reformên gramêra enstîtuya kurdî a li Parîsê û çend dezgehên weke Federasyona kurd a li Swêdê jî ev tevliheviya îro di kurmançî de peyda bûye. De îcar em werin ser zimanasên me, te got çî?

- *Erê, zimanasên ku îro li holê ne.*

- Ez tu otorîteyekê di zimnasiya îro de nabînim û di roja îro de ev otorîta zimanasiyê li ba tu kesî jî tune. Ji ber ku otorîta zimanasiyê ilmê ziman bi xwe ye. Ev yek. Ya duduyan jî berpirsiyarî û baweriya li hemberî vî ilmî ye.

- *Tu dikarî vê meselê hinekî vekî?*

- Otorîta zanînê ew e ku ew zanîn îzahata rastî û çewtiyan bike. Yanî îzahatên wusa bike ku herkes pê serwext bibe û bêyî heftûheşt qebûl bike. Lê mixabin ez vê yekê li ba kesekî nabînim. Ku hebûya, ev kaos û krîza me ê wusa mezin nebûya: Her ji pêlekê kesekî ê cesaret nekira û gramerên nû dernexista, kesekî ê xwe li elfabeyên ecêb û ecêb neceribanda! Zana û nezanên vî karî ê îro destê xwe dirêjî ilmê zimên nekira. De îcar yek an jî hinekên ku bi rastî jî alimên vî karî hebûyana bi kêmanî xelk ê jî serwext bibûya û gramerên marûfane deneketana.

- *Birêz Hesênê Metê, te heta niha şeş kitêb nivisandine, ji van kitêban sê heb jê werger û sê heb jî ên te bi xwe ne. Belê min dît ku di hemûyan de, tu hîn jî li gor rêbaz û destûrên C. Bedirxan çûyî.*

- Bibuhure, lê tu zimanekî wusa bi kar tînî... mîna ku herkes derketiye jor û ez li jêr mame.

- *Na. Dixwazim bibêjim ku çima tu ji ser a xwe nayê xwar. Kesek ji me wek C. Bedirxan nanivîsîn, tu çima dinivîsîn?*

- Ez ne serhişk im; ew cesareta li ba min tune ye ku di vê rewşa îro de kesek bi kesekî nizane bê kî çi dike, ez rabim grameran binivîsînim, di zimên de reforman bikim û êşa serî girantir bikim ha! Reformên ku di zimanan de dibin her tim pêşketinekê didine ber xwe. Ez bi xwe jî bi vê yekê re me. Lê mixabin guhertinên ku bi navê reforman hatine kirin, tiştên ku hebûn jî deforme kirine.

- *Ev e sebeb?*

- Ma ne bes e qey! Sebeba ku ez li gor gramera C. Bedirxan çûme û hîn jî diçim, hemû jî ji bo silameta zimanê me ye. Min ne xwest ez beşdarî vê aloziyê bibim û bi zimanê miletekî bilîzim. Berpirsiyariya vê yeka ha pir mezin e heyran! Te got erê? Hema carekê li nivîsên xwe ên îro û ên salên derbasbûyî temaşe bike. Tu ê bibînî ku di nivîsên îro de hîç pîvan ne maye. Geh wusa lêdike geh wusa lêdike. Ji ber ku li ser şopa C. Bedirxan naçin, ne rehet in. Belê ez rehet im. Gava ez radihêjim qelemê min tu problem çêna bin. Divê em ji bîr nekin, heta van çend salên dawîn jî di kovaran de û bi taybetî jî di Berbangê de her redaksiyoneke nû daxuyaniyek dinivisand ku ew ê kovarê li gor kîjan gramerê binivîsînin. Baş nayê bîra min ka bê weke daxuyanî hate nivisandin an ne, lê di hinek redaksiyonan de dihate gotin ku ji sedî heştê gramera Mîr Celadet, ji sedî deh gramera Q. Kurdo, ji sedî pênc gramera Apê Osman û Xwedê dizane serê sedê mayî jî bi xwe li hev dihanîn û tiştê ecêb jê derdixistin. Bi kurtî tiştê ku bû û pêk hat ev gramera îroyîn e û pê tê nivisandin. Baştir bû ku em li gor destûr û rêbazên gramerekê bimeşiyana û bi taybetî jî gramera C. Bedirxan. Ji ber ku gelek hejmarên kovar, rojname û tiştên din bi

elfabe û gramera wî derketin. Heta wê roja ku otorîta ilmê ziman, dezgehên xwediyê vê fonksiyonê çêbûbana, diviya bû me destdirêjîya reformên ziman nekira.

- *Baş e li gor te ew otorîta ilmê ziman îro tuneye. Em ê di vê roja îro de çawa bikin ku em ê bikaribin hinekî rê li vê tevlîheviyê bigirin ma ne ji xwe?*

- Li gel ku dereng e jî meriv dikane hinek hewildanan bike. Wêk nimûne rêxistin û partiyên me gotinên xwe yek bikin û vê meselê bispêrin kesên xwedî intrese. Divê ew jî li hev rûnin, bi hev bişewirin, têbigêhîjin ka bê bingehe gramera Mîr Celadet çi ye û çima wusa ye û ku heq jê dernekevin, dikanin alîkariyê ji alimên biyanî jî bixwazin.

- *Ji bo vê hevpeyvînê sipas.*

- Spas xweş.

## Bi Mûrad Ciwan re

- *Birêz Mûrad Ciwan wek ku em dizanin, Celadet Bedirxan di sala 1932an de şiklê dawî dide elfabeya xwe. Ji vê tarîxê û pê de elfabe bi awayê ku wî nivîsibû di nav rewşenbîrên kurdan de, heta ku digihê tarîxa tevgera şexsiyetên wek Mûsa Anter, Dr. Şivan, Edîb Karahan û hwd. tê xebitandin. Îcar ji vê tarîxê û pê de em dibînin ku, elfabe û rêbaz û destûrên gramera Celadet Bedirxan, di nav rewşanbîrên Kurdistanê bakur de bi awayekî tevlîhev tê nivîsîn. Û ew tevlîhevî heta roja îro dom dike. Sebeb çi bûn ku di van deman de bûyerek wilo pêti dide?*

- Heke te rastî bivê di vî warê de ne min tu lêkolîn kiriye û ne jî ez rastî tu lêkolînan hatime ku ez karibim bersiveke durust a ilmî bidim te. Bersiva vê pirsê herî rasttir wê bi lêkolînên zanistî yên dîrokî karibe bê dayîn.

Lê ez dikarim bi saya hin zanînan, tecrube û serboriyên xwe texmîna xwe ji te re bibêjim.

Wekî di her warê jiyana de, di yê dîroka xwe ya edebî û ya alfabetîzebûyina civaka xwe de jî me lêkolînên ciddî nekirine. Belgeyên li ser van waran li ber destên me gellek kêman in. Di dema xebata wan zana û ronakbîrên me de -yên ku tu wan binav dikî- lêkolîn û zanyariyên bi vî awayî kêmtir bûn.

Pişt re civaka kurd ji ber bindestî, qedexekirin, têkşikandin û her awe zor û zilma dijmin firsenda wê jiyana azad a bi rûmet û rêxistî ya xwedan dezgeh nejiya ye, navbirr ketiye navbera hema hema hemû neslên civakê û kultura maddî û manewî ya wan. Bi kêmasî ev du sed sal in ku rûdanên li ser jiyana

civaka me bi vî awayî xwe diyar dikin.

Em bînin bîra xwe ku zanayê me yê rûmetbilind; Mîr Celadet Alî Bedirxanî alfabeya xwe di nîvê duduyan ê salên sihan û nîvê pêşîn ê salên çilan de, di dema derxistina Hawar û Ronahiyê de gihand û kemiland (helbet wî gellekî berî van salan dest bi durustkirina alfabeya kurdî ya ser esasê alfabeya latînî kiribû, lê em nakevin wê bahsê). Ji alî kurdan de ev dewran yeka welê bû ku Kurdistan di nava çar dewletan de hatibû parvekirin, serîhildanên kurdan ên gelêrî hema hema li hemî perçeyan hatibûn şikênandin, an gellekî qelsxistin. Dewra şerê duduyan ê cîhanê bû. Bi taybetî li Tirkîyê ewrekî reş ê tarî xwe ber ra ser welêt û bi taybetî civaka kurd dabû. Zanayên kurd, hin bûbûn penaber li Sûriyê, Lubnanê, Iraqê an li hin welatên Awrûpayê. Têkiliyên navbera wan û kurdên hundur gelek zêf bûn, heta dereceyeka wilo ku meriv dikare bibêje "tunebûn". Kurdên li hundurê welêt, zêde hay ji wê yekê nebûn bê ka kurdên li derveyî welêt çi xebatê dikin û berhemên ku ew derdixin çi ne. Kovar û pirtûkên ku li derveyî welêt dihatin derxistin, kêr diketin destên kesên hişyar ên welatparêz û zana yên hundur.

Loma jî meriv dikare bibêje ku gava di salên 50-an û 60-an de yên wekî Mûsa Anter, Dr. Şivan, Edîb Karahan, Kemal Badillî û yên din dest bi nivîsandina kurdî kirin ew berhemên ku agahdariyeka têr li ser alfabeya Celadet Bedirxanî bidin, li ber destên wan nebûn. Belê di hin cihan de, em lê rast tên ku hin kovar û pirtûk ji derveyî welêt ketibûn destên hinan ji wan, lê diyar e ku vê yekê têr nedikir da ew hay ji giştiya buyerê hebin û xwe li ser wî mîrasê ku Celadet Bedirxanî hiştibû ava bikin. Gava meriv gramera Kemal Badillî û ya Celadet Bedirxanî bide berhev meriv çêtir di vê perîşanî, bedbextî û rebeniya kurdan digihîje.

Em dibînin ku di salên 50-an yên 60-an de, yên li Awrûpayê bi zimanê kurdî dibilin, wekî Kamûran Bedirxan, Thomas Bois, Joyce Blau û hinên din heta yên ku li Iraqê û Kurdistana Iraqê, li Sûriyê û Kurdistana Sûriyê û heta ew zanayên kurdan ên li Yekîtiya Sovyetan muhawelan li ser vê alfabeyê didin, bi alfabeya Celadet Bedirxanî dinivîsin, çimkî hay ji vê alfabeyê hene. Piştî ku Dr. Şivan derdikeve Awrûpayê û bi taybetî jî piştî ku diçe Kurdistana Iraqê û ku gramera Celadet Bedirxanî û berhemên wî yên din tên ber destên wî, em dibînin ku ew jî xwe nêzî alfabeya wî dike.

Piştî darbeya 12-ê Adara 1971-ê ku hin kurdên Kurdistana Tirkîyê derdikevin Awrûpayê, rastî berhemên Celadet Bedirxanî, xebatên Kamuran Bedirxanî û yên hin kesên din tên, em dibînin ku ew kovarên wekî Ronahî, Bahoz, Çiya û yên din li ser alfabeya Celadet Bedirxanî derdixin, ev berhemên wan di hin rîyan re digihîjin hundurê welêt, pişt re gelekên ji wan bi xwe vedigerin welêt û dest bi xebata weşanî ya bi zimanê kurdî dikin û alfabe hema hema bi tevayî xwe dispêre ya Celadet Bedirxanî ji bilî wan dengdêrên

”bikumik” û ”bêkumik”.

Bi texmîna min, yek ji sebebên ev qutbûna navbera neslan, bêmîrasmayîna ji kultur û xebata neslê berî xwe û hayjênebûna dîroka xwe ye.

Sebebê dudyan jî kare ew be ku li welatekî, gava dezgeh û îmkanên meriv bi xwe tunebin, meriv dest davêje dezgeh û îmkanên wî welatê ku meriv lê dijî. Dibistan, weşanxane û çapxaneyên Kurdan bi xwe di dema salên 50-yan û yên 60-an de li ber destên yên wekî Mûsa Anter û Edîp Karahanî nebûn, loma jî wan destê xwe dirêjî wan îmkanan kirin ku dezgehên tirkî pêşkêş dikirin. Ew tîpên dengên kurdî yên ku bi alfabe ya Tirkî re muşterk bûn bi kar anîn, ew ên ku ne muşterek bûn jî li gorî dîtîna û bihîstîna xwe durust kirin ku di nava tîpên çapxaneyên Tirkî de hebûn.

Tecrubeyek di serê min re derbasbûye ku ez dikarim behsa wê bikim bê ka bêmîkanî dikarin meriv mecbûrî çî bikin:

Berîya darbeya 12-ê Îlonê li Tirkîyê kovara kulturî ya bi navê TÎRÊJ derdiket. Berpirsiyarê kovarê yê rasmî hevalekî din bû lê ez jî berpirsiyarê fiîlî yê karûbarê îdarekirina redaksiyonê û yê çapê bûm. Her çendî ez endamê redaksiyonê bûm jî ji bilî wê, ew nivîsên ku ji bal nivîskaran û heyetê ve dihatî nivîsîn min berpirsiyarî li ser wan dikir ku biçin Îstanbûlê û li wê derê bêne çapkirin. Çapxaneyên me kurdan bi xwe nebûn û her çapxaneya tirkî jî ji bo me çap nedikir. Her wiha li gora qanûnê jî qedexe bû ku meriv kovareka bi zimanê kurdî çap bike. Hem tirsî dewletê li ser me û hem jî jî bêmîkaniyetan em li vî aliyê wî aliyê digeriyan ku çapxaneyek ji bo me kovarê çap bike. Hin çapxane an dezgehên tîpçînîyê yên hevalên tirkî ên şoreşger hebûn ku wan jî bi îmkanên hindik û dezgeh û makînen piçûk û yên kevn ji bo xwe jiyana weşanî didomandin û qebûl dikirin ku nivîsarên me yên kurdî jî rêzbikin (biçînin) û çap bikin. Hostayên ser van makînan tirkî bûn, di jiyana xwe de kurdiya nivîsandî nedîtibûn. Gava metnên kurdî diçandin yek bi yek li tîpên wan dinihêrtin. Vê yekê gellek wext distend û ew bi xwe jî gellek di ber de diwestiyan. Gellek caran tîp şaş rêz dikirin, an jî (bi nezanî) ew tîpa ku di metnê de hebû bikar netanîn yekê nêzî wê bikar tanîn. Her çendî me alfabe ya Celadet Bedirxanî dinasî û di orîjînalên metnên xwe de me ew bikar dianî jî gava kovar jî çapê derdiket, me didît ku alfabe ya din durust bûye. Me jî digot di vê rewşa dijwar de bira kovar belav bibe hema bira qe bi wan tîpên şaş be.

Heke hûn li kovara Tîrêjê binêrin hûn ê bibînin ku di hin metnan de ji dêlva tîpa ”ê” yê, ya ”é” hatiye bikaranîn. Ev ne ji ber tercîha me bû lê ji ber wê yekê bû ku ji bo tîpçînê tirkî ferqa navbera her du tîpan tunebû. Em jî mecbûrê wî bûn, me zêde nikarîbû zor bidaya wî. Di netîcê de bi wî awayî derdiket.

- Di *elfabe ya Celadet Bedirxan de em dibînin ku ji pênc dengdêrên (vokal) dirêj bilindek tenê li ser van her sê dengdêran (ê, î, û) heye.*



*Bilindek çima li ser (a, o) tune ye?*

- Ne hewce ye ku bilindek li ser van her du tîpan hebe. Çimkî di kurdî de dengê "a"yeka, an "o"yeka kurt û yeka dirêj tune ye ku ew mecbûr bibûya ji bo yekê tîpeka bê bilindek û ji bo ya din tîpeka bi bilindek durust bikira. Lê gava em vegezin ser tîpên "ê", "î" û "û" em dizanin ku di kurdî de nêzî van dengên sê dengên din, lê kurt hene ku Celadet Bedirxanî ew bi tîpên "e", "i", û "u" dane temsîl kirin. Loma ji bo her sê dengdêrên dirêj jî bilindek danîne ser van tîpan û ew kirine "ê", "î" û "û". Di vî warî de, em dibînin ku alfabe ya ku Celadet Bedirxanî durust kiriye ji ya Tirkî pirtir xwedan prensîb e. Em dizanin ku tîpê bê bilindek, noxte an îşaretekê hema hema di hemî zimanan de temsîla dengê "kurt" dike û her gava ku dengê dirêj ê ku ji eynî cîhderkê an cîhderkeka nêzî wê derdikeve, bi bilindek, noxte an îşareteka din ew tîp hatiye guhertin û tîpeka serbxwe jê hatiye duruskirin. Tiştê ku Celadet Bedirxanî kiriye li vî prensîbî dike, lê tiştê ku Tirkî kiriye gellek caran bi vî prensîbî re li hev nayê. Her wekî di mesela "î" û "i"yê de alfabe ya Tirkî xwe daye pey vî prensîbî, lê di mesela tîpên "u" û "ü" de bi eksê wê çuye.

*- Gelo bilindek tiştêkî ilmî ye?*

- Bilindek helbet karekî ilmî ye ku gava di zimanekî de du dengên gellek nêzî hev, lê yek kurt û yek dirêj be; ya kurt heke bi tîpekê tê temsîl kirin ya dirêj jî bi her wê tîpê lê bi bilindekekê tê temsîl kirin. Ev metod pirtir di alfabe yên fonetîk de (yên ku her dengê bi tîpekê tê temsîl kirin) tê bikaranîn û hêsanîyeke têra xwe dide xwendin û nivîsîna wî zimanî.

*- Ji nivîsên Celadet Bedirxan dixuye ku ew naxwaze alfabe ya xwe ji a Tirkî bidûrxîne. Li aliyekî hem vê daxwaziya xwe vekirî tîne zimên û li aliyên din jî (u, û, î, i)ya kurdî ji a ku Tirkî bi kar tînin cihê lêdike.*

*Sebebên ku alfabe ya wî ji alfabe ya Tirkî bidûrxist çî bûn?*

- Rast e ku Celadet Bedirxanî bi xwe nivîsiye ku heta ji wî hatiye wî xwestiye ku ew alfabe ya xwe nêzî ya Tirkî bike. Lê her wiha dîsa wî bi xwe daye zanîn ku alfabe ya Tirkî di wê demê de di bikaranînê de piranî jî di bikaranîna xetên destnivîs de tûşî hin astengan bûye. Celadet Bedirxanî ê ku berî Tirkî dest bi duruskirina alfabe ya latînî kiriye, lê piştî wan dest bi bikaranîna vî alfabe yê kiriye ji tecrûbe, şaşî û qelsiyên alfabe ya Tirkî ders wergirtiye û ew kêmasî di ya xwe de rakirine. Her wiha wî ji Tirkî pirtir xwe sipartiye wî prensîbî ku gava du dengên nêzî hev bin yê kurt bê bilindek û yê dirêj bi bilindek be (ku me di bersîvên pirsên berê de jî behsa vî yekê kir). Ev her du tişt in ku bi baweriya min rê vekirîna da ew di wan dengên de ku tu bi nav dikî xwe ji alfabe ya Tirkî bidûrxê. Heke meriv dûr û dirêjtir li ser vî pirsê rawest e ne dûr e ku hin sedemên din jî hebin. Lê bi ya min ew her du sedem bes in ku ew serî li guhertîna wiha bide.

Ji aliyê din em dizanin ku ew dijwarî û astengên ku alfabeya tirkan wê demê lê rast dihatin îro ji holê rabûne. Bi baweriya min heke meriv bixwaze li ser kêmasiyên alfabeya tirkan raweste meriv îdî nikare wan argumentan bikar bîne ku di wê demê de Celadet Bedirxanî ji bo xwe bikar dianîn.

- *Birêz Mûrad, di hejmara Armançê a 178an de meqaleyê Dr. Celadet Çelîker bi sernivîsa "Hînbûna xwendin û nivîsandinê proseseke dijwar e!" der çû.*

*Dr. Celadet di vê meqaleyê de doktoriya xwe derxistiye pêş û bi awayekî îlmî, berfireh li ser (î)ya kurdî rawestiyaye. Ev tîp wek girêkeke kwîr ditiye û di navenda mejî de sentaq kiriye. Herwilo bi vê bûyerê nakokiyek veşirtî aniye holê û pevgirêdana di navbera dest û çêv de zexel xistiye. Bi rastî doktor di vî warî de wilo nivîsiye ku, yekê wek min ne doktor li dij nîkaribe tiştêkî bibêje!*

*Bi salan e ku tu li Swêdê mamostetiya zimên dikî. Bêguman aliyên te ên pedagojîkî xurt in. Ji kerema xwe re bi rûpelekî kovara Çirayê, bibexşîne, ji bo zarokêkî kurd ku hîni elfabeya latînî bûye, prosesa hînbûna (î)ya kurdî, yek çi qas wext digire, rave bike? Dudu, di pey dema serkeftinê de ev tîpa (î) kurdî, ji aliyê psîkolojîkî de wek çi probleman jê re derdixîne?*

- Berî ku ez bersîva pirsê te bidim divê ez destnîşan bikim ku ew prosesa hînbûna xwendinê an a hînbûna hin kar û barên din ku Dr. Celadet Çelîkerî di meqaleya xwe de û beriya wê jî di pirtûka xwe de li ser rawestiyaye encama lêkolîna tecrubeyên salan, naskirina anatomî û fîzyolojiya însanan e ku nazariyên îroyîn yên îlmî li ser wan ava bûne. Ew nazariyeninî cihê baweriyê ne û hîndekarî di welatên pêşkeftî de xwe dispêre wan. Di mesela dijwarî û astengên hînbûna xwendin û nivîsandina kurdî de jî yê ku heta niha bi metodeka îlmî li ser pîrsgirêkê rawestiyaye û xwe sipartiye lêkolîn û metodên îlmî Dr. Celadet Çelîker e. Argument û pêşniyariyên ku wî anîne (bi mir ovî çi rast bin û çi jî şaş bin) divê meriv guh bide wan û bi awayekî ciddî munaqêşe bike. Lê tevî vê jî, bi qenaeta min hin nezelaî û kêmasî di wan şîrovekirin û argumentên wî de hene ku divê em li ber çavan raxin da pirs li gora wan jî bê munaqêşkirin û riyên çareseriyê jê re bîn dîtin.

Ez niha dixwazim vegerim ser bersîva pirsê te. Gava ez di wê de hinekî bi pêş de herim ez ê bêtir vekim ku qesda min ji vê yekê çiyê û berfirehî û şaxvedana pirsê diçe heta ku derê.

Min heta niha tu lêkolîn li ser wê meselê nekiriye ku ka gelo zarokêkî kurd ê ku hîni alfabeya latînî bûye heta hîni "î"ya kurdî bibe wê çiqas wext bistîne. Hesabkirina vê yekê ne wiha hêsa ye jî. Ev girêdayî bi wê yekê ve ye ku zarok kî ye, kengî ji Kurdistanê hatiye, umrê wî çend e, ji malbateka çawa tê, çend saetan dersên kurdî dibîne, li malê çiqas kurdî diaxive, xwedan pirtûk û berhemên kurdî ye an na, problemên wî yên din ên ku tesîrê li prosesa hînbûna

giştî û ya zimanê kurdî bikin hene an na û gelek pirsên din ên weka van. Loma jî ne sanayî ye ku meriv tişteki zelal û qetî di vî warî de bibêje.

Di esasî de ne ew qas ferz e jî. Çimkî her çendîn nivîskar û zimannasên kurdan bi dûvika "i"ya bi kumik û ya bê kumik girtine jî di jwariya zarokên kurdan ne tenê di vê meselê de ye. Heke tenê mesele ev herf bûna çareserkerin gelek hêsa bû. Em hemû mamosteyên zimanê kurdî dizanin û heta divê malbatên zarokan bi xwe jî bibînin ku mesela kurdînivîsînê û bi taybetî ya kurdîaxaftina zarokan gellek kûrtir e. Zarokên kurdan ne ku tenê li "ı" an "î"yê dilikumin, di wê prosesa hînbûnê de ya ku Dr. Celadet Çelîker behs dike rastî gellek di jwariyên din jî tên. Li gora ku li kîjan welatî ne, li gellek herfên din jî dilikumin. Ez dikarim mîsalan ji Swêdê û ji Tirkîyê bînim. Her wekî li Swêdê zarokên kurdan di dibistanên swêdiyan de tîpa "c"yê weka dengê "s"ya me, "e"yê weka "ê"ya me, "j"yê weka "y"ya me, "o"yê weka "û"ya me, "x"yê weka "eks"ê, "q"yê weka "qu"yê dinasin û di xwendina wan hemû herfan de dilikumin. Pişt re, heta di mesela xwendina wan tîpên xwedêgiravî muşterek de jî ne dengên kurdî lê yên swêdî derdixin. Ji bo ku di swêdî de dengdêr(vokal) li hin cihan kurt û li hin cihan dirêj tên bidengkerin, ew jî di hin gotinên xwe yên kurdî de dengê "a"yê yan ê dengdêreka din carina kurt û carina jî dirêj derdixin. Ma malbatên kurd bi guhê xwe nabihîzin ku gava zarokên wan li malê her çendîn bi kurdî diaxivin jî kurdiya wan wekî kurdiya yekî swêdî ye. Gava ew dibêjin "Kurdistan", "dayê", "bavo" an "welat" ew ne wekî dê û bavê xwe van gotinan bilêv dikin. Ma qet hûn li wan zarokan rast nehatine ku ji dêlva bêjin ku "ez digerin" dibêjin "ez girover diherim", çimkî bi swêdî meriv dibêje " jag går runt". Wekî din ew bi sedan gotin û cumleyên bi vî awayî ava dikin. Sebebê vê yekê ew e ku ew li dibistanên Swêdê dibin "hişyarê fonetîka zimanê swêdî" û bi otomatîkî bi vî awayî diaxivin.

Li Tirkîyê jî ev mesele heye. Bi taybetî jî li rojavayê Anadoluyê û li metropolan ev asteng derdikevin pêşberî zarokên kurdan. Yên ku filmê Mem û Zîn temaşe kirine bihîstine ku zarokên kurd ên li ser esasê fonetîka tirkî hînbûyî çawa bi kurdiya wekî ya tirkekî diaxivin, ji "were" re dibêjin "vere" ji "Miho" re dibêjin "Mikho" an di halê herî baş de "Mixo". Em dikarin meselan di vî warî de zêdetir bikin, lê ne hewce ye.

De îja em dev ji tesîra zimanên miletên serdest, an yên xwedan dewlet û dezgeh berdin, zaravayên me bi xwe jî ji ber standardîzenezê bûna zimanê kurdî di jwariyên mezin derdixin pêşberî zarokên me kurdan. Ew zarokên min ên ku tên dersa zimanê kurdî; yekî behdînî serî di devoka Diyarbekirê re, yekî diyarbekirî jî serî di devoka Botan re dernaxe, heta ez bi wan didim xwendin û fêmkirin serê min û wan bi hev re diêşê. De îja ji xwe kurmanc xwe nêzî soranî an dimilî, soran an dimilî jî xwe nêzî kurmancî nake û her wekî din. Li ber van di jwariyên wiha, mesela "î"yê belkî ne hêjayî munaqêşkerinê jî be.

Loma jî divê em xwe li tîpên "ı" û "î" yê asê nekin û van kêmasî û astengên gellek muhîm û pirralî jibîr nekin.

Ne tenê piçûkên me, îro mezinên me û heta nivîskarên me bi kurdiyeka li ser esasê hevoksaziya tirkî, erebî an farisî dinivîsin, an diaxivin, bêyî ku bingehên rêzimana kurdî binasin bêjeyan ji ber xwe ve çêdikin û gellek şaştiyên din dikin. Xeter û diwariya van pirsgerêkan ji ya kumik mezintir e.

Ew diwariyên ku Dr. Celadet Çelîker bahs dike hemû bi vî an wî awayî di wan pirsgerêkên jorîn de derdikevin pêşiya zarokên kurdan. Lê li aliyê din divê em bibîr bînin ku mejiyê însan ne bi wî awayî ye ku gava hişyariyeke fonetîk digre û xwe li ser wî esasî otomatîze dike, ew tiştê wergirtî her û her di mejî de dimîne û nema meji kare li gora fonetîkê din xwe ji nuh ve bikodîne (kod bike). Avabûna mejiyê însan ewqas balkêş e ku di bêhed û bêhejmar alternatîfan de dikare ji nuh ve kombînezyonên kodên xwe ava bike û xwe bigihîne wê hişyariya fonetîka nuh û li ser wê xwe veotomatîze bike. Heke ne welê buya, yekî ku bi zimanê xwe yê dayikê perwerde dibû nekarîbû zimanekî nuh ê biyanî hîn bibûya. Heke ne welê bûya, wê yekî tirk, kurd, ereb an çînî çawa fêrî îngilîzî, fransîzî an zimanekî din bibûya.

Qesda min ji vê yekê ew e ku erê ew argumentên Dr. Celadet Çelîkerî heta niha argumentên herî ciddî û zanistî ne lê ew bi xwe jî meselê bi tevayî çareser nakin û ne ji bo demeka heta hetayî ne.

Pirs di esasî de bi mesela serdestiya hîndekariya milletên din ve girêdayî ye ku zarokên me û şagirtên me, heta tevayiya endamên civaka me tûşî van astengan dike. Heta ev serdestî hebe, heta milletê me ji dezgeyên xwe yên milî bêpar be û hîndekariya bi zimanê xwe neke wê ev asteng bimeşin.

Tevî ku mesela kumik di nava van meselan de xwediyê cihekî gellekî piçûk e jî ji bo ku wê xwendin û nivîsandina kurdî ji bo zarokên me hêsatir bike ez terefdarê wê yekê me ku em di alfabeya xwe de tîpên "ı" û "i" bikar bînin. Lê ji bo min mesela ku piraniya me tîpên "î" û "î" bikartînin û hinek ji me jî tîpên "ı" û "i" bikar tînin ji vê meselê girîngtir e. Berî her tiştî divê em hemî eynî tîpan bikar bînin, heke rojekê em ê biguherin jî em wekî millet bihev re biguherin.

Tevî ku ez terefdarê tîpên "ı" û "i" me jî ji bo ku piraniya vî milletî ji dema Celadet Bedirxanî û vir de tîpên "ı" û "î" bikar tînin ez jî wan bikar tînim û ez pêşniyar dikim ku ew hemû kesên ku bi vî awayî nanivîsin bi şûûreka millî helwestekê wergirin û vegerin ser van tîpan û vî milletî ji ucûbetiya dualfabetiya di vî warî de xelas bikin. Ev pirs ji bo min ji pirsê bi kumikî û bêkumikiyê gellek girîngtir e!

- *Tu pêwîst dibînî ku li ser pirsên elfabeyê û rastnivîsîna zimanê kurdî semîner, civîn û hwd. bên amadekirin?*

- Helbet. Min bahsa hin pirsgirêkên zimanê kurdî kirin. Ji vê pêştir jî gellek problemên zimanê me hene, gellek tişt hene ku ji bal kur dîaxêv, nivîskar an wan kesên ku bi weşandina vî zimanî dibilin nehatine zelalkirin. Zimenê me û rewşa me pêdiviyê lêkolîn, semîner û civînan e, lê divê em li xwe varqilin û bi rastîbîniyê pirsgirêkên zimanê xwe tesbît bikin, tenê xwe angajeyê pirskekê nekin û xwe nekin wekî "hespê dingê" û li dora her tenê pirskekê nezîvirin ha nezîvirin.

## Bi Lokman Polat re

- *Birêz Lokman Polat, her ziman xwedî elfabe û gramereke yekgirtî ye. Belê mixabin îro em ji vê bêpar bûne. Bi destê kurdên bakurê welêt di elfabe û geramera C. Bedirxan de tevliheviyek çêbûye.*

*Li gor dîtina te rakirina vê tevliheviyê çawa dikareji holê rabe an hinekî kêr bibe?*

- "Divê her tişt hêsan be." Pêşî, ji bo hevpeyvînê ez pir sipas dikim.

- *Ez jî spas dikim ku te daxwaziya min a hevpeyvînê qebûl kiriye.*

- Ez ne mirovekî zimanzan im. Û li gor min jî tu zimanzanê kurdî tune ye. Belê hin zimannas hene. Berhemên ku li ser zimên hatine weşandin ji aliyê huner û edebiyatê de qels in.

Her ziman xwedî elfabe û gramereke yekgirtî ye rast e, lêbelê zimanê kurdî ne wiha ye. Elfabe û gramereke kurdî ya yekgirtî tune ye. Helbet sedemên wê yên dîrokî û civakî hene. Ne dewletbûn û perçebûna Kurdistanê hêj jî dom dîke. Asteng û nakokiyên siyasî hene. Ev hemû sedem in. Ev sedem zû bi zû ji holê ranabin, lê ji bo ku ev tevliheviya tu dibêjî ji holê rabe çare hene, rê û metod hene.

- *Ew rê û ew metod çi ne?*

- Rê û metod di tifaqîya serok û rêberên Kurdistanê bakur re derbas dibin.

- *Tu wek nivîskar, di nivîsandin û xwendina bi awayê kumîk û bêkumîk û vekîta ne wek hev de çi zehmetiyan dibînî?*

- Zimanê nivîsînê divê hêsan be, bikaribe bê xwendin. Elfabe divê hêsan be. Bibe nebe em fêrî elfabeya ku tirk pê dinivîsîn bûne. Li ser (i) yê danîna kumîkê zehmetiyeke ji bo zarokên kurdan.

- *Baş e, gava elfabeya me û tirkî wek hev be çi zarara xwe heye?*

- Bi rastî ez jî nizanim bê çi zerar xwe heye yanî! Em niha bi çi awayî

binivîsînin jî wexta ku sibê tirk di dibîstanan, radyo û televîzyonan de bi elfabeya xwe zarokên kurd fêtî nivîsa kurdî bikin, wê zarok wek wan fêr bibin û li gor elfabeya wan bi kurdî binivîsîn.

- *Ezbenî bi qasî ku ez fêr dikim, yanî tu dibêjî ku kurmanc wê nikaribin problemên xwe ên zimên safî bikin, ancax dewleta tirk gava bixwaze wê problem nemînin?*

- Erê, tam wisa ye!

- *Ji kerema xwe re tu dikarî hinekî vê meselê vekî?*

- Baş e ser çavan, bi mînakekê ez ê vê meselê vekim:

Eger rojnameya Hurriyetê an Milliyetê û hwd. sibehê, li gor destûrên elfabe û gramera xwe elfabeyekê bi kurdî biweşînin û buhayê elfabeyê bi pêncsed milyon wereqe deynin, ez bawer dikim ku wê di a din î rojê de bi deh hezaran kurd bibin rêz daku rojnameya doh bistînin. Belê ev kurd nikarin gramera C. Bedirxan ku bi pêncî kronî tê firotin, bikin! Baş e, te heta niha çend kitêbên xwe firotine! M. Bozaslan tarîxa kurd bi kurdî lêdike û kurd nakire!...

- *Nivîsandin û xwendina bi awayê kumik û bêkumik wek çi probleman ji te re derdixîne?*

- Ez xwendin û nivîsîna kurdî ji kovara Riya Azadî û rojnameya Roja Welat fêr bûme. Hêj jî gava bi destan dinivîsînim ez qet şefqê bi kar nayînim, nivîsên xwe bêkumik dinivîsim. Li gor dîtina min di ferqiyeta pîrsa kumika li ser “î”yê de înadeke siyasî heye. Di demên berê de reqabeteke siyasî hebû. Di vê reqabetê her kesî dixwest ferqiyetên xwe derxin pêş. Ew reqabeta siyasî li me gelekî buha kir! Helbet problem e. Carekê bi kum û carekê jî bêkum bixwîne, ma çawa xweş e!

Bi ya min divê mirov bi eqilê selîm ji vê pîrsê re çarekê bibîne. 15, 20 sal berê li Stenbolê civînek di nav weşanvanên kurdan de çêbûbû û wan biryar girtibû ku “î”yê wek i” û “î”yê jî wek i” binivîsin, lê yên li Ewropayê biryara wan qebûl nekirin.

- *Nekirin çi kirin?*

- Li aliyekî hem li gor elfabeya C. Bedirxan meşîyan û li aliyekî jî bêqeyde û qûral ji gramera wî dûr ketin.

Li gor dîtina min, çi sebeb dibe bila bibe, kurdên Kurdistana bakur êdî divê dev ji sebebên berdin û hemû wek hev binivîsîn. Heger kumik be kumik, heger bê kumik be bê kumik em ê binivîsîn.

- *Wek hev belê bi awayê kumik an bêkumik wek hev?*

- Ez wek ku niha Komkar û Roja Nû dinivîsin hîn baş û hêsan dibînim. Lê heger yên din wek wan qebûl nekirin, divê ew qebûl bikin û her tiştî bikin yek.

Divê hevûdu îqna bikin. Di vî warî de nivîsek kek Ferhat Can ku pir xweş û ewqasî jî balkêş bû di rojnameya Hêviyê de derçû. Gerek tevgera kurd ya siyasî û ya edebî di vê hêlê de cudabûniyê ji holê rakin. Rakirina vê tevlihevîyê bi destê partî û dezgehên kurdan ve girêdayî ye. Heger gava ew bixwazin, wê ev mesele çareser bibe.

- *Tu bawer dikî ku partiyên kurdan wê bikaribin li ser vê meseleya miletî hevifikîr bibin û bi yek elfabeyê binifisînin?*

- Na.

- *Çima na?*

- Tişteki me î milî ya tuneye ya jî me ne hiştiye heta ku em bikaribin li ser vê meseleya xwe ya milî hevifikîr bibin.

- *Mesele wek çi?*

- Wek Helepçe. Bi dû Hîroşîma û Negazakî de em dibînin ku însaniyet bi bombeyên kimyasalê tenê li Helepçe qetil dibe. Ji bo bîranîna Helepçe gerek kurdan hemîyan bi hev re di yek seetê de rabûna ser pêyan û bi rojan ev wahşeta ha protesto kiribana. Qetilama Helepçe qetilameke miletî ye. Belê mixabin di bîranîna roja vê wahşetê de em vê yekitiyê nabînin!

- *Tu pêwîst dibînî ku li ser pirsên elfabe û rastnivîsîna zimanê kurdî semîner, civîn û hwd. bîn amadekirin?*

- Li ser vê pirsê dikare semîner û panel bîn çêkirin. Di van semîner û panelan de munaqeseyên çêker bibin, ji bo biryardayinê hîn rewşeke hêsan derdixe holê. Heger semînervan yan jî panelvan çêker nebin, berpirsiyariya xwe neynin cih û platform bibin arena munaqeseyên tûj û herdu aliyan bînin hemberê hev wê gavê semîner û panelên wiha dê zerarê bidin vê pirsê û pirs çareser nebe.

Li gor dîtina min, pêşî divê nivîskar û weşanvan bi carekê ve di nava xwe de bicivin û munaqeseya vê yekê bikin. Bi dû ku hevdu îqna kirin wî çaxî jî ji xelkê re panelan çêkin û semîneran bidin. Di vê hêlê de jî wezîfeyên herî girîng dikeve ser milê Komeleya Nivîskarên Kurdên li Swêdê.

- *Birêz Lokman spas.*

- Spas xweş be.

# Bi Xelîl Duhokî re

- *Birêz Xelîl Duhokî, tu wek nivîskarekî ji Kurdistanana başûr hem bi elfabeya Celadet Bedirxan û hem jî bi elfabeya erebî zaravayên kurdî dinivîsînî. Wek ku tu jî dizanî, ji aliyê bi karanîna elfabe û rastnivîsînê de tevliheviyek di nav kurdên Kurdistanana bakur de heye. Li gor dîtina te, ev tevliheviya ha bi metodekî çawa dikare piçekî kêmbibe?*

- Bi rastî, C. Bedirxan mirovekî têgihîştî û pisporê zimanê kurdî bû. Bêguman wî çend zimanên biyanî mîna elmanî, ferensî, tirkî, erebî û hwd. dizanî bû. Nivîskar û ronakbîrekî jêhatî bû. Dema ku mirov nivîsên wî dixwîne, tê de dibîne ku wî elfabeya xwe pir bi jîrî amade kiriye. C. Bedirxanî di vî warî de digel zimannasan, nivîskar û întelektuelan giftûgoyan dike. Elfabeyê pêşî bi 36 tîpan di pratîkê de dixebitîne; dûra dike 34 û dûra jî di sala 1932an de bi 31 tîpê pêşkêşî nesîlan dike. Bi rastî jî, wî zimanê me pir hêsan kiriye; tu çewa dipeyivî, tu wisan jî dinivîsînî. Ev çende di zimanên din de nîne. Wek nimûne, di zimanê swêdî de, çendîn tîpên elfabeya xwe didine yek ta ku dengêkî derkin:

Şê : rs, kä, ske, tju, tja,

Yê: ge, jä, lg

Û her wesa di gelek zimanên din de jî nimûne hene. Lê C. Bedirxanî ev elfabeya kurdî pir hêsan û xweş ji me re dirust kiriye. Ji ber hindê jî, divê em wî bingeh bigirin û li ser giriftariyên ku hene giftûgoyan bikin. Ji aliyekî din ve, hemî elfabeyên dinyayê di navbera 28 - 32 tîpan de ne. Eger em elfabeya xwe zêde nekîn û zimanê xwe sivik bikîn, baştir e.

- *Gelo ji bo çî kurmancên başûr û rohilatê welêt jî mîna kurmancên bakur bi tîpên latînî nanivîsîn?*

- Dema ku Kurdistan herwesa dagîrkirî bimîne, wê biryar her tim di destên dijmin û rejîmên wan ên kevneperest de be. Lewre gelek caran kurdan hewil daye ku bi tîpên latînî bixwînin û binivîsin, lê rejîmên genî rê nedaye û nadin jî. Çinku ew dizanin bi wê çendê wê kurd ji kultur û kartêkirina wan rizgar bibin. Lê di nav şoreşê de, gelek caran pirtûk, belavok û berhemên siyasî û edebî jî belav bûne û hatîne çap kirin.

- *Em dibînin ku di van salên dawî de, meqale û kitêbên ku tu dinivîsînî hemû li gor rêbaz û destûrên elfabeya C. Bedirxan in. Ji elfabeya erebî gava mirov derbasî elfabeya latînî bibe û herwilo bi vê elfabeyê binivîsîne ne zor e gelo?*

- Wek ku tu jî dizanî, xwendin û nivîsandina me kumancên Kurdistanana başûr bi zimanê erebî bû. Min kurdî, ne bi tîpên erebî û ne jî bi yên latînî xwendiyê. Lê min bi alîkariya berhemên latînî xwe fêr kir. Her çend di van



salên dawî de li derveyî welatî, min berhemên xwe bi tîpên latînî çap kirine, lê heta niha jî, zehmetî û astengên rastnivîsandinê, ne gramerê, ji bo min hene. Çinku pirsra rastnivîsînê çareser nebûye. Lê bi taqet û şiyane dilsoz û xemxorên zimanê kurdî, hêdî pêş dikeve.

- *Wek gelek zimanan di zimanê kurdî de jî homonîm û homograf hene. Gelo ji ber hindê, tu wek nivîskar, pêwîst dibînî ku em çend tîpan li elfabeya C. Bedirxan zêde bikin? Çimkî tu bi zaravayê soranî jî xweş dizanî.*

- Ew di gelek zimanên biyanî de jî hene. Gotara te ya ku di kovara Çirayê de belav bû, cihê rêzêye û ez bawer dikim ku pêwîst nake em ji bo her homonîm û homografê tîpekê yan jî îşaretekê li elfabeya xwe zêde bikin. Mirov dikare di hevok û di demê bikar anînê de rastiya peyvê bizane û fam bike. Wek te binivîsî:

”Mastê Gulnazê tîr e.

Tîr û kevanê min hene.

Çelo kar dike

Min ji Çelo re karek serjêkir.

Berf pir bariya.

Ez li ser pirê me.” (L. Qaso, Kovara Çira, hej 10, r 48,50, 1997).

- *Tu wek nivîskar, di nivîsandin û xwendina bi awayê kumik û bêkumik û vekîta ne wek hev de, çi zehmetiyan dibînî?*

- Ya baştir û giringtir ew e ku em elfabeya C. Bedirxanî bikine bingeh. Ji ber hindê jî wesa baş e ku kumik li ser (î) hebe. Û ev kumik bêtir kurdî ye. Dîsan ez bawer dikim ku ev yeka ha ne hindê giring û pêwîst e. Lê dîsa jî divê giftûgo li ser bête kirin. Ji bo min, kumik li ser be yan jî ne li ser be xem nîne. Lê ez dixwazim ku em hemî yek rengî binivîsînin. Helbet zehmetiyê dide gava ku mirov ne wek hev binivîsîne. Giriftarî û asteng di pirsra rastnivîsîna kurdî de hene. Ji bo gelek meselan C. Bedirxanî û yên piştî wî jî mîna Qenatê Kurdo, Cegerxwîn, Osman Sebrî, Sadiq Behaedîn û Mûsa Enterî xebat li ser vê pirsê kirine; destûr û qayide deynayne. Ji bo kêmasiyên din jî pêwîst e ku giftûgo bête kirin û em hemî bi rengê rast û dirust binivîsîn. Dibe ku ev pirs niha bi hêsanî çareser nebe, lê dema ku dewlet û dezgehên me bêne damezirandin, bêguman wê hêsantir be. Lê divê xebateke gerim bête kirin.

- *Tu pêwîst dibînî ku li ser pirsên elfabe û rastnivîsîna zimanê kurdî semîner, civîn û hwd. bèn amadekirin?*

- Bi rastî giriftarî û alozî hene, lewre divê semîner û civîn bêne kirin. Ez bawer dikim ku bi xebateke wesa mesele geştir û giriftarî wê çareser bibin. Lê gerek em ji bîr nekin ku di semînerên wesa girîng de divê kesên şareza û pîspor amade bibin. Neku mîna fêstîvala helbest û çîrokên be.

**Ji vî rûpelî û pê de bi awayê  
çar pîrsan hevpeyvîn bûne. Me pêwîst ne dît ku  
di her hevpeyvînê de em pîrsan bi car bikin.**

**Pîrs1:** Wek tê zanîn her ziman xwedî elfabe û gramereke yekgirtî ye. Belê mixabin em îro dibînin ku di warê elfabe û gramera kurdî de, di nav rewşenbîr, dezgeh û rêxistinên Kurdistanê bakur de tevliheviyek heye.

Li gor dîtina te rakirina vê tevliheviyê çawa dikare pêk bê?

**Pîrs 2:** Tu wek nivîskar, di nivîsandina bi awayê kumik û bêkumik û vekîta (îmla) ne wek hev de çi zehmetiyan dibînî?

**Pîrs 3:** Gelo sedemên bilindeka li ser (i) ya latînî ku C. Bedîrxan ew di elfabeya xwe de bi cih kiriye çi bûn?

**Pîrs4:** Tu pêwîst dibînî ku li ser pîrsên elfabe û rastnivîsîna zimanê kurdî semîner, civîn û hwd. bînin amadekirin?

# Bi Zeynelabidîn Zinar re

1. Erê rast e ku îro her zimanekî azad, bûye xwediyê alfabeyekê û gramereke fermî. Lê ji bo zimanê kurdî û rastnivîsandina bi kurdî, îro tevliheviyeke mezin di nava rewşenbîrên Kurd ên Bakûrê Kurdistanê de heye. Ew tevlihevî û belawelatî, ne tenê li bakûrê Kurdistanê, em dikarin bêjin ku li hemû beşên Kurdistanê xwe bi cih kirine û ji bo bi pêşvebirina vêje û çanda kurdî astengine mezin jî derxistine holê.

Îro berdîberdaniyeke mezin di mesela nivîsandina bi kurdî/kurmancî de heye, xasma jî di van salên dawiyê zêdetir bûye. Ev hawe, çewa ku li bakûrê Kurdistanê rûda ye, li her sê beşên din ewqas serobin nebûye.

Li vir cihê gotinê ye da ez bibêjim, çendî ku "Rastî Tehl e" jî, lê ev rastiyeke ku rewşenbîrên Kurd ên bakûrê Kurdistanê, hêj xwe ji pêvajotina siyasî rizgar nekirine. Nimûneyên vê yekê jî diyar in û em tev de dibînin.

Rakirina vê tevliheviyê di îro de, ne karekî hêsan e û niha çu kes jî nikare ji holê hilbide. Lewra ez bi haweyekî dinivîsnim, tu bi haweyekî, ev komele bi haweyekî din û ew rêxistin jî ji me hemûyan cudatir dinivîsîne... De îcar were û vî miriyê hanê ji vê gora hanê derbixîne! Lê mirov hingê dikare rabike, dema ku li nava Kurdên Bakûrê welêt hevgirtineke siyasî çêbibe, yan jî li Bakûrê Kurdistanê deshelatîyeke kurdî bête damezirandin. Ji derveyê van herdu tiştan, ne hêsan e ku ev tişt sererast bibin û têkevîne rasteriyekê.

2. Ez, di van zehmetiyên ku îro di nivîsên bi kumik û bê kumik de digel şaşiyên vêjeyî ku hene, zêde nabetilim. Ji ber ku çavên min êdî rind fêrî naskirina wan şaşiyên bûne, devê min jî fêrî bilêvkirina wan çewtîyan bûye û ez alfabeya tirkî jî nas dikim. Lê ji bo kurdên ku bi tirkî nizanin helbet wê zehmetî be. Xasma ji bo nîfşên nûhatî re jî qadeke bi teşqele radixîne holê.

Îro pir kes hene ku ji ber newekhevîtiyê û bêrêkûpêkîtiya nivîsandina bi kurdî, ji aliyê moralî ve daketine jêrê û ji bo ziman û vêjeyê çu vîn li wan nemaye.

3. Ev yek bê guman e ku Mîr Celadet Bedirxan, yek ji wan kesan bûye ku çend zimanên biyanî dizanibûne û zimanê xwe yê kurdî jî rind zanibûye. Û ew alfabeya latînî ku Mîr bi kar aniye, berî wî bi gelek salan berê hatiye amadekirin, lê neketibûye bi karanînê.

Ez bi xwe du sedem dibînim:

1) Ew dengê (fonetik) ku di qirika Kurdan de ye, di ya Tirkan de nîne.

2) Da ku alfabeya kurdî ji ya tirkî cuda bibe. Ji ber ku zimanê kurdî bi her awayê xwe ji yê tirkî cuda ye.

4. Erê, hem jî pir. Ji ber ku çu tiştê heye, divê ku mir ov têxe nîqaşê û bidilpakî

li serê bipeyive. Lewra di îro de berhema herî pîroz ji bo me di warê zimanî de, tenê Mîr Celadet Elî Bedirxan e. Lê em dibînin ku di xebatên wî de jî kêmasî û lengî çêbûne. Îcar ne hewceye ku em weke sofiyên şêxan bikin.

Bêguman di îro de çiqasî zêde axaftin, semîner û nivîsandin li ser *Pirsên Alfabe û Rastnivîsandina bi Kurdî* bêtine kirin, hewqasî feyde heye. Lê bi şertê ku ne mîna *Qaziyê Şerîetê* bete kirin! Ew çax bingeheke xweş di vî warî de bo nîşên nûhatî tê amadekirin û ji xwe çaxê ku dewleta Kurd ava bibe yan jî eger li bakûrê Kurdistanê desthelatîyeke kurdî bê damezirandin, ji bo wezaretê Kulturî hêsantîyeke mezin jî çêdibe.

## Bi Zinarê Xamo re

1. Ji ber ku te di pirsê xwe de "tevlîheviya" di warê elfabê û gramerê de destnîşan nekiriye, lema jî ez nikanim bi hawakî konkret di vî warî de tişteki bibêjim ya jî pêşniyarekê bînim. Lê eger ji "tevlîheviya elfabê" qesd mesela herfa (i) û (î) ye, ez dikanim bibêjim ku tevlîhevî ya jî "gelşa" elfabeya Kurdî bi qasî ku tê mezinkirin ne mezin e. Lê grûbek biçûk vê gelşê mezin dibîne û lema jî dixwaze mezin bike. Ya rast di şêla xwe de înad dike.

Nuha here were hemû mesele û tiştê ku wek problemeke mezin tê dîtin du herf in; yanî ya emê herfên (i) û (î) yê wek ku di elfabeya Tirkî de ne(ı-i) binivîsîn, ya jî emê wek ku Celadet Bedirxan qebûl kiriye, qebûl bikin û wer binivîsîn. Û ji xwe hemû Kurdên ku bi herfên Latînî dinivîsîn vê elfaba Celadet Beg bi kar tînin. Lema jî gava grûbek ya jî ferdek, argumentên wan çî dibin bila bibin, bi serê xwe di guherandina van herdu herfan de îsrar dikin, ez pîrî şaş dimînim. Li gor bawerîya min divê însan bêtir bi mesûliyet herket bike.

Li alî din elfaba Celadet Beg êdî bûye elfabeyeke netewî. Helbet ez naxwazim bibêjim ku ev elfabe kitêbeke muqedes e û divê em qet destên xwe nedin wê. Na, gava jiyana di warê perwerdekariyê de hewcedarî ya jî zarûriyeteke wiha derxe hemer me, bê şik divê em wê biguherînin. Lê ez îro ji bo guherandina van herdu herfan tu sebab û argumentekî ciddî nabînim.

Lê çî di warê elfabê de be û çî jî di warê îmla û gramerê de be, her babet guherandin muheqeq divê ji alî kesên zana û alim ve bête kirin. Di vir de qesda min ne ferdê zimanzan e, divê heyetek hebe û tenê ew heyet desthilatdar be. Ev heyet dikane kovareke zimên jî salê jimarekê ya jî du jimarên derxe û di wir de biryarên xwe bigihîne gel û masmediya Kurd.

2. Gava ez teksteke ku herfa (î) tê de bê kumik e dixwînim bi tu hawî

zahmetiyekê nakşînim. Lê ji xwe re dibêjim Kurd çi serhişk in. Û gava çewtiyên îmlayê jî dibînim pê diqêherim. Ma wekî din ez dikanim çi bikim ku?

3. Sebebê ku Celadet Beg herfên (i) û (î) wek yên Tirkî negirtine elfaba xwe, ew di Hawarê de dût û dirêj îzah dike. Yanî rê ji çîrokên me re nehiştiye. Ew dibêje (i)yeke bê nuxte yanî wek (ı)ya Tirkî ya îro di nav herfên (u, n, m) û di pêşî û paşîya hin herfên din de bi wan ve dizeliqe, gerandina ji wan herfan gelekî dijwar dibe. Lema jî (i)ya Latînî kiriye (i)ya Kurdî û (î) jî kumik danîye ser. Çimkî ji van herdu vokalan re ev herdu herf yên herî maqûl in.

4. Ez di axaftin û munaqesê de tu zîrarê nabînim. Ger tişteki me yê ku em ji hev re bibêjin hebe, ma çima emê rûnenin û li ser nepeyivin ?

## Bi Ahmet Cantekin re

1. Rewşa zîmanê kurdan, wek rewşa kurdan e. Ango kurdî ji her alî ve neynika kurdan e.

Çareserkirin bêyî yekîtiyeke netewî, birêvebirina dezgeheke giştî û fermendarî nabe.

Rewşa îro pir kenik e. Gelek dezgeh, çi biçûk û çi jî mezin, hene. Biryarên ku li ser zimên jî dertên, biçûk û mezin, herwiha cihê cihê ne. Înstîtûyek biryara bi awayekî gotin û nivîsîna navên rojan û mehan dide. Lê dûre jî meriv û dezgehên di şopa wan de, bi xwe jî li gor biryara wan nakin. Hoya vê çi ye?

Bêyî rêkûpêkî û disîplîn, kurdiyeke standard nayê holê. Di bin sîwana kurdiya standard de, zarava û devok dê hebin. Pirsgirêk bi awayekî zanyarî tîn çareser kirin. Kula zîmanê kurdî jî ji aliyê zimannasan ve tê derman kirin.

Berî Celadet Bedirxan li ser zîmanê kurdî hinek kar hatibûn kirinê. Celadet Bedirxan jî li gor zanebûna xwe, nasîna zîmanê kurdî û dema xwe, karek kir. Karê wî wek mezinkirina piteke bû. Dûre jî pit bi rê çû. Rabû û ket. Lê ew pit nebû zarokekî têgihîştî. Perwerde nebû. Nebû ciwan. Mezin û dewlemend nebû. Pit bê dê û bav ma. Bi serê xwe, bi tenê, li ber diwaran, tî û birçî ma. Pit di bin tirsê de, ta îro hat. Zimannas divê hemû civata kurdan bidin ber çavên xwe û ji wir dest pê bikin. Ne ku her kesê ku kurdî dizane, rabe alfabe û rêzîmaneke kurdî li gor zarave(devok) û daxwaza xwe bîne holê.

2. Di nivîsandin û xwandina kurdî de, pirsgirêka yekemîn û dawîn, ne tenê kumik û ne kumik e. Bi sedan pirsgirêk hene. Hemû pirsgirêk jî diyar û li ber çavan in. Ew kesên ku li ser zimên disekin, van pirsgirêkan nas dikin. Ez dinivîsim û dixwînim. Ez kurdî jî dizanim, lê nas nakim. Çawan ku xweza û

meriv tèn guhartinê, herwiha ziman jî tèn guhartinê. Peyv tèn ji bîr kirinê û peyvên nû tèn çêkirinê. Pirsgirêkên alfebeya kurdî gelek in. Pir kurd bi zimanê xwe nizanin. Yên ku dizanin, çend ji wan dikanin 'rast bipeyîvin û binivîsin'? Kurdiya rast kîjan e? Ew kesên ku nû dixwînin û dinivîsin di 'derdê' kumikan (bilindek) de, dikevin bêçaretiyê.

Pirtûka rêzimana kurdî kê nivîsiye û li kû ye? Pirtûkeke bingehîn a rêzimana kurdî tune! Ji ber vê jî kurdiya her kurdî heye, ne ku kurdiyeke hemû kurdan. Ez jî li gor van serûbinbûyînan dinivîsim. Ez li gor alfebeya C. Bedirxan û di şopa zimannas Reşo Zîlan de diçim. Di nivîsînê de gelek dijarî dertên ber min. Nivîsîn ne gengaz (hêsan) e. Ez dê piştî xwe bidim kû û li gor çî binivîsim? Kî kurdî rind nas dike?

A niha 'kurmanciya jêr' jî derket. Armanc çî ye?! Çima 'xwarin', 'xwendin' lê ne 'xarin' û 'xandin'? Eger meriv li gor herêma Amedê bipeyîve, divê bêje 'ç'eev'; lê 'çav' hîn nermik û gengaztir e. Pirsgirêkên ku dertên pêşiya min bi sedan in. Him wek nivîskar û him jî wek hîndekar. Lê ez nikanim hemûyan li vir yeko yeko bi rêz bikim. Rêzimanêke giştî, rast û rêkûpêk, tune. Gelo di kurdî de 'predîkat' heye? Ku heye navê xwe çî ye? Li ba yekî 'lêker' him 'verb' û him jî 'predîkat' e. Li ba yekî din jî 'lêker' 'verb' e û 'likar' jî 'predîkat' e. Ez belengaz dê berê xwe bidim kîjan darê! Ez jî rabim dareke din daynim ber xwe! Ma ê ku dinivîse ez bi tenê me! Ma divê her kes rabe dareke xwe dayne ber xwe? Ev rewşa Kurdistan û kurdên îro ye. Dema gelek bê xwedî, ser û bin bû, zimanê wan jî wek pelên payîzê renga reng dibe.

Min di Armancê de, salekê berî vê dît ku 'Emê, ewê, hûnê ...' bi hev e nivîsîne. Min telefonî wan kir û pirsî. We çima ev bi hev e nivîsîne? Yek ji wan dibêje; 'ez nizanîm û tu jî ê yekemîn e ku telefon dikî û dipirsî'. 'Her kes' digire û dadiqultîne. Ne xema kesî ye. Pir kesên din jî wek makîneya kopyeyê, kopyeya mêjiyê xwe dikin. Dinivîsin 'gellek'. Du 'll'. Çima du 'll'? Bêjin, eger rast e, ez jî bi kar bînim. Tu ê ji kê bipirsî! Gelekî bê xwedî... zimanekî bê xwedî!!! Dîtin gelek in, lê bila a niha bisekinin. Ez divê ji ew kesên ku di şûna 'meriv' de, 'însan-însên' bi kar tînin bipirsim: Gelo çima? Eger tu peyvên kurdî bi kar neynî, kî dê bi kar bîne?

3. "... Gora destûrên me ên bingehî, ko ji bona çêkirina elfabêya xwe me pêkanî û di pêşiya vê bendê de me da zanîn, diviya bû ko em bê sebebeke zor ji elfabêya tirkanê dîr mekevin. Li hir e, di herfên (i) û (î) de em ji ya wan dîr ketin. Tirk (i) ya kin bi (i) ke bê niqte nîşan kirin. Heke me jî welê bikira û (i) ya kin bi (i) ke bê niqte û ya drêj bi (i) ke adetî nîşan bikira çêtir ne dibû?

No, ji ber ko (i) ke bê niqte di nav herfên (u, n, m) û di peş (pêş-C.Ç) û paşê hin herfan de tevî wan dibe û ji wan derêxistana wê dikeve dişwarîyê. Ji xwe tirk jî piştî çêkirina elfabêya xwe pê hesîyan û ji bona veqetandina (i) ke bêniqte ji herfên jorîn - ko ketiye rex an nava wan - ser herfa ko berî (i) yê dihat

îşaretekê berdidan.

Bê şik e ko me nikari bû em bikevin nerastiyêke welê ko ji aliyê daniyê xwe ve hati bû nîşan kirin.

Jû pêve, herwekî heta niho xuya bû, ji lewre ko dengayiyên van du zmanan cihê ne, isûlê dengdêrên kurdî bivê nevê ji isûlê tirkan dûr ketiye”. (Dr. C. Çelîker, Çend pirsên alfabeya kurdî)

4. Kar bi kirinê diqedin. Karek xwe bi xwe nabe. Ji ber vê jî bi awayekî zanistî, çî bê kirinê rind e. Ji ber ku meriv dikane riya dûr, nêzîk bike. Zimanê kurdî, zimanê ew kesên ku wî zimanî dipeyîvine.

Di televisyon, semîner, civîn, kovar û rojnameyan de, li ser zimên peyîvîn û nivîsîn pêwîst û girîng e. Kar û barê zimên jî mêjiyê zimên dixwaze. Ez hêvî dikim armanca min diyar e.

## Bi Aram Gernas re

1. Heta ji destê min bê ez ê kurt bersîva pirsên te bidim û hewl bidim ku nekevim kûrahîya pirsan û ji sînorê destnîşankirî derbas nebim

Alfabe û gramereke yekgirtî, avakirina zimanekî standard û dewletî bo her neteweyek pêwîst e, şert e. Neteweyên ku gihane vê standardiyê, bi hêsanî negihîştine vê qonaxê. Gengeşiya standardkirina ziman ne tenê pirsgirêkeke Kurdan e, neteweyên din jî ji vê pengavê derbas bûne. Tevlihevîya ku îro di derbarî alfabe û gramerê da heye, ne tiştê ecêbmayî ye. Tiştê ecêbmayî ew e ku, em guh nadin hev, riya aqil û mantiqê bi kar naynin.

Li gor raya min, tevlihevîya heyî ne ji ber dijberîya gramer û alfabeya Celadet Bedirxan e. Rêziman û alfabeya C. Bedirxan ji alî herkesî va (Kurdistana Bakûr) hatiye pejirandin. Pirsgirêka berbiçav a ku zêdetir dikeve rojeva me, standardkirina alfabekek yekgirtî ye. Bêguman qesda min ne ew e ku, di derbarî gramer û rastnivîsandinê da tevlihevî tune. Tevlihevî heye û hêj jî berdewam dike. Lê tevlihevîyên gramerî, sedemên xwe yên cuda hene. Wêk nimûne :

Paşdahîştina gelê me, asîmlasyon û zordarîya sedsalan bûye sedemek girîng ku, piranîya gel hay ji rêziman û alfabeya xwe tune. Kultura xwendin û nivîsandinê gelek qels e. Zimanê Kurdî, di warê nivîsandinê da di qonaxa destpêkê da ye. Bi gotinek din, insanên me di destpêka fêrbûna xwendin û nivîsandina Kurdî da ne. Lewma jî, rastnivîsandin û rêziman baş nehatiye têgihîştin.

Em dev ji gel berdin, bala xwe bidin ser çapemenî û rojnamegerîya Kurdî. Li vê hêlê jî, tevlihevî û bêserûberî hukim dike. Gelek çapxane, weşanxane û nivîskar bi serê xwe, xwe wek otorîte dibînin û guhê xwe ji krîteran ra digrin. Dema ku li hesabê wan bê, rêzimana C.Bedirxan otorîte ye, li hesabê wan neyê ew bi xwe otorîte ne!..

Tevlihevî gelek in. Yek jê jî, hukimê devokan e. Qesda min ji devokan, şeweya axaftinê ye. Gelek kesên ku bi nivîskariyê mijûl dibin, bûne dîlê devokên xwe yên herêmî. Ango, di şûna rastnivîsandinê da, devoka herêmî ya axaftinê bi kar tînin û ji forma rastnivîsandina peyvan bigre heta bi sazkirina hevokan uslûbeke bêserûber radixin pêş çavên me.

Tevlihevîyek jî, ji kompleksa hin nivîskarên me tê. Bi navê edebîyat û hunerê, zimanê zelal ê xelkê hatiye berdan û di şûna vî zimanê delal da zimanek serêşiyê û êşkenceyê hatiye afirandin. Kesên weha wisa dizanin an jî xwe bi wî awayî îqna kirine ku, zimanê wan çiqas zehmet bête têgihîştin, çiqas peyvên ku xelk tênagihîje bi kar bînin, ewqas rûmeta wan bilind dibe. Bêguman dema ku bi zordayinê dertên ser benê hunerê, bedewî û melodîya ziman detone dikin û tu eklekê tê da nahêlin. Bi vî awayî çend xwendekarên ku çêdibin jî bêzar dikin û didin revandin.

Li gor raya min, çareserîya pirsgerêkên gramerî û rastnivîsandinê bi zeman va girêdayî ye, bi têgihîştin û perwerdebûnê va girêdayî ye. Lê avakirina alfabeyek yekgirtî, ji niha va kare bête çareserkirin û ev ne ewqas dijwar e jî, bi wî şertê ku em riya aqil û mantiqê ji xwe ra bikin rêber Biryardar û çareserkirên vê pirsê jî, di encamê da rêxistinên Kurd ên siyasî ne. Hilbet rola nivîskar, ronakbîr, weşanxane, rojnamevanan jî mezin e. Lewma jî, divê meriv rojekî zûtir li ser vê mijarê danûstendinan xurt bike, civînan çêke, dev ji rikên bêmane berde û bêyî ku bêje “darê min gopalê min, rehme li dê û bavê min” pêwîstiya standardkirina alfabeyê bike hedef.

2. Ez wek nivîskar û mamoste, di nivîsandina bi awayê kumik û bêkumik û rêzimana ne wek hev da, zehmetiyên taybetî nabînim. Lê zehmetiyên min an serketina min bi tena serê xwe roleke girîng naleyze. Ya girîng, dijarîyên ku dertên pêşberî gelê me, zarokên me ne.

Munaqeseyên ku derheqa awayê bi kumik û bê kumik da (“i - î” û “ı - i”) tînin kirin, argumentên ku heta niha derketine pêş wêneyeke zelal radixe pêş çavên min. Zelalî jî ev e, awayê bêkumik baştir û pedagogîktir e, hêsantir e. Bi tecrubeya xwe ya mamosteyî ya zimanê zikmakî ya salan, dizanim ku awayê bi kumik bo zarokan dijwar e. Dema ku dibêim, awayê bê kumik baştir e, qesda min ne ew e ku awayê bi kumik ne rast e. Ew jî rast e. Eger di şûna “i - î” da hin şikl û îşaretên din jî bihatana hilbijartin, ew jî rast bûn. Lewra, di navbera rengê dangan û tîpên ku ji bo wan dangan tînin hilbijartin an jî çêkirin, tu pevgerêdanek zanyarî û mecbûrî tune. Eger hebûya, divê hemû



dengên di zimanên dinyayê da hene bihatana tesbit kirin û ji bo wan dengan tîpên taybetî bihatana çêkirin da ku herkes mecbûrê hîlbijartina wan tîpan bûna. Mixabin ku ev ne mumkun e, ji ber ku ev him karekî pir dijwar e him jî her zimanekî dengên xwe yê taybetî hene ku tenê ji alî wî milletî va karin rast bête dengkirin. Niha meriv bêjeyek Kurdî ku tîpa “î” tê da heye binivîse û bide ber Tirkekî yan Swêdîyekî, wê li gor dengê “î” yê zimanê xwe bixwînin. Eynî bêje bidin ber Kurdekî, yekser wê rast bixwîne.

Alfabe û gramer ne tabû ne. Eger pêwîstî bi lêzêdekirin, guhartin û tekûzkirinê hebe divê bête kirin. Dema ku ev pêwîstî bête bi cîh anîn, nayê wê manê ku C.Bedirxan hukmê xwe winda dike, ji otorîtebûnê dikeve. Tam berevajîyê wê, otorîta heyî xurttir dibe û ruhê wî zanyarê mezin zêtir şa dibe. Li gor raya min, niha pêwîstî bi lêzêdekirin, guhartin an jî tekûzkirina gramerê tune û gengeşiyê weha jî nîne. Li pêşberî me tenê standardkirina alfabayê heye.

3. Bilindeka ku Celadet Bedirxan daniye ser tîpa “î” (derbarî bilindekê da, agahdarî di Hawarê, hejmara 10 an da heye), bi hinceta çî dibe bila bibe, bêyî ku rastî û nerastîya wê bête munaqêşekirin, pêwîstî bi hêsankirina tîpa “î” wek “i” û avêtina nuqîta ser “i” wek (ı) heye. Pêwîstî bi naskirina realîteya Kurdistana Bakûr û serborîya wê heye. Hêsankirina alfabayê, prensîbeke ilmî ye û ez di wê bawerîyê da me ku, C.Bedirxan jî ji bo vê yekê hewldanek mezin daye. Lê bikaranîna bilindek û nuqîta ser “î” û “i”, wek zordayinek tê xuya û li destûr û prensîbên ku C.Bedirxan wê demê dabû ber xwe jî nayê.

Hêsankirina van herdu tîpan, qefaltina standardiyê navnetewî û realîteya gelê me yê Kurdistana Bakûr derheqa C.Bedirxan û xebata wî ya mezin da tu şik nake dilê meriv. Ji bo min C. Bedirxan otorîte ye û wê hertim wek otorîte bimîne.

4. Hilbet di derbarê alfabe û rêzimana me da panel û semîner bête lidarxistin, karekî maqûl e, xizmeteke baş pêşkêş dike.

## Bi Îbrahîm Guclu re

1. Ji ber ku ez ne zimanzana me, gerek bersivên min wek ê pîsporekî neyê hesabandin. Lêbelê ji bona ku em xwendin û nivîsandina kurdî li dibistanê fêr nebûne, encama xwe bi xwe pir xwendin, lêgerîn û lêkolînê fêr bûne. Di derheqa elfabe, rêziman û sîstema zimanê kurdî de helbet ez/em xwediyê gelek zanyariyê ne. Dema ku wisa dibe, her çiqas mirov wek zimanzanekî nebe jî, di derheqa zimanê kurdî de dikare gelek nerînan bîne zimên.

Ez dixwazim pêşî bi çend gotinên C. Bedirxan ku di Hawarê hejmara yekê rûpelê heftan de dibêje, giringiya zimên raber bidim û dûra jî derbasî bersivên te bibim. C. Bedirxan dibêje; "Herwekî nas e, fikir û his di dora zimanî de digehînin hev, û her ziman fikir û hisên xwe û awayê gotina xwe bi xwe re hildigire û ew pê re diguhêzin, û pey zimanên xwe dikevin. Bi vî awayî digel zimanê fikir û hisên biyaniyan jî tên dikevin nav me, di dil û hişê me de cih digirin, û rû û gonê me ên manewî diguherînin, diheşîfînin."

Wek ku C. Alî Bedirxan jî di Hewarê hejmara 3an de dibêje; "Yekbûna kurdan jî bi yekbûna zimanê kurdî çêdibe. Yekitiya zimanî jî bi yekitiya herfan dest pê dike." Heşkere ye ku yekitiya herfan gelekî girîng û bingeh tê qebûl kirn, ku ez jî vê nerînê dipejirînim.

Zimanzan e jî qebûl dikin ku ziman li ser sê hîman (elemantan)pêktê. 1.Elfabe, 2 gramer, 3 ferheng. Pirsra te ya yekemîn jî vê nerînê rast nîşan dide û yekitiya elfabeyê û rêzimên grîng û bingeh dibîne. Wek te jî diyar kiriye ku hezar mixabin îro diwarê elfabe û gramera kurdî de tevliheviyek heye. Sedema vê yekê jî, nebûna yekitiya elfabe û rêzimana kurdî ye.

Ez bi xwe di wê baweriyê de me ku di vê pirsê de tevliheviyek pir mezin nîne. Bes rewşenbîrên subjektîf, nezerteng û rêxistinên ku ji berjewendiya millet zêdetir berjewendiya xwe ya grûbî diparêzin hem vê tevliheviyê mezin nîşan didin û hem jî dibin sedemê tevliheviyê.

Gelek baş tê zanîn û dîrokê jî îspat kiriye ku miletek xwedî dewlet, federal û konfederal nebe, nikare bibe xwediyê dezgahên ku bi her awayî tekûz û qanûnên bingehîn. Ev rastiya ha ji bo zimên jî derbas dibe. Lewra ji bona ku kurd jî nebûne dewlet, xwediyê yekitiyeke hevbeş û demokratîk, yekitiya zimên jî belav bûye.

Ji bo miletekî elfabe û rêziman, wek qanûna esasî ya dewletê ye. Eger kurd dewlet bûna, îro elfabeya me jî wê yek bûba. Bêguman tevliheviyên ku hene em ê nikaribin di wextekî kurt de safî bikin, belê gava mirov bixwaze dikare hinekî kêmkirina tevliheviyê pêwîst e ku kurd mişterek bifikirin û li hev bikin. Ji vê sîstema ku Bedirxaniyan daniye heta ku kurd digel hevudin nebin tifaq, gerek kes jê dernekeve. Li gor sîstemê heraketkirin mecbûriyetek e.

2. Ez pirsra te ya duduyan ji aliyekî de kêmkirina û ji aliyekî de jî şaş dibînim. Lewra ev pirsra ha girêdayî elfabe û rêzimana kurdî ye. C. Bedirxan di elfabeya xwe de metodên îlmî xebitandine. Alim bû. Ji zimanzanên ewrupiyan îstifade kiriye. Herwiha bi gelek zimanan jî dizanî bû. Wî (i,î)ya kurdî bi zanatî di elfabeyê de bi cih kiriye. Ez di xwendin û nivîsandina van her du tîpan de zehmetiyê nabînim. Belê gava ku ev her du tîp bi awayekî din ango bi awayê ku tirk dinivîsînin di teksta kurdî de dixwînim, zehmetiyê dibînim.

3. Heger C. Bedirxan sax bûya, dê wî xweşik û bi awayekî îlmî tu bibersivanda. Ji bona vê yekê ez naxwazim xwe têxim ciyê C. Bedirxan. Lêbelê dema ku ez bi zanyarî û întelektuelî metodên xebata C. Bedirxan şirove dikim, gelek vekirî dibînim ku ew li ser elfabeya kurdî pir kûr û dûr fikiriye; gelek hesab kirine û bi fikrên dewlemend û îlmî pêk aniye.

Gelo kes dikare bibêje ku tîpên (ä, å) di latîniya eslî de tune ye, bila ji elfabeya swêdî bê derxistin?

4. Em kurd, di her pirsê de hîn di destpêkê de ne. Ji bona vê yekê, em hewcedarên minaqeşeyên kûr, fireh û metodîk in. Ev rastiya ha ji bo pirsên elfabe û rastnivîsîna zimanê kurdî jî derbas dibe.

Heger ji bo van pirsan semîner û civîn pêk bên baş dibe. Lêbelê divê ku em barê xwe giran nekin. Ez pêşniyar dikim: Heger semîner û civîn li Swêdê dest pê bikin, wê baştir bibe.

## Bi Suleyman Demîr re

1. Rast e alfabe yeke me ya yekgirtî tune ye. Ev yek birîneke me ya neteweyî ya mezin e. Sedemên vê yekê, êşkere ne: em bindest in, em hîna nebûne neteweyeke xurt a hemdem û li ser hev, dezgehek ku me wek netewe li ser hev bicivîne û xwendinê û jîna me ya rojane bi zimanê me organîze bike, tune ye. Em bi xwe jî vê reşa kambax ji xwe re hîna sexttir dikin.

Û her wilo, rast e ku di derheqa alfaba me ya latînî û di gramera me de hin tevlihevî hene. Ne pîrr ecêb e ku di derheqa gramêrê de hebin. Ji ber ku gramareke me ya modern a tekûz tune ye. Em hîna hemû hêlên zimanê xwe nas nakin. Ez ê dîsa li vê pirsê vegerim. Lê berî vê, divê ez bibêjim ku ez bawer im di rastiye de, tu tevlihevî di derheqa alfabe me ya latînî bi xwe de tunene. Eşker e ye. Tevlihevî di me bi xwe de heye.

Mîr Celadet Bedirxan û grûpeke rewşenbîrên kurdan li gor lêkolîn, biryar û destûran alfabe yek çêkirine û diyarî me kirine. Em wê kirinê, wek karê otorîte yeke neteweyî qebûl dikin. Berhem çî qasî bes e, ya jî kême e, ez bi awayekî zanistî nizanîm. Bêguman ew yek karê zimanzanane û piştî lêkolînên mezin dikare derkeve. Ez li vir bahsa hêza wê ya neteweyî dikim.

Zimanzanên me karinê yekê munaqaşe bikin û divê em jî bi kêfxweşî li wan guhdarî bikin. Munaqaşe baş in. Lê a ku sergêjekê ji me re derdixe, kirinin, guhertina alfabe ye. Bi baweriya min divê em li hevdu bikin ku guhertina tiştên wilo bingehîn, karên dezgeh û desthilatên neteweyî ne. Bi

biryar û lihevdukirinên neteweyî dibin. Nikarin karên kesekî, çend kesan, partiyekê û hêzekê bin. Heger ne wilo be, em ê qet nikaribin ji hev fam bikin û ji bin derbikevin. Wê di salekê du salan de deh pazdeh û belkî pirtir alfabeyên me hebin.

Ez munaqaşeyên di vî warî de dixwînim. Balkêş in. Dibe ku hin jê herî rast û hêsan jî bin, lê bi baweriya min dîsa jî destûra ku mirov alfabeya miletekî bi serê xwe tenê biguhere, nadin mirov. Dîtina "rastiyê" nabe destûra kirinê. Divê wek pêşniyarên giranbuha bimînin ji pêşerojê re. Bila bibin materyal û bimînin ji akademyên me yên pêşeroja geş re. Bêguman ew ê helleke baş ji problemên di vî warî de re bibînin.

Heçî gramer e, ew karekî zanistî ye. Ew bi biryar û lihevdukirinan nabe. Ew karekî ku piştî xwendin û têgihîştinê tê bi destxistin e. Gava mirov ji hêla dîrokî ve lê dinere, di ansîklopêdiyên ewrûpiyan de kêm zêde bi kurtî wilo ye:

Peyva gramer (grammar), bi esil peyveke Yûnanî ye. Tê maneya hunerê nivîsandinê û gramer ji bo wilo hatiye danîn. Yûnaniyan, wî çaxî bi gramerê, awayê rastnivîsînê rêz dikirin, formên bikaranîna zimên datanîn. Zimanzanên Yûnanî û Romyî, bi dû re gramera li ser vî bingehtî baştir ava kirin û kirin zanistiya ji hevduerxistina zimên.

Gramera zimanên ewrûpayî li ser bingehtê wê gramerê hat avakirin. Deskriptîv bû. Bi karê eşkerekirina bê ziman di rastiyê de çawa tê bikaranîn mijûl dibû. Bi wî awayî li prensîbên zimên dikola û ji hevdu derdixistin. Heta berî çil pêncî salan jî gramera zimanên ewrûpayî, ew gramer bi xwe bû. Lê salên pêncî, gramera generatîv, a ravekirina zimên a kûrtir hat pêşkêş kirin. Tê hat gihîştin ku divê hemû hêlên zimên ji hevdu bîr derxistin û ravekirin. Ziman bi wî awayî hîn baştir tê naskirin û ji hevduerxistin. Îro zimanzanên zimanên Hîndo-ewrûpayî li ewrûpa û emerîkayê, bi gramera generatîv a transformatîv dadikevin kûraya zimanên xwe. Tu tevliheviya wan a bi rastî, di wî warî de dernakeve. Ji ber ku alim wî karî dikin û ên ku ne alim in jî li ên alim guhdarî dikin.

Bi baweriya min, zimanzanên me karin gellek rehetiyên ji wir ji me re peyde bikin û zimanê me baştir bi me bidin naskirin. Qet nebe niha karin serê xwe bi organîzekirina gramereke kurdî a deskriptîv biêşînin. Divê yeke me ya ku em bikaribin pê xwe fêr bikin û li gor wê bizanibin bê zimanê me di rastiyê de çawa tê bikaranîn û divê çawa bê nivîsandin hebe. Karê bingehtî ê di vî warî de, ev e. Karê demeke dirêj û giran e û lê mixabin zaniyariya me ya neteweyî ya di vê derheqê de pîr hindik e. Ji ber vê yekê jî, zimanzanên me karin niha hinekî jê bikin û rê baştir vekin. Wê gellek tevlihevî bi kirina vê yekê bîr çareserkin.

2: Bêguman tîpên alfabeyekê çî qasî ji kumik û niqutan pak bin, ewqasî hêsantir dibe. Ew hêsanî, pirtirîn gava mirov bi destan dinivîsîne. Lê wek ku

min di bersiva pirsava yekem de jî got, ji bo ku em wilo difikirin, em nikarin ecelê li alfaba xwe bikin û destûra ku wê biguherin bidin xwe. Di xwendin û nivîsandina bi computer û mekîneyên din de tu zehmetiyên mezin dernakevin pêşiya mir ov. Ên ku derdikevin jî, ên teknîkî ne û ji bo teknîkeran in.

Rewş û xwendin ji bo min wilo ye. Piştî ku ez dibînim bê bi çi awayî hatiye nivîsîn, ez herdu awayan jî bi qasî hev hêsan dixwînim. Belê dîsa jî bi rastî ne tiştê baş e.

Di warê vekîte de problemên me hene. Carnan mezin in û dibin sedemên şaşfamkirinê. Bêguman ew jî ji ber ku gramereke me ya tekûz tune ye, hîna ew antremana hewce bi zimanê me nebûye û hîna nebûye zimanekî edebî yê yekgirtî. Ez bi xwe di şiklê nivîsandina gellek tiştan de dikevim tengayan. Lê wî çaxî gava ez dixwazim li bersivê bigerim, ez bersivên ku bikaribim şikê tevî pê ji dilê xwe biavêjim, peyde nakim. Ez wî çaxî li gor baweriya xwe ya ne zanistî dikim. Dibe ku ez a şaş hildibijêrim, lê rêyeke din jî tune ye.

3. Dengê (Î) di kurdî de heye. Navek jê re hewce bû û hewce ye. Gava Mîr Celadet û hevalên xwe alfaba latînî danîn, ji dengê (Î) re li navekî geriyan. Li gor ku Mîr dinivîse, tu tîpên din ji a ku îro di alfaba me de heye pê ve, li ber destên wan nema bûn. Wî çaxî radibin wê tîpê li gor destûr û biryarên xwe û prensîbên tîpên latînî hildibijêrin. Xuya dibe ku ne bi hêsanî gihane wê encamê, lê mecbûr bûn ku navekî li wî dengê kurdî bikin û bi wî awayî lê kirine. Divê em jî qebûl bikin. Divê neyê ji bîrakirin ku Mîr Celadet xwe di warê zimên û gramatikê de, zêdeyî ku em îro dikarin texmîn bikin amade kiribû. Prensîbên alfabeya latînî a bingeîn jî hene. Her millet hin guhertinan tê de dike û li gor zimanê xwe ji nû ve ava dike. Lê guhertin heta derekê gengaz in û destûrî ne. Ji wir û pê ve, karin alfabê ji latînîbûnê derxin. Mîr Celadet ev tişt hemû zanîbûn. Bi gellek zimanan zanîbû. Mîr Celadet ne rewşên berekî îdealîst tenê bû. Ew alimek bû. Dibe ku hin tiştên ku ji me re hiştibin ne bêqusûr bin. Dibe ku ji ber wilo bîr rexnekirin. Xem nake. Lê îro hîna jî tu kurdan xwe bi wê firehî û kûrbûna ku wî ziman girtibû ber xwe û xwe te de perwerde kiribû, nekirine. Ji ber wilo jî, Mîr Celadet him mîrê me yê civatî û siyasî ye û him jî ê mê yê alfabê û zimên e. Divê em heta demekê xwe li karê ku di pêşengiya wî de bûye, ragirin. Heger reform hewce bin jî, em nikarin destûra kirina wan bidin kesan û partiyan.

4. Bêguman semîner û civîn baş in. Wê ji gellek tiştan re çaran bibînin. Dibe ku di cîhê cîh de mirov li hevdu neke, lê dîsa jî wê bersiva gellek tiştan ji bo gellekan bê dan. Sipas.

# Bi Emîn Narozi re

1. Belê, pirr heyf e lê diyar e ku ew bela bêguman yanî tevliheviya ku ji ber perçebûna welatê me di warê siyasî û neteweyî de çêbûye xwe di warê alfabe û rêzimanî de jî nîşan daye. Ji bilî tevliheviya rêziman û alfabe yên cihê cihê û xeyn ji dîtînen cuda li ser çareserkirina gelşa neteweyî di perçeyan de ku bê şik ew jî ji ber desthilatdariya dagîrkeran tê, di nav her perçeyî bi xwe de jî gelek tevlihevî û cudahiyên bêfeyde û bi ziyar derketine holê. Bêguman wê ne bêberpirsiyarî û nebûkarî (iftîra) be ku mirov tevlihevî û newekheviyên alfabe ya Latîni, yê rastnivîsîn û rêzimanîyê tev jî encama vê cudahî û perçebûnê bibîne.

Vêca ji holê rakirina vê tevliheviyê jî li gor dîtina min, dê di hundurê demê de bi alîkariya kamilbûn û yekîtiya me ya siyasî ku ew jî wê hê bêtir têgihîştin û pijandina me ya neteweyî bi xwe re bîne, çêbibe. Ev yek dikare piştî rizgariyê be lê herweha dibe û ya qenc jî ew e ku berî wê jî bigihîje encamêkê.

Ji xwe ev tevlihevî ne taybetmendiya zimanê Kurdî bi tenê ye lê belkî ev yek di gelek zimanên cihanê yê din de jî çêbûne û bi deh salan hetta bi sed salan jî domandine; nimûneyek di vî warî de zimanê Erebi ye ku di awayê nivîsandin û gramerê de di destpêkê de gelek rêçikên cuda jê derketine û piştî salên 18 00'î dema belabûna nivîserên wan li Ewrûpayê hingê jî gelek cudahiyên ji ên me ecêbtir jî di nav wan de çêbûne.

Bes çî di destpêkê de be û çî jî di vê dawiyê de be tişteki wan yê baş ew bûye ku ji bo pêşveçûna zimanê xwe di her warî de zorê dane wergerandina ji zimanên biyanî. Hêj ji dema împatoriya Emewîyan ve ku sedsala pêşî ya fermanrewa-yiya Ereban û Îslamê ye, dest bi karê wergerandinê kirine. Xelîfe û ferman-darên Emewîyan bi zanîn, zana û wergêrên dema xwe çî musulman û çî na (weke yê Asûrî, Suryanî, Cuhû û yê din) han dane hetta zorê dane wan ku çî berhemên bi wan zimanan tevî yê Yûnanî, Farisî û hinekî din jî hebin wergerînin zimanê Erebi. Piştî salên 18 00'î jî digel wan cihêti û gengeşeyên ku di nav wan de derketine dîsa vê carê rewşenbîrên wan bi xwe karê wergeriyê domandine.

Herweha gava mirov bala xwe dide deh salên pêşî yê bikarnîna alfabe ya Latîni di nav Tirkî de jî mirov dibîne ku mezinên wan yê hingê zor dane zimanzan û wergêrên xwe ku berhemên klasîk yê cihanê hemîyan wergerînin Tirkî. Hetta berî hingê jî xwe hêj ji dema Jonturkan ve dest pê kiribûn. Lê pir heyf e ku mirov vê zordan û hewldana wergerandinê ku di pêşketina zimanekî de qonaxek ji yê girîngtrîn e, di nav rewşenbîrên Kurdan de çendî ku hinek xebat hebin jî, lê wusa xurt nabîne.

2. Ne wek "nivîskar" lê wek kesekî ku carna kaxizan reşbelek dike û wek namenivîsekî dikarim bêjim ku - ne di awayê kumik û bêkumikî de - lê bi taybetî di warê rastnivîsînê de pirr zorî dikşînim. Heçî gelşa bi kumik û bêkumikiyê li cem min gengeşeyeke xwedest e, ma dêma ku ji heraliyî ve û bi awayekî berfireh lêkolîneke akademîkî û zanistî çênebûbe ku xuyaye ta niha nebûye û li ser vê yekê biryareke yekgirtî tinebe li gor min ya baştir û çêtir ew e ku mirov weke danerê pêşî binivîsîne. Ev yek ez nabêjim bi awayê zanistî lewra tu lêkolîneke min di vî warî de nîne, lê bi ya min hem ji bo kêmkirina cihêtiya navxweyî û ji bo hevnezişkên û hem jî ji bo birrîna devê neyar ewletir e, çiku pêşiyên Kurdan gotine: "Mirov li hember neyarê xwe kêlek xwê jî dixwe". Ji xwe pir baş e ku mirov di vê navê de li ser vê yekê gotubêjan bike, bi hev re lê bikole û gava pêkve gihîşte encameke zanistî û li serê li hev kir hingê bêguman guhertina ber bi başî û ber bi pêşveçûnê ve hew dilxweşiyê dide mirov.

Încar piştî vê yekê ji xwe pêwîst nake ku ez bibêjim: "Ez bê dudilî bi kumik dinivîsim", lê ger ku pirs bê ser gelşa rastnivîsînê ew bi serê xwe tevlihevî û xirecîrê bi xwe re tine û di nivê xetê de mirov ziq disekinîne. Ji xwe ji bilî vê bêstandariya ku heye vêca gelek ji me yan bê hemdî yan jî bi zanîn û hinek jî ji miqerisiyê li gor devoka herêma xwe hetta ya gundên xwe dinivîsînin, wê devokê rasttir dibînin û jê nayên xwarê jî, lê hinek kesên ku di vî warî de serwext têne qebûlkrin jî çendî ku li serê dixebitin û xwe pê re dêşînin jî lê wusa diyar e ku têr nake.

Lêbelê bi ya min ev yek jî ne ji kêmasiya wan e belkî ziman bi xwe di wê qonaxê de ye ku baş rûnenîştîye û bi xwe re hergav tişteki nû tine, dibe sedemê tevliheviyan.

3. Li gor ku ew bi xwe dibêje ji bo jihevveqetandina denga pêwîstî bi hin nîşanan hebûye çiku du dengên Kurdî ku "Î" û "û" ne bi herfên alfabeya latînî ya heyî nedihatî pê. Li gor C. Bedir-Xan ew dengê bilind û dirêj ji dengên herfên "i" û "u" ya Latînî nehatine der ku lewra ew rabûye wî ev nîşana "i" han bi navê bilindek daniye ser wan. Herweha bi vê ew ji bikaranîna nîşanên zahf xwe ragirtiye û ev nîşana wî jî ji gelek nîşanên din ku di nivîsê de pirr tèn bikaranîn cuda ye.\*

4. Belê, bêguman gelek pêwîstî pê heye û bê civîn, semîner û gotubêjan alfabeyeke sererast û hevbeş û rastnivîsîneke yekgirtî û standard nayê holê. Lê belê hêviya min jê ew e ku gotubêjên me nebin mîna devçeng û miqerisiya Bîzansiyan ya li ser hêk û mirîşkê yanî ka gelo hêk ji mirîşkê ye yan jî mirîşk ji hêkê ye; yan jî mîna xirecir û dehkereya rêzimannasên Ereban li ser rader (mesder) û lêkerê, yanî ka kîja ji wan eslê ya din e ku hêjî negihîştine encamekê.

Bi hêviya xweşî û şadiyê û daxwaza bexşandinê ji xwendevanan dikim ku

ji bo kêmasiyan li min megirin û ji bo kovara Çirayê û gelek spas.

(\*) Mîr Celadet Alî Bedir-Xan, Hawar Kovara Kurdî, Çapxana Tereqî, Şam, 1932, hejmar 2, rûpel 6, Ji nû ve nivîsandin û çapkirin Mihemed Bekir, Weşanxana Hawar, Stockholm 1987, cild 1, rûpel 18

## Bi Alî Çiftçî re

1. Ew pirs ji bo gelê Kurd pirseke pir girîng û mezin e. Ne tenê ji bo Kurdên bakur, ji bo başûr jî ev tevliheviya heye. Ji ber ku ez bi soranî nizanîm ez li wir nikarim bi detayî bînim zimên, tenê dixwazim bibêjim ku ew mesela rêzimanî, li zaravaya soranî de jî heye. Ez wî tiştî dibêjim ji ber ku her roj di karê min yê weşanxanê de ez lê rast tîm. Ew tevliheviya ku di warê rênivîsandina di zimanê kurdî de heye, îro li bakurê Kurdistanê hîn ber bi çav e, ji ber ku nivîsandina bi kurdî li wî beşê Kur distanê hîn nû ye. Ya herî xirab jî ev e ku li derveyî welêt dest avêtine nivîsandina bi kurdî. Li bakurê Kurdistanê wek tê zanîn di salên 1930î de, ji aliyê Mîr Celadet Bedirxan û hevalbendên wî dest bi nivîsandina bi kurdiya latîni kirine. Rewşenbîrên wê demê jî, ew kara dîsa li derveyî welêt meşandine, yanî ne di nav gel de bûne, li gor zanînen xwe yên li ser zimanên ewrûpî, ji bo nivîsandina kurdî bi latîni hin quralên rêzimanî danîne û hîn jî piraniya kurdên bakur û başûrê piçûk li gor rêzimana Mîr Celadet Bedirxan dinivîsîn. Bi ya min, ji ber ku nivîsandina bi kurdiya latîni her dem li derveyî welêt, yanî li mahciriye ev kar hatiye kirin qels (zayif) maye, pêş neketiye. Faktora herî mezin ku îro dibe sedema vê tevliheviyê, rewşa kurdan a siyasî ye. Yek, ji ber ku otorita siyasî tune, dudu, zimanê me ji ber ku li bakurê Kurdistanê qedexe ye, xwendin û nivîsandin tune. Ev her du tişt jî bo zimanekî yekgirtî pir girîng in. Diyaloga gel bi rewşenbîr û ya rewşenbîran bi gel re tune. Diyaloga dezgeh û weşanên ku bi kurdî diweşînin, bi hev re tune ne. Weşanên ku îro bi kurdiya latîni tên derxistin, xwandevanên aktiv dixwînin 300-500 kes in, bi hejmareke ewqes piçûk yekgirtiya rêzimanê kurdî, bi taybeti jî li derveyî welêt pir zor e. Bi ya min, ev weşanxane û dezgehên ku bi karê zimên ve mijûl in, ji bo ku ev tevliheviyên ku îro di warê rastnivîsandina kurdî ya latîni de hene, kêmbin, dikarin bi rêya hevkarîyê hin tiştan bikin.

Wek pêşniyaz:

1. Divê xwediye hemû weşanan (weşanxane, kovar, rojname, enstîtu, televizyon, ku hebin dibistan) bi hev re civinekê çêbikin. Di vê civînê de berî her tiştî ev tevliheviyên ku hene, çî ne, divê bê testbîr kirin. Ez bi xwe civineke



visa vek berpirsiyarî dibînim, divê di demeke nêzîk de bê kirin.

2. Piştî ku ew tevliheviyên hatine tespît kirin, civînên akademîkî ku tê de zimanas û mamostên zimanê kurdî, beşdar bin û li ser ilmê lîngvîstîkî ev tevliheviyên ku hene bîn serastkirin.

3. Divê beşdarên van civînanan kesên zimanas bin.

4. Divê, piştî van civînan xwadiyê weşanan li gor tesbit û biryara encama van civînan biryar bigrin û li gor biryara yekgirtî weşanên xwe biweşînin!

2. Di mesela bi kumik û bê kumik de meqseda te mesela (î)ya bi kumik û ya bê kumik e. Dema ez nivîsekê dinivîsim, bi taybetî dema ku bi destnivîsînê be, bixwazim an ne, ez (î) wek (i)ya bi tirkî û (i) jî wek (ı)ya bi tirkî dinivîsînim. Ew mesela ku me hemûyan li Tirkîyê bi zimanê Tirkî dest bi xwendin û nivisandinê kiriye, ez bawer dikim piraniya kurdên bakur visa hîn bûne, helbet bo wan wisa nivisandin hêsantir e.

Ji bo min, mesela bi kumik yan bê kumik ne meseleyeke pir giring e, meseleyeke ku ne pir mezin e, ji ber ku tu bi kîjan awayî binivîsîne tu deng nayê guhertin. Bi ya min kurdên bakur vê meselê piçekî mezin dikin, meseleyeke ku meriv nikare li holê rake nîne. Tenê divê daxwazî hebe, dikare bê berteref kirin. Divê em neslê nû bifikirin. Dema ev tevliheviya ha visa berdewam bike hinbûna zimanê kurdî li dibistanan, dê her here zahmetirîn bibe. Em hin jî nikarin li Swêd, li Almanyayê yan jî li welêt vê tevliheviyê berdewam bikin. Divê heta ji destê me bê, em mesela xwendin û nivisandinê ji bo neslê nû hesantir bikin, ne ku serê wan gêj bikin!

Mesela cuda nivisandina vekîta ji her wisa ye. Bi rastî meriv zahmetî dikşîne. Ew tiştana mirov ji xwendina kurdî sar dikin û dûr dixînin.

13 - 14 DECEMBER 1997

# PÊŞANGEHA KITÊBÊN KURDÎ

(UTSTÄLLNING AV KURDISKA BÖCKER)

Di pêşangeha îsal de semîner, xwendina helbest,  
perçenivîs, çîrok û munaqêşeyên cihê hene.  
Herweha kitêb û kovar wê bi erzanî werin firotin.  
Gelek nivîskar wê bi xwe berhemên xwe îmze bikin.  
Bi xêr û xweşî werin.

Dem/Datum

13-14 / 12/ 1997

Şemî/Lördag: 10.00 - 18.00

Yekşem/Söndag: 10.00 - 18.00

Cih/Plats

Alvik-Medborgarhuset

T- Alvik

Amadekar/Arrangörer:

Weşanxaneyên Kur dî Li Swêdê

Pêşniyar, dîtî, proje an daxwazek we di vê bareyê de hebe, hûn dikarin  
bi van telefon û faksên jêrîn bi komîteya amadekar re têkilî deynin:

Tel: 08-26 23 75 • 08-761 81 18 • Fax: 08-25 38 57

**Ji Weşanxaneyeya Apecê 4 kitêbên nû yên zarokan!**

**BI DIMILÎ Û KURMANCÎ**



**Ji zarokên xwe re bi kurdî bixwînin û bidin xwandin!**



Navnîşana xwestinê li Swêdê:  
Apec-Tryck & Förlag  
Box 3318  
S-163 03 Spånga/Sweden  
Tel: +46 8 761 81 18  
Faks: +46 8 761 24 90  
E-post: [apec@swipnet.se](mailto:apec@swipnet.se)

Li Almanyayê:  
Dilan KITAP-MUZIK  
Brigitten str. 3  
20359 - Hamburg/Deutschland  
Tel: +49 40 432 906 70  
Faks: +49 40 432 906 71